

# REWSÛEN-NAME

Kovara wêjeyî, çandî û hunerî

Adar 2003

2.500.000 TL

1

Çima Rewşen-name?

Bi **Berken Bereh** Re Hevpeyvîn

Haveynê Ronesan û Geşedanê "Raguhestin" e ♦♦ **W. Mazlum Doğan**

Komkujî (Genocide) ♦♦ **Jean Paul Sartre**

Ji 'Cathay'a Ezra Pound Çend Nimûne ♦♦ **Kawa Nemir**

Piyano ♦♦ **Osman Mehmed**

Şeytanê Pîr ♦♦ **Pearl S. Buck**

Xençer ♦♦ **Yaşar Kemal**

Di Felsefeya Xanî De Evîn, Rindî û Rindiya Tesewifî ♦♦ **M. Zahir Kayan**

Çar Helbest Ji Aleksandr Sergeyeviç Puşkin ♦♦ **Xan Bawerî**

Edgar Allan Poe ♦♦ **Samî Hêzil**

Hemama Nûjen ♦♦ **Mistefa Reşîd**

Ceribandineke Ji Êgir ♦♦ **Mûsa Vazgalî**

Çîroka Ciwan ♦♦ **Dilawer Zeraq**

Dildar (1918 - 1948) ♦♦ **Feqî Huseyn**



**Kovara Wêjeyî, Çandî û Hunerî**

**Kovara Mehane (Aylık Dergi)**

**Li Ser Navê Mûzîk Film Turizm Eđitim Reklam Film  
Organizasyon Basın Yayın Kùltür ve Sanat Eserleri  
Sanayi ve Ticaret Limited Şirketi Xwedî:  
Hacı Tel**

**Berpirsiyarê Nivîsaran: Mehmet Mehmetođlu**

**Edîtor: Kawa Nemir**

**Desteya Weşanê: Şefik Beyaz, Davûd Özalp, Kawa Nemir,  
Mehdi Tanrikûlû, Mehmet Dicle, Şevîn Gulşeni**

**Rûpelsazî: Berfîn**

**Çapxane: Berdan Matbaacılık**

**Sala Weşanê: Adar 2003**

**Navnîşan: İlkbelediye Cad. No: 37/7 K. 2 D. 7-8  
Beyođlu/İstanbul**

**Tel: 0(212) 292 62 96 E-Mail: rewsenname@hotmail.com**

**Şertên Abonetiye:**

**Nava Welêt:**

**6 Meh: 15.000.000.TL**

**Salek: 27.500.000.TL**

**Welatên Dereke:**

**6 Meh: 50 €**

**Salek: 100 €**

**Banqe:**

**Figen Zenderliođlu**

**Nâmroya Hesab: 1011 1463782**

**İş Bankası Beyođlu Şubesi**

**İSTANBUL**

- haveynê ronesans û geşedanê raguhestin e ↔ w. mazlum dođan.....6,7,8,9  
çiroka ciwan ↔ dilawer zeraq.....10,11,12  
sê helbest ji ↔ arjen arî.....13  
di felsefeya xanî de evîn, rindî û rindiya tesewiff ↔ m. zahir kayan.....14,15,16,17,18,19,20  
sê hêvî û du têkçûn ↔ şevîn gulşeni.....21  
dildar (1918 - 1948) ↔ feqî huseyn.....22,23,24,25  
beybûnên bêjî ↔ rodî zerya.....26,27  
komkujî (genocide) ↔ jean paul sartre.....28,29,30,31,32,33  
keça keyser ↔ lal laleş.....34,35  
lêkolînek li ser lawikan ↔ beşîr botanî.....36,37,38,39  
dîlgirtî ↔ mehmet esen.....39  
mij ↔ jorîn mamûk.....40  
xwetelandin ↔ kawa nemir.....41  
bi beğken bereh re hevpeyvîn ↔ kawa nemir.....42,43,44,45,46  
du helbest ji ↔ şêxmûs sefer.....46  
ji ser kela mêrdîne ↔ çiya mazî.....47  
xençer ↔ yaşar kemal.....48,49  
biyanîbûna min ↔ dinoyê gurî.....50  
şeytanê pîr ↔ pearl s(ydenstricker) buck.....51,52,53,54,55,56  
piyano ↔ osman mehmed.....57,58,59  
kewa min ↔ cindî.....60  
kejê ↔ gûlay ersoy.....61,62,63  
mast ↔ deniz gündüz.....63  
hemama nûjen ↔ mistefa reşid.....64,65  
ji rojêke agirpêkêfî helbesteke ji dÛyê zirav ↔ cihan roj.....65  
cendek ↔ evdile koçer.....66,67,68  
sikrata şevê ↔ rojdar.....68  
ceribandineke ji êgir ↔ mûsa vazgalî.....69,70,71  
danişîn ↔ h. kovan baqî.....72,73,74,75,76  
mirinên min ↔ piling.....76  
edgar allan poe ↔ samî hêzil.....77,78,79  
ji 'cathay'a ezra pound çend nimûne ↔ kawa nemir.....80,81,82,83,84  
helbestkarê ûris ê mezin: aleksandr sergeyevîç puşkin ↔ xan bawerî.....85,86,87,88  
kirmanciye de astrolojî û mîtolojî ser ↔ cemal taş.....89,90,91,92  
pirtûkxane ↔ amadekar: mehmet dicle 93,94,95,96

# Sergotar

Sala 2001'ê, di meha gulanê de me, bi şertê demeke kin, navber S dabû weşana xwe. Lê wa ye laşgirani û destgiraniya me ya ku xûy û xisletekî me yê diyar e, hişt ku devîdevî du salên bêyî kelepûra me ya bi navê **Rewşen û Jiyana Rewşenê** derbas bibin. Lêbelê di gelek pêvajoyên dîrokî de, gelek caran hin guftûgo hene ku dihêlin kar ji bo demekê raweste, lê di dawiya dawîn de encamên tertîjî derdikevin.

Em ê hewsengandina du salên ku bêyî me derbas bûn di vê sergotara xwe ya pêşîn de nekin. Hûn ê wê hewsengandinê li jêr sernavê *Çima Rewşen-name?*, di rûpelên 4. û 5. de bixwînin. Bê guman gelek pirsên me hene ku wê bi bihurîna demê re werin bersivandin. Em dibêjin, bêyî ku em gilî û gazinan li hev, li matmayînen xwe, li bertengiyên xwe bikin, em doza xwe ya bipêşvebirina hemû şax û şovên zimanê kurdî, kelepûra wêjeya xwe û pêvajoyên çanda xwe eşkere bikin. Kurdan di siyaseta û şer de rêbazeke zanistî, saziya pêşengî û Serokatîyeke dîrokî bi dest xist; ev yek dev li cihanê tehl bike jî, wisa ye. Her wekî vê, kurd bi riya rênçberî û zehmetkêşîya sî salên têkoşana azadiyê, êdî li pey rêbaza *ramana kurdûnêke nû* ketine. Tevî hemû êrişên ku bi destên bêtar, dirrînde û cinawirên pergala dagirkeran tên kirin, ku ev xwînmij nexasim rewşenbîr, nivîskar û hunermendên *tirk* in ku di gorepana wêje, huner û çandê de cerdê bi ser kurdan de tînin, ev saziya *ramana kurdûnêke nû* û *nûneriya mirovahiyê* ava dibe.

Mirov bi hiş û laşê xwe ve çawa li ser rûyê cihanê hat kuştin, êdî diyar e. Çerxên vê mekanîzmaya ku gelekî bêguneh û dilpak tê xwiyakirin, êdî li ber çavan e.

Kurd di pêvajoyên gelekî giran re bihurîn, dibihurin. Piştî Komploya Navneteweyî, ku divê wijdana gelek kesên me yên rewşenbîr hejandibe, ji ber ku girîngiya saziya pêşengîyeke durist ji pir gelan zêdetir ji kurdan re hewce ye, êrişeke berdeyam heye. Ev êriş bi hemû rêbazan berê xwe didin ser axa kurdan. Êrişa ku li Îraqê bê kirin, siyaseta tecrîtê, hesabên ku kêlî bi kêlî tên kirin, bila ev yek baş bê zanîn, beriya her herêmeke din, li Kurdîstana Başûr tu xêrekê li kurdan nake. Bi vê bazara bêbira pîrîskek derfet û delîve ji kurdan re çênabe.

Kesên ku ew qas bi dilsafî bifikirin ku huner, wêje û siyaseta tu carî nabin yek tişt, dê her tim hebin. Em jî dibêjin, ev têgeh di pratîkê de ne yek tişt in, lê di gorepana civakî de her kêlî, li her derê, rengê wê çî dibe bila bibe, teqez cureyek îdeolojî û bîr û bawerî heye ku serdestî her kesekî/e wê civakê ye. Huner û wêje, bi wî awayî jî hunermend û wêjekar, bi hemdê xwe an jî bê hemdê xwe, wê zêde dike, wê rastiye li ser xwe û li ser civakê disepîne. Mesele ew e kî li kîjan eniyê radi-hêje şûrê xwe û şora xwe. Ev pîrs, nexasim jî bo nivîskarên kurd ên ku doza azadiya afirandinê dikin, babeteke sereke ye ku divê bê eşkerekirin.

Me di vê navbera xwe ya dirêj de, bi kûranî guftûgoya van têgehên kir. Me dîroka xwe ya deh salan hewsengand. Me kêmasiyên xwe, wekî babetên xebata vê kovarê, yeko yeko gihand biryarên me yên neteweyî.

Û em bi navê **Rewşen-name**, bi rêveçûna dirêj ber bi we ve hatin. Bi banga *Guhiran, Hê Bêtir Guhiran û Veguhiran!*ê.

## Çima Rewşen-name?

rewşen-name

**D**i pêvajoya pêkhatina kesayeti û neteweyan de, di hemû dem û serdemman de. huner û wêjeyê her tim rol û ciyekî xwe yê sereke hebûye. Serbûriyên ku di nava têkoşînên bipêşveçûn û geşedana civakî de derketine holê; êş û azar, coş û peroš, karesat, bobelat û reşebaiyên ku qewimîne û hemû hatina jibîrkirin, bi tenê bi riya nivîsê her tim li ber çavan mane, bi vî awayî bûne himên netewebûna civakan û gelan. Pênûs bi wî awayî bûye temînata jiyana hestên hevpar û piştî demekê jî, bûye afirînera neteweyekê. Ji ber ku nivîs gihişt asteke bilindtir, estetîze bû, bi dû re nivîsa awarte, ango wêje derkete holê. Dibe ku ev pêvajo û qonax ji bo gelek civak û neteweyan bihuribûn, lê rastiyeke ku nayê mandelkirin (înkarkirin) heye ku civak û kesayetiya kurd di roja me de, di fetlonkên herî dijwar ên kesbûn û netewebûnê re derbas dibin. Ji bo vê yekê jî, pêwîst e kurd wekî neteweyekê vê çeka ku di vê mijarê de çeka herî kujer û vejîner e bi zanîn, bi hemdê xwe bi kar binin û ji serbûrî, ezmûn û ceribandînen civakên din sûd werbigirin. Têkoşîna azadiyê derfetên gelekî mezin û firawan pêşkêşî gelê kurd kiriye û ev çar sal e ku bi têgeha Ronesanse, li hemû qadan guftûgo tene kirin. Em jî, wekî kovar pêbawer in ku kurd di warên wêje, felsefe û ramanê de Ronesansekê dijîn û her wiha em xwediyê vê dahkê ne ku em di vê pêvajoya vejîn û hişyariya giyanî de nebin dûvik,

bibin ekola zimanekî hevgerî. bi kar û berhemên xwe bibin bersiva pirsê “*Wêjeyê çawa û wêje, lê ji bo kê?*”, bibin platforma guftûgo û danûstandînen zanistî, ramanî, rewşenbîrî û demdirêj. Ji bo ku ev platform û zimanê ku bi kar bîne ji têgihîştina gelemperî, an jî ji gel dîr nebe, an jî gel ji van guftûgo û danûstandînan bi dîr nekeve, divê rewşenbîr xwe di nava gel de bibînin û meseleyên gel wekî yên xwe bibînin. Ji bo ku xwendevan û nivîskarên Rewşen-nameyê hevdu fêhm bikin û hevdu xurt bikin, divê pir bi xurtî hest bi pêwîstiya hebûna vê ekolê, vê dibistanê bikin. Em wekî kovar, me hay ji dabeşkirina ku li ser çand, gel, civak û kesayetiyan tîn sepandin û bi xwînxwarî tê meşandin heye. Ev dabeşkirina ku bi awayekî sistematîze tê meşandin, ji kurdan re wateyeke xwe ya din heye û kurdî di vê babetê de jî, mixabin xwedî xweseriyekê ye.

Pêşî, ji bo ku em rêveçûnekê zelaltir bikin, pêwîst dike ku em vê yekê destnîşan bikin: Pêkhatina kesayetiya takekesê/a kurd, pêkhatina nasnameya hevbeş a neteweya kurd, pêvajoyek e ku her berdewam e. Ji ber êrişên dereke û qelsiya ku ji ber van êrişan peyda bûye, vê pêkhatinê peresana xwe ya pêwîst bi rêkûpêkî, nedomandiye. Ji ber dabeşbûna fizîkî ya welatê me, her çend di hin beşên welêt de mela dirûvgirtinekê derketibe holê jî, vê carê jî bi giranî li jêr bandora wî welatê li ser Kurdistanê serdest, bi

## REWŞEN-NAME

wî awayî ji li jêr bandora çanda neteweya serdest maye. Kurdan pêşketin û geşedanên xwe yên biçûk negihandine hevûdin, nekarîne bigihînin hevûdin. Xebat û biza-veke ku bi destên hin dilsozan hatiye kirin, di nava tixûbên wir de maye, bê guman jî herêmi maye. Bes gava em şert û mercên ku em her tê de bûne daynin ciyekî, gelo em ê dişa bikaribin bibêjin, ku ev herêmitiya diyardeya wêje, huner û çandê her ji dijmînên koka me qewimiye? Ji vê re bersiva me. na ye! Heke em di ser navkokî û berberiyên me yên navxweyî re qevaz bidin (Em behsa navkokî û berberiyên me yên qada feodal nakin, em behsa yên dema me ya hevçax dikin!), em ê nikaribin dîroka xwe ya dûr û ya nêzîk rast helsengînin. Her wiha, heke em bergeha ramana xwe firehtir nekin, bi wêrekî bi ser van taybetî û xalên nasnava xwe ya neteweyî de neçin, em ê di ser rastiya xwe re qevaz bidin, ku li çareseriyaya xwe digere. Ji ber ku nişên me yên nivîskarên durist zêde ranebûne, em her bi hêsanî li hin ciyên dûr li nepakiyê geriyan.

Em dikarin wiha bipirsin: Gelo çi tiştî an jî tiştan hiştiye ku gerokê rojavayî di sed-sala 20. de rabe dirûvê rewşa skotiyan a li hemberî îngilîzan bi me bixe?

Rewşen-name amade ye ku bibe platforma ronikirina vê yekê. Bi piştevaniya hemû nivîskarên me yên ku xebata wêjeyê, hunerê û çandê bi helwesta bîrdozî û polîtîk re wekî yek diyarde difikirin û bi wê rêbazê diafirînin!

Dirûvgirtina kesayetîya me û pêvajoyên pêkhatina nasnava me ya neteweyî, bi hêz û şiyana tevgera me ya *hirêveçûna bêna*, di demeke gelekî dijwar re derbas dibe. Ev dijwarî, bi raya me, ji dijwarî û tundiya ku di navbera hêzên çekdar de didome hê dijwartir, hê tundtir e. Karê vê *rêveçûnê* rûxandina wan rastiyan kambax e, ku heya niha wekî tekane rastî li ser me sepandine: Kesayetîya dudil, nêzîktêdayîna erzan, nifirkariya gelemperî, jin û mêraniya ku esas tu gotineke wan a ku *gotin* were hesibandin nine ku ji hevûdin re bibêjin. Bê guman di vê yekê de heznekirineke ku digirmije heye. Bi ya Rewşen-nameyê, bi tenê ev jî babetên

bingehîn in ku bi veçirandin û bê tirs derbirîna van karek e ku divê şaxên wêje û hunera kurdan dest bavêjinê. Bi tenê bi hûnandina van babetan jî, di vê *heyama me ya bihurîne* de, em dikarin dînamîkeke xurt ji nasnava xwe re biafirînin. Ev jî, bi tenê ji nava me û bi destê me û bi xurtkirina çanda kurdî diafire.

Em ê guftûgoya xwe ya têgeha Ronesansê jî, di nava xebatên vê kovarê de, ji vê radeyê bidin destpêkirin. Bi piştevaniya hemû nivîskarên me yên ku xebata wêjeyê, hunerê û çandê bi helwesta bîrdozî û polîtîk re wekî yek diyarde difikirin û bi wê rêbazê diafirînin!

Hişyariya me ya pêşîn, ku ji zû de ye me dîtiye û wisa jî kiriye, ji bo nivîskariya nivîskarên me yên *erzan û ji nişkê ve ye*. Xwerist yên jar û bêbehre ji nava xwe berdide, li bêjîngê dixê, nebû jî, wan çêli dîke. Êdî xweristeke kurdan jî pêk tê. Dê ev xwerist jî, bi wî awayî kar bike. Hûn bi kelepûra zimanê xelkekî, ruhê xelkekî dixuliqînin. Ev kar bê rêbaz, bê formasyon û bi korîzanî nabe. Berpirsiyariya we mezin e. Hûn ê bi duristî nêzîkî helsengandina van qonax û kesayetîyan bibin. Rabirdûya ku bi dubarekirina neqş û moçikên xwe her li me vedigere, ji serdema me re nabe hêz û şiyana. Her wiha, dahatû jî li ser gotinên pir û kirinên kêr nayê avakirin. Bi raya Rewşen-nameyê, her xebatkar û nivîskarekî vê kovarê bide ser vê rîya ku em jê re dibêjin *saziya rexneyê*. Wê ev kovar ji nava xwe û ji nava komên civaka kurd, -heta jê bê, ji hemû parçeyên welêt- van kesayetiyên bilind derxe, da ku bikaribin ji pîrsa "*Wêjeyê çawa û wêje, lê ji bo kê?*" bibersivînin. Bi piştevaniya hemû nivîskarên me yên ku xebata wêjeyê, hunerê û çandê bi helwesta bîrdozî û polîtîk re wekî yek diyarde difikirin û bi wê rêbazê diafirînin!

Li ber derketinê, bîr û raya Rewşen-nameyê bi kurtî ev e.

Yê mayîn bi xebatê ve ye.

Bi vê banga derketinê ve, em **Roja 8'ê Adarê û Newroza** we xwendevanan gişan pîroz dikin!



# haveynê ronesans û geşedanê raguhestin e

w. mazlum doğan

## Bi Navê Yezdanê Mezin Raguhêze!

**B**i awayekî ji adetê der ez ê dest pê bikim; çawa ku ji bo îslamiyetê wehiya yekemîn, "Bixwîne!" ye û nişaneya serdemeke nû ye, ji bo kurdan jî "Raguhêze!"\* (Wergerîne!) wê bibe binesazê **Ronesansa Kurdan**, ku çav li riyê bûne stêrk, lê hê jî berê xwe nedaye kurdan. Jixwe dema ku mirov li serpêhatiya şaristanî û neteweyên din temaşê dike, raguhestin her bûye haveyn û avakarê Ronesans û geşedanê.

(Li ser vî awayî, mirov dikare pêxemberan wekî raguhêzerên (çevirmen) pêşîn ên cîhanê bi nav bike. Lew re wan jî peyama Yezdên raguhezt zimanê mirovan. Li aliyê din, ev yeka hanê di mîtolojiya yewnanên pêşîn de jî xwe dide xwiyakirin. Yezdanê Lingbask Hermes ferman û peyamên Diyarê Yezdanan radiguhezt Diyarê Mirovan, bi şeweyekî bikaribin têbigihîjin. (Sözün Ötesi, Akşit Göktürk, 1989) )

Em ê di vê nivîsê de li xwe bidin ku bersiva van pirsan bidin ber ronahiyê: Girîngî û karîgeriya raguhestinê di avabûna şaristanî û neteweyan de çi ye û di vê serdema hanê de girîngî û pêwîstiya wê ji bo kurdan çi ye? Lê divê ez vê yekê jî bibêjim, ev nivîs qala tiştên nû û roninedîtî nake, lê wekî diyar e, ligel girîngiya raguhestinê, di vê yekê de kurdan li Bakur tu gavên berfireh û rêxistî neavêtine. Lew re ev nivîs bîrxistin-nameyek e, da ku / dibe ku ji nava kurdan jî Hasan Ali Yücelek rabe!..

Li pey Raguhestin-nameya (Çeviri Dizin) UNESCO'yê, ya ku di sala 1970'yan de belav kiriye. piştî sala 1940'î kar û xebatên ku li ser

raguhestinê hatine kirin pênc caran li yên berê ne. Ji ber vê hindê, navê *Sedsala Raguhestinê* li sedsala 20. hatiye kirin. Wekî din, teorîsyenê bi nav û deng ê raguhestinê Eugene Nida jî diyar dike ku di tu serdemên dîrokê de, ji bo raguhestinê ev qas wext û ked nehatiye dayîn. (l. bn. Akşit Göktürk)

Li cîhanê, zana û dîroknas hevber in ku binesaza şaristaniyên nû raguhestin e. Ev yek, bi diyartirîn şeweyî, li Ewrûpayê, di Serdema Ronesansê de xwe dide xwiyakirin. **ŞARISTANÎ BI RAGUHESTINÊ PÊK TÊ!**

Ord. Prof. Hilmi Ziya Ülken, di pirtûka xwe ya bi navê *Uyanış Devirlerinde Tercümenin Rolü* (Di Serdemên Hişyarbûnê De Rola Raguhestinê) de, ji Serdema Yewnaniyên Pêşîn, Şaristaniya Îslamiyetê bigire heya Serdema Ronesans û Komara Tirkîyeyê, bi şeweyekî berfireh qala serpêhatiya raguhestin û raguhêzeran dike.

Ülken dibêje, "Tiştê ku hêz û şîyanê dide serdemên hişyarbûnê raguhestin e." Bi baweriya Profêsor Ülken, ew hişyarbûnên mezin, ku wekî binesazên şaristaniyên cihê cihê xwiya dikin, di rastiya xwe de bi zincîreke ramanî, ku her diçe firehtir dibe, bi hev ve girêdayî ne. Tiştê ku vê yekê pêktîne jî, nemaze raguhestin e. Ülken vê boçûna xwe wiha berceste dike: "Hişyarbûna yewnaniyên pêşîn bi raguhestinên ji Enedol, Fenîke û Misirê, hişyarbûna Ûyxûran bi raguhestinên ji Hindistan, Îran û nestûriyan, hişyarbûna Îslamiyetê bi raguhestinên ji yewnan (nestûri, yakûbî) û Hindistanê, Ronenansa Roava jî, bi raguhestinên ji Şaristaniya Îslamê, cihû û yewnanî pêkhatiye."

## REWSEN-NAME

Helbesta John Keats (1795-1821) a bi navê *Ku Min Cara Pêşin Çav Li Homerê Chapman Gerand*. Li darê dinyayê, ji aliyê gelek raguhêzer û zanayan ve ji bo girîngî û hejahiya raguhestîne wekî nimûne tê raberkirin:

### On First Looking Into Chapman's Homer

*Much have I travell'd in the realms of gold  
And many goodly states and kingdoms seen:  
Round many western island have I been..  
Which hards in fealty to Apollo hold.  
Of one wide expanse had I been told  
That deep-brow'd Homer ruled as his  
demesne:*

*Yet did I never breathe its pure serene  
Till I heard Chapman speak out loud and  
bold:*

*Then felt I like some watcher of the skies  
When a new planet swims into his ken:  
Or like stout Cortez when with eagle eyes  
He star'd at the Pacific -and all his men  
Look'd at each other with a wild surmise-  
Silent upon a peak in Darien.*

### Ku Min Cara Pêşin Çav Li Homerê Chapman Gerand\*

*Min li gelek welatên zêrîn kir ger û geryan.  
Gelek dewlet û şahnişîniyên ezîm dîm:  
Li derûdora gelek dorgeyên roava hêwirim  
Ku tê de dengbêjên dilsoz li ber Apollo digerîyan.'*

*Zor caran ji min re salixê asiwana balûpal dan  
Ku Homerê dûrebîn lê fermanrewa bû:  
Belam min çi carî berzîtiya wê ya xwerû  
hilnemêtibû*

*Ta ku min bihist şûrê şora Chapman da olan:  
Paşê min xwe fena yekî çavnerê esmanan seh kir  
Gava ku dikişê diçe nava dîmena xwe  
felekeke nû:*

*An ji nola Cortezê dilêr, gava ku xwe eyloki kir  
Awir kuta Pasîfîkê -û peyayên wî hemû  
Li hevûdin nihêrîn bi ramaneke har û dir-  
Li ser lûtkeyeke li Darienê, bê deng û beng hemû*

Wekî diyar e, di vê helbestê de, Keats qala raguhestina Chapman a ji Homeros dike. Bi vê raguhestîne, Keats bi diyarê welat û deryayên nû dikeve. xwe wekî esmannasekî ku gerestêrkeke nû vedîtiye dihesibîne.

*Niha jî, em li serpêhatiya kurdan temaşe bikin. Wekî diyar e, piştî rabûna "Ekola Swêdê" û bi taybetî jî, bi geşbûna tevgera Partiya Karkerên Kurdistanê, di destpêka salên 1990"î de, navê "Ronesansa Kurdan" pir hate hildan. Lê balkêş e, di vê yekê de, kurdan bi têra xwe navê raguhestîne hilneda, ku serhoker û binesaza Ronesansê ye. Îro jî, kurdan bîra vê yekê nebiriye. Ecêba giran, ev qas navê "Ronesansê" hate hildan, lê berhemên ku kurdên Bakur raguhêztine kurdî ne darî çavan in!..*

### Zimanê Zimanan e

Akşit Göktürk jî, ku li Tirkiyeyê wekî binesaz û serşarezayê raguhestina nûjen tê zanîn, navê helbesta Keats hildide û raguhestîne wisa rave dike: "Mirovahî ji Serdema Babilê heya îro bi zimanên curbicur axiviye. Bi vî aliyê xwe raguhestîni di ser hemû zimanan re ye, zimanê zimanan e. Raperîneke Prometheusane ye li dijî rewşeke kâmbax, ku mirov ji ber belawelakirina Yezdanekî xêrnexwaz ketine." (Çeviri: Dillerin Dili, 1986)

Nivîskar û wêjenasê tirk Nedim Gürsel jî, ku li ser dîtina Hilmi Ziya Ülken û Akşit Göktürk e, dibêje, Ewrûpa bi riya raguhestîne ji nava tariya Serdema Navîn derketiye. Ev ramanên Gürsel gelekî manîdar in: "Diyar e, gava ku civakê kirasê xwe diguhirîne, ango ji awayekî hilberîne ber bi awayekî hilberîne yê pêşketîtir diçe, di banesaziya (üstyapî) civakê de, nemaze di warê çandî de, karûbarê raguhestîne geştir dibe. Di destpêkê de, mirov dikare çandekê, ku li binesaziya nû digunce, bi riya raguhestîne pêkbîne." (Cumhuriyet Dönemi Türk Ansiklopedisi, Çeviri, 1983)

Li ser vî awayî, niha jî em ê bala xwe bidin ser serpêhatiya raguhestîne ya li Komara Tirkiyeyê û bidin xwiyakirin bê çawa raguhestîne wêjeya nûjen a tirkî afirandiye. Lê beriya wê, ez dixwaz-

im qala bûyereke balkêş bikim. Di heyama padişahê osmaniyên Kanûnî Siltan Suleyman de, raguhêzerên *Diwan-ı Humayûnê* piranî jê rûm bûne. Ev raguhêzer li gorî gelê xiristiyan ê medenî xwedan îmtiyaz bûne. Nedim Gürsel wiha radigihîne: “Van dikaribû riyê xwe berdîn, çar xizmetkaran ragirin, li hesp siwar bin, girîngtirin tişt jî, dikaribûn kurk li xwe bikin.”

### “Rewşenbîrê Tirk Ji Nava “*Tercüme Odası*”yê Rabû”

Di dîroka Tirkîyeyê de, tevgera raguhestîne ya rêkxistî yî pêşîn di *Serdema Helaleyê* de dest pê kiriye. Lê tevgera ku bîngeha wêjeya nûjen a tirkî daniye. di *Serdema Tanzîmatê* de, bi xebatên *Tercüme Odasıyê* (1832) geş bûye. Nivîskarê tirk yên wekî Şemsettin Samî, Namîk Kemal, Rezaizade Ekrem û Ahmet Mîthat û éd., ku avakare wêjeya nûjen a tirkî ne, piştî xebata *Tercüme Odasıyê* rabûne. Lew re vê odayê gelek cureyên wêjeya nûjen, bi taybetî roman, şano raguheztine zimanê tirkî û kiriyê ku ev cure bi cî bibin. Jixwe Şemsettin Samî, Namîk Kemal, Rezaizade Ekrem jî, beriya ku berhemên xwe binivîsin, li *Tercüme Odasıyê* kar kirine û hindek berhem raguheztine zimanê tirkî.

Li ser *Tercüme Odasıyê* nivîskarê tirk Ahmet Hamdi Tanpınar dibêje: “Dorhêleke gelekî pêşverû bû, ku tê de ramanên nû û idealên nû yên siyasî peyda bûn.” Yalçın Küçük jî dibêje: “Rewşenbîrê tirk ji nava *Tercüme Odasıyê* rabûye.”

Di dîroka tirkî de, tevgera raguhestîne ya duyemîn, ku ya herî mezin û karîger e, di sala 1939'an de, bi *Tercüme Bürosuya* ku bi pêşengiya Wezîrê Perwerdehiyê Hasan Ali Yücel ava bû, dest pê kir. Li pey agahiyên Vedat Günyol, ku yek ji xebatkarên wê bûroyê bû, vê bûroyê di nava 6 salan de nêzikî 900 pirtûk raguheztine tirkî. Vê bûroyê jî klasîkên Ewrûpayê, Yewnanên Pêşîn, Romayê û Rohilat gelek berhem raguhestîna tirkî û kir ku di wêjeya tirkî de, bi taybetî di salên 1950'yî de geşedaneke xurt li dar bikeve.

Nedim Gürsel karîgeriya raguhestîne ya li ser wêjeya tirkî wiha raber dîke: “Va ye Nîfşê Xerîban û helbesta fransizî, ango têkiliya felsefeya egzisyantalîst bi Ferit Edgü û Demir Özlü re. Va ye raguhestînen *Weşanxaneyê Remziyê* yên Gorkî û şewaza Orhan Kemal û Firuzanê ya

realîst. Helbesta me ya îroyîn jî, bi giştî xwe bi raguhestîne xwedî dîke.”

Niha jî, em li serpêhatiya kurdan temaşê bikin. Wekî diyar e piştî rabûna “Ekola Swêdê” û bi taybetî jî, bi geşbûna tevgera Partiya Karkerên Kurdistanê, di destpêka salên 1990'î de, navê “Ronesansa Kurdan” pir hate hildan. Lê balkêş e, di vê yekê de kurdan bi têra xwe navê raguhestîne hilneda, ku serhoker û binesaza Ronesansê ye. Îro jî, kurdan bîra vê yekê nebiriye. Ecêba giran, ev qas navê Ronesansê hate hildan, lê berhemên ku kurdên Bakur raguheztine kurdî ne darî çavan in!..

Di vî warî de, bê guman pêşîn NÜDEM Werger tê bîra mirov, ku li Swêde bi tenê hejmarek derçû. Wekî din jî, li Ewrûpayê, bi taybetî jî li Swêdê, kesên wekî Hesenê Metê, Mustafa Aydoğan, Fawaz Husên, Firat Cewerî, Şahîne Bekirê Soreklî, Huseyn Mihemed, Serdar Roşan; li welêt jî, Osman Özçelik, Kawa Nemir, Rûken Bağdû Keskin, Yakup Karademir, Dildar Şêko bi awayekî pîşeyî bi karê raguhestîne radibin. Hêjayî gotinê ye, kesên mîna Hesenê Metê, Fawaz Husên, Firat Cewerî, Şahîne Bekirê Soreklî, Serdar Roşan, Huseyn Mihemed û Kawa Nemir beriya ku berhemên xwe binivîsin, bi karê raguhestîne rabûne!..

### Raguhastin Zimên Disû

Bê guman tevgerên raguhestîne yên ku bine-sazên Ronesans û geşedana ramanî ne, bi pişt-giriya dewletê û bi şeweyekî rêkxistî û şarezayane kar dikin. Ji ber vê hindê, li Bakur rewşa kurdan gelekî dijwar e; dilsariya li ser zimên, nebûna xwendevanan, qedexekariyêke bêhempa û bêpayan!.. Lê ligel vê rewşa ku mirov “cinoyî” dîke, yek dikare tiştina bike, ango Donkîşotiyê bike!.. Şert û merc dijwar in, lê divê mirov li hêviya Mehdî jî nemîne!.. Lewma zimanê kurdî payî ye, lê hê jî ji xewa salan ranebûye ser xwe. Çawa ku prensesa gonê bi ramûsanekê ji xewa salan hişyar bû, wê zimanê kurdî jî bi raguhestîne ji xewa salan hişyar bibe, rabe ser xwe!.. Raguhestîna wê zimanê kurdî bisû, ku ji ber qedexekirin û sersariyê ko bûye.

Lew re raguhestîna haveynê geşedan û vesazîne (reform) ye. Raguhestîna wê bike ku pêyva kurdî toza li ser xwe dawêşîne û pê re jî, karîna û gencîneya xwe derxe holê. Ji ber ku çin û



## REWŞEN-NAME

neqşên tevna zimanê kurdî, bi têra xwe, diyar nebûne û nayêne nasîn. Îro, tevna gelek berhemên kurdî bi çîn û neqşên zimanên din tê raqandin. Kurterê, raguhestin wê bike ku zimanê kurdî ji silûkê derkeve û pê re jî, kurd zimanê xwe binasin û pê piştrast û serbilind bibin.

Di vê yekê de, serpêhatiya zimanê tirkî ji bo kurdan gelekî sûdewar û ronîkar e. Pêşîn em li nivîskar, rexnegir û zimannasê tirk Nurullah Ataç guhdarî bikin: "Êdî ji kêmasiyên tirkî bêtir li kêmasiyên xwe rast tîm. Êdî ez zêde nabêjim, "Heyran ev gotin bi tirkî nayê gotin." Li şûna wê, dibêjim. "Hey tirkiya vê gotinê heye, lê çi ye? Ez têderna xim." û pê xemgîn dibim." Ataç, çi di serdema xwe de, çi jî piştî mirina xwe, yek ji "pîr"ên ziman û wêjeya tirkî bû. Wî jî, di nava *Tercüme Bürosuyê* de kar kiriye.

Nivîskarê tirk Ferit Edgü jî, bi gotineke ku ji Nietzsche wergirtiye vê yekê gelekî xweş berceste dike: "Nietzsche dibêje, "Karîna zimanekî bi giştî ji ya zanabûna me gelekî zêdetir e." Ji bo ku vek bikaribe karîna zimên zefî bike, jîriyeke livgîn (işlek) divê." (Ders Notları, 1998) Bê guman ji bo vê yekê zêrê zêran e!.. Yek ji endamên *Tercüme Bürosuyê* Azra Erhat jî, wisa qala wan rojan dike: "Zimanekî sererast tunebû; zimanekî nivîskî yî tekûz û saz jî tunebû." Erhat jî, xebatên vê bûroyê wekî binesaza wêjeya îro ya tirkî li qelem dide.

Îro li Bakur, kesên ku bi kurdî dinivîsin hê bi têra xwe li zimanê xwe venebûne; bi ferhengan, bi şeweyekî ferhengî dinivîsin. (Ez jî tê de.) Ez bawer im çawa ku avakarên wêjeya nûjen a tirkî bi raguhestinê kemilîne, wê avakarên wêjeya kurdî jî, bi raguhestinê bikemilîn. Raguhêzer û nivîskara tirk Tomris Uyar, her çend zimanê tirkî di dema wê de gelek gav avêtibin jî, wisa dibêje: "Ji bo ku ez fêrî zimanê xwe bibim, min dest bi raguhestinê kir." Ez jî, piştî xebata çar salan, hê nû fêrî kurdî dibim, ji ber ku hê nû ketim nava geli û newalên zimanê kurdî.

Li aliyê din, raguhestin dike ku zimanek di her warî de termînolojiya xwe biafirîne. Lew re zimanê kurdî di gelek waran de ne xwedî termînolojiyeke tekûz û berfireh e. Ka em li Vedat Günyol guhdarî bikin: "Zimanek bi riya raguhestinê beramberî têgînên nû têgînan diafirîne û bi vi awayî hino hino geş û berfireh dibe. Qonaxa ku îro zimanê me gihiştiye bê guman bi riya raguh-

estîne pêkhatiye."

Li aliyekî dîtir, wekî tê zanîn, bi taybetî serdest û zanayên wan, zimanê kurdî kêm dibînin û serevdeyan lê dikin. Jixwe ev ne tiştekî ji adetê der e!.. Lê mixabin, kurd jî hê di dilê xwe de, baweriya xwe bi zimanê xwe nayînin. Gelek kes dibêjin, "Zimanê kurdî dewlemend e.", lê ev piranî "nirxandineke siyasî" ye, an jî ji bo dilxweşkirinê ye. Ger raguhestineke rêkxistî, berfireh û şarezayane bê kirin, beriya her tiştî ev yek wê pûş bixe eyarê serdest û berdevkên wan. Û hin rewşenbîrên kurd jî dê nebêjin, "Zimanê kurdî zimanê çîrok û stranan e."

Bê guman erka raguhestinê li ba kurdan ne nola neteweyên din e. Neteweyên din nekarîbûn bi zimanê din felsefe û wêjeya cîhanê bixwînin û binasin. Îro kurd li parçeyên welêt û li cîhanê, bi riya zimanên din vê yekê pêktînin. Lê Ronensansa kurdan jixwe li zimanê xwe vegehin e. Lewma kurd heya ku ji zimanê xwe hez nekin, nekin zimanê dilê xwe, wê şoreşa kurdan li ser bingeheke qewîn ava nebe. Em nivîsa xwe bi gotinên Nedîm Gürsel biqedînin: "Wêjeyekê ku bi raguhestinê xwe xwedî nake û deriyê xwe ji cîhanê re digire, bi tena serê xwe nikare bi derfetên xwe geş bibe. Ji ber ku aj û bejn nade. Ku bide jî, nikare bibe cîhanî. Her wiha, raguhestin be, ne raguhestina zanîne ye."

**Têbînî:** Min beramberî peyva *wergerandinê*, ku hema bêjin di kurdî de bi cî bûye, peyva *raguhestin* bi kar anî. Lew re wekî gelek peyvên ku di "kurdîya akademîk" de bi cî bûne, ev peyv jî cîyê xwe nagire. Ji ber ku *wergerandin* bi tirkî *devrilmek* e. *Translate*, ku bi îngilîzî tê wateya *tercümekirinê*, bi pêşgira *transê* pêk hatiye, ku piranî wateya *guhêstin*, *şandinê* dide peyvê. Ji ber ku pêşgira *-raya* kurdî nêzîkî wê ye, min peyva *raguhestinê* bi kar anî.

• **Kawa Nemir** jî îngilîzî "raguhestê" kurdî.

1-Di Serdema Epîk (Pêlewani) ya diroka Şaristaniya Yewnan de (serdema beriya Homer), *dengbêj* an jî *beybêj*ên bi navê *aoidos* hebûn, ku di peristgehan, pîrozbahiyên zewacê û veşartina miriyan de *kîlam* û *zêmarên* bi navê *paian*, *hymenaios* û *threnos* digotin. Ji van cureyan *paian* bi tenê li ser mîhrvanî, dilovanî û şikûdariya xwedayê royê Apollo dihatin gotin. Di risteyê de, ji wan tê qalkirin. (K. N.)♦

# çîroka ciwan

dilawer zeraq

**B**eriya ku ez bi çav û awirekî rexneyî dest bi nirxandina çîrok, an jî pirtûkekê bikim, pêşî ez bala xwe didimê bê ka çîrokê (bi tevahî pirtûkê) çêj û eleseke çawa û bi çi rengî daye min; gelo ez jê êşiyame, an jî qehirîme, pê şad û kêfxweş bûme, keniyame, an jî xemgîn bûme, gelo wê ez aş kirime û hedira min pê hatiye... Ka nivîsarê çi qasî ez kişandime nava xwe û ez bûme hevalbendê ruh û derûniya nivîskêr a di dema nivîsandina nivîsarê de û ka piştî xwendinê, kîjan pêjn li min rabûne û bûne serdestên derûniya min?..

Ji ber vê yekê jî, ez gelekî bi boçûn û ramanên xwe yên der heqê pirtûkê de dilebikim, da ku ez belaseba neheqiyê li berhemê nekîm û pesnên beredayî jî nedim. Dibe ku di berhema ku hêjayî nirxandinê tê dîtin de xweşî, kêmasî, rastî û nerastî jî hebin. Lê bəriya her tiştî, berhem ji ber berhembûna xwe ya hunerî hêja ye. Û çi kes ji berhemeke bêkêr re nabêje, tu ji tiştêkî re nabî, lê dîsa jî ez ê qala şaşî û kêmasiyên te bikim...

Di vê nivîsarê de, min dil heye pirtûka *Epîlog* a çîrokan a **Hesenê Metê** bidim ber boçûn û sefo-ka nirxandinên rexneyî. Her çend heta niha sê pirtûkên nivîskêr li welêt derçûbin jî, em hîna jî baş pê nizanin bê ka nivîskar xwe wekî çîroknûs an jî romanûs bi nav dike. Lê ev yek ne xem e. Û em baş pê dizanin, romanûsên ku çîrokan serkeftî nivîsîne (bo nimûne, Charles Dickens, Gogol, Kafka...) û çîroknûsên ku di nivîsîna romanê de jî zêde bi ser neketine jî hene. (Wek Guy de Maupassant. Sait Faik Abasıyanık...) Jixwe rîspî û hosteyên çîroknûsiyê yên hêja, Anton Çehov û Edgar Allan Poe qet dest neavêtine romanê.

Hesenê Metê di pirtûka *Epîlogê* de jî, bi zimanê xwe yê fesîh, rewan û zelal nimûneyên ji

zimanê kurdên xas dide me. Û pirtûk heta tu bêji bi gotinên arizî kurd û kurdewariyê dagirtî ye. Herikîna zimanê nivîskêr a bi awayekî xwezayî çêj û eleseke xweş dide çîrokan. Lê bi ya min, her çi qasî zimanê rojane (yê li kuçeyê û li malê) bingeh û kana jênager be jî, divê nivîskarên wêjeya kurdî her û her hewl bidin xwe, da ku bikaribin di her nivîsarê de zimên careke din û ji nû ve biafirînin. Û em baş dizanin ku afirandina zimên ne çêkirina zimanekî nû ye. Divê di nava sînor, bastûr û zerengiya zimanê kurdî de, bêtir ku qalibên zimên xera bibe û ji mantiqa zimên bi dût bikevin, nivîskarên kurd jî bikaribin zimanên nivîsandinê (yên arizî xwe jî) biafirînin. Divê li vir bê gotin ku zimanê nivîskariyê yê arizî Hesenê Metê heye û êdî navê wî li binî nenivîsandî be jî, heke nivîseke wî bixwînim, ez ê bikaribim bibêjim; ev nivîs ya Hesenê Metê ye. Lêbelê ez dixwazim balê bikişînim ser tiştêkî, ku bikaribim daxwaz û mebesta xwe baş bînim zimên, ew jî ev e: Heke peyv û hevokê bi tenê bi wateyên xwe yên ku di axaftina rojane de bê hilgirtin û bi wateyên rojane ku lê tê barkirin bê bikaranîn, wê hingê wêje dê nikaribe rola xwe ya afirîneriyê bilîze.

Û ji ber ku ez bi xwe kurteçîrokê gelekî nêzikî helbestê dibînim û dibêjim, hemin helbestên xwedî çîrok hene, wê hingê hebûna çîroka helbestî jî, ji ber têkiliya di navbera wan de, tiştêkî gelekî asan û xwezayî ye. Bi ya min, divê êdî peyv û hevokên kurdî jî, ne bi tenê di helbestan de, di çîrokan de jî bi awayekî hêmayî û bi wateyên ku di hundirê xwe de firehiyê pêk-tînin bîn bikaranîn. Û ev vatîni jî, ya nivîskarên hêja yên wêjeya kurdî ye.

## REWSEN-NAME

Piştî van gotinan, êdî ez dixwazim bêm ser çîrokên di pirtûka *Epilogê* de.

Hesenê Metê di çîrokên xwe yên pirtûka *Epilogê* de, mijarên curecure yên wekî êş û kul û kêf û têkçûn dike kelûmel û hêmanên resen ên tevn û hûnakên xwe. Di çîrokên wî de, tiştê ku cara pêşîn bala min kişande ser xwe diyalog in. Bi taybetî di çîrokan de, ji bo ku nivîskar bikaribe bêtîr şayesandin û danasîna taybetiyên leheng, kesayetî û karakterê wî/ê eşkere bike, kintirîn rê peyivandina lehengê/î ye. Û wekî ji hemû çîrokan jî xweş diyar e. Haya nivîskêr jî vê yekê heye û bi hostetî vê rê û teknîkê bi kar tîne. Û heta tu bêjî bi ser dikeve.

Hema ez ê di destpêkê de bikaribim bibêjim, her çend *Êş* jî çîrokê zêdetir di rengê vegotinê de ye û bêhna wî cureyê wêjeyî jê tê jî, di beşa destpêkê de (prolog), naveroka xwe eşkere dike. Çîrok bi vê beşê û bi hevokên îronîk û hûrtinazî dest pê dike. Piştî vê beşa kurt a destpêkê, nivîskar di beşa duyem de (monolog), bi lehengê xwe re (Darîne Daryo) piştî xwe dide sparteyeke qewîn (Mîr) û jî wir dest bi gili û gazinên tijî êş û kul dike. Ev gili û gazin jî, geh li xwînerê/a kurd, geh jî li Mîr tîn kirin. Her wiha; heke xwînerê/ê hay ji pêvajoya wêjeya kurdî ya li Ewrûpayê tunebe û nizanibe bê ka çi gengeşî di navbera nivîskarên li derveyî welêt de pêkhatine, çi bûyer qewimîne û çi nakokiyên bêyom ketine nava wan, ku her û her dara kurdî kojandine. ew ê nizanibe û nikaribe têbigihîje bê ka nivîskêr di vê nivîsarê de çi li bêjînga wêjeyê xistiye. Bi beşa dawîn. ku navê xwe jî daye pirtûkê (*Epilog*), dawî li çîrokê tê. Di vê beşê de, piştî ku nivîskar bi bûyer û meseleyên xemnak û pêkeniyê re sedemên xwe radixîne darî çavan, îcar nivîskariya lehengê xwe dide xwiyakirin û derbasî şûna wî dibe. Û bi vê hevoka wî. "Ev çîroka ha divê bi zimanekî din neyê xwendinê. divê her û her bi zimanê xwe î malê bimîne." jî, girîngiya zimanê kurdî

cardin tîne zimên û dest li ber mezinahiya berhemman vedigire. Û em jî, careke din têdigihên ku berhem jî aliyê sinc û etîka wêjeyê ve li pêş nivîskêr e û divê berhem beriya navê nivîskêr qedir, hêjahî û navdariya xwe bi dest bixe, da ku wêjeya zimanekî û pişt re nivîskar pê şanaz bibin.

Di vê çîrokê de, cî bi cî teknîka vegotina ew-vebêj, cî bi cî jî ez-vebêj hatiye bikaranîn. Van teknîkan jî, rê li ber nivîskêr vekiriyê ku di vegotina xwe de bi hêsanî bikaribe rexneyan li xwe û li kesên din bike. Ji bilî beşa ku vebêj-leheng xewna xwe tîne zimên, teknîka şûnvegerana di nava demê de nehatiye bikaranîn. Û ev beşa xewnê, ji ber ku bi temamî tevn û hûnak e. bêtir taybetiya çîrokîbûnê dide nivîsarê. Nivîskar bi vê beşa hanê re bi temamî dikeve nava rexneyên îronîk û hûrtinazî. Û bi van rexneyên xwe jî, divêti û pêwîstiya hêjahî, resenî, xweserî û bikalîtebûna wêjeyê tîne zimên. Û çîroka *Êşê* çîrokeke wisa ye ku heta jê tê di nava xwe de bi xwe re dilepîke û serî li xwe digêrine.

Di çîroka *Nakokiyê* de, berberî û nakokiya ku di navbera du birayan de heye bûye mijar. Û bi gotina bavê ji yê mezin re "Tu mestûmezî nî." û ji yê biçûk re "Qumandarê min!" girêka nakokiyê tê nîşandan û hûnandin. Fişil û parçeyên biçûk ên êzingan bi goşt û hestî tîn şibandin û bi teknîka sembolîzekirinê re jî sînyala çareseriyê tê dayîn.

Fişila ku dipengize nava şorbeyê û ji aliyê zarokan ve jî (lehengên çîrokê) bi goşt tê şibandin dibe sedema zêdebûn û rabûna kel û tansiyona çîrokê. Û dîsa nakokî di peyv û tevlivînên bavo yên hişk re tê nermijandin û cardin bi riya fişilê nakokî tê veçirandin û berberiya ku hatibû nîşandan û çîrok li ser wê hatibû hûnandin tê çareserkirin. Nivîskêr ev çîrok bi teknîka ez-vebêjê nivîsiye. Dema niha di çîrokê de her serdest e. Digel ku baş tê zanîn ku her karakterê ku Hesenê Metê diafirîne li gorî herêm, zanîn û feraseta xwe dipeyivin jî, piştî ku çîrok tê xwendin, jî

ber pëyveke ne di cî de, ku mirov ji vî nivîskarî napê. pîrsek di serê mirov de çêdibe û mirov ji xwe re dibêje: De heydê, em bibêjin ji ber şer û politîzabûyîna êdî her zarok pê dizane ku kevok simbola aştiyê ye. lê gelo çend zarokên gundî dizanin "provokasyon" çi ye û dikarin bibêjin, "Ez navê provokasyonê"?!

Di çîroka *Panoramayê* de, kerb û hesreta lehengê çîrokê (Faro) xweş li hev hatiye hûnandin û çîrok di nava dema niha û bûrî de, bêyî ku xwîner têkeve nava valahî û kêmaniyên dem û wextê. bi çêjê xweş tê xwendin. Di vê çîrokê de, dîmen û bergeha şert û mercên şer, bandûr û encamên wî, ku bêtir di gundan de tînin, hatine kişandin. Nivîskar di axaftina dayika Faro ya arizî dayikên kurd û diyalogên di navbera Faro û dayika wî de, careke din bi ser dikeve. Her çend kel û tansiyona vê çîrokê di destpêka axaftina tîlefûnê de hinekî zêde dibe jî, nagihîje wê pile û dereceyê ku bikaribe ji xwe re hevoka hingivîner biafirîne. wê di dil û mêjiyê xwîner re bike û yekser kel û tansiyona çîrokê daxîne.

Çîroka *Evîneke Melodramîk* ciwantiyê çîroka pirtûkê ye. digel ku lehengên çîrokê jinepîra Zelê û kalemêrê Sofî ne. Û ji ber ku çîrok li ser evîneke miradnekirî hatiye hûnandin û coş û germa evîna bi lixwemikurhatina Sofî û vegotina wî ya şeytaniyê xwe, careke din jî di dilê Zelê de vedîje. çîroka *Evîneke Melodramîk* çîrokeke ciwan e. Û di vê çîrokê de, dem çi qasî bi şûn ve tê veşandin. ew qasî jî evîna jê dizê û çîrok her ku diçe ciwantiyê dibe. Kel û tansiyona çîrokê bi pîrsa Sofî, ku ji Zelê dike û dibêje, "Ma di xortaniyê de dilê te ket yekî. Zelê?" hêdî hêdî radibe û cardin dîsa bi gotina Sofî, "Xwarziyê Leto dilketiyê te bû." digihîje asta xwe ya bilindtir û di heman demê de jî, ev hevok dibe hevoka hingivîner a çîrokê. Û her çend tansiyona çîrokê yekcaran dihêle ku xwîner ji ber Sofî û şeytaniyê wî, ku bûne sedemên miraznekirina evînkê, bi tevî û hûnaka çîrokê biqehere jî; bi çêr û nifirên tûj ên jinepîra Zelê, ku şeytaniyê Sofî jî ji gunehkariyê dişo, hêdî hêdî datê.

Bi ya min, serkeftîtirîn çîroka pirtûkê *Kubarname* ye. Tevnsazî û hûnakeke ecêb û afat!.. Çîrok bi hevokên mîna "...ne ji sansora şermê be..." û "Mîna ku ji tabloyeke Zorn derketibe xanimeke narîn..." û bi hevokên ku xanim (Kejal) pê tê şayesandin dest pê dike; û wekî

Edgar Allan Poe jî nimandiye, hema di benda pêşîn de sînyalên naveroka xwe dide. Û bi gotin û tevliwîniyên xanimê kel û tansiyona çîrokê hêdî hêdî radibe. Dema ku xanim tê li ba xwendekêr rûdinê, bi rûniştina wê re her xwînerê xort dikeve şûna xwendekêr leheng û dibe lehengekî çîrokê. Navê lehengê "Xwendekêr Xort" bi pûtepedan, jîrî û hostetiyê xurt û mezin hatiye neqandin. Nivîskar di nivîsandina nameyê de bi gotinên "... Ma te nedigot ev jiyana keran e, ez dijim. Ez çêtir dibînim ku bi awayê xwe bijim...", ku bi Kejalê dide gotin, girêk û berberiya hûnakê eşkere dike. Di pey re jî, di berdewama nameyê de, bi gotinên "...Ez çavên xwe li maqûlekî li gorî dilê xwe digêrinim, dibînim û her wiha li ser lingan dostaniya me çêdibe..." kel û tansiyona çîrokê zêde dike û bi van gotinên "...Dû re jî, em ê vê dostaniya xwe xweş bikin, em ê bi hev şa bibin û hew.", ku bi Kejalê dide gotin û bi afirandina nakokî û berberiya di navbera van hevokên Kejalê û nezanîna wê ya nivîsînê de, xwîneran vexwendî dawîya çîrokê dike. Kel û tansiyona çîrokê di çûna xwendekêrê xort a kuçeya Xabûrê, nîmro 8/A'yê de digihîje bilindtirîn asta xwe. Û bi gotinên dilxweşker, ku bi vebûna dêrî re Kejal jî xwendekêrê xort re dibêje, êdî kel û tansiyona rabûyî hew di nava çîrokê de hiltê. Û li vê derê, nivîskar bi venegotina, ka li hundir, di navbera Kejalê û Xwendekêrê Xort de çi diqewime, di serê her xwînerî de bi hezar cureyan dîmen diafirîne. Encama ku ji destpêka çîrokê de ye mîna cihêzê bûkê tê veşartin; û ev encam bi hezaran dîmenên nihênî di serê xwîneran de diafirîne. Û di pey re, bi teknîkeke xurt nivîskar dîmena rijîna nameyê di paş dolabê de dikişîne, di nava nameyan de çavên xwendekêrê xort bi nameya ku wî nivîsandiye dikeve û bi xwendekêrê xort re pêjnek li her xwînerê/a çîrokê radibe; pêxapîn û ketina rîp û xapê!.. Û ev xortxapînokiya xanima Kejal bi vê teknîka xurt a dîmen û sehnekirîna re nerm dibe û bêbandûr dimîne. Û ev dîmena dawî bandûra derba ku çi hevokeke hingivîner nikare bike li ser (her) xwînerî/ê dike û dikeve şûna hevoka hingivîner a çîrokê.

Wekî gotina dawî ez dikarim vê bibêjim, pirtûka *Epîlog* û çîrokên tê de nimûne ne ji dahatûya çîroknûsiya wêjeya kurdî re û bi hêviya xwendina gelek çîrokên ciwan..♦

## du helbest ji

arjen arî

### Mirî Mirî

Min hij te kir

Pirr pirr pirr

Dibû pîrpira çivîkan li her qefesê

Û te li ber firê çavên xwe kil dikir

Reş bûn jixwe

zivir zivir. kevani

reştir dibûn bi kilên suphani

her çiya bi evînekê bi nav dibû

û te di çavên xwe de azadî xwedî dikir

min hij te kir

li dû her koçberiyê pirrtir

û gelectir jixwe ji gel'ekî gelectir

her ku mirina kevokan dihat tu jî dimir

baz xayîn diketin Sarya min

min hij mirina te kir.

### Her êvar

kereng-mast

qelîsêlk

an nan û pîvaz

tasek tasa dewê sar hebe li ber

girara te rijî rijî diçe xwar

birçiyê te me ez birçiyê te

qesta goştê te dikim her êvar.

mexîne ber xwe b'fediyokî

di kerînekan de çavan meke du binefşên stûxwar.

stêlmên hilmbîhok mane

û hê mîrgên çêjê guher û newal...

li ser sifreyê ez û tu li derve bihara har

mebêje mêvan û zêdekarî!

tu bi xwedê kî

jê xweştir, xwe bidî min parî bi parî!..



# Di Felsefeya Xanî De *Evîn*, *Rindî* û *Rindiya Tesewifî*

m. zahir kayan

**E**hmedê Xanî di mesnewiya xwe ya bi navê *Mem û Zînê* de bala me dikişîne ser du evînen ji hev cuda. Ji ber ku Xanî di destpêka vê mesnewiyê de taybetiya van her du evînen ji hev cuda wek mutessewifekî hêzdar nişan kiriye. Şair û mutesewifê giran, di beşa pêşîn a mesnewiyê ya bi navê *Pesnê Xwedê* de, wiha difikire.

*Ey metleê hisnê işqebazî / Mehbûbê heqîqî û mecazî* (rûp. 18)

Di vê beytê de, bîr û baweriyên Xanî yê estetîkî û tesewifî hene. Wisa dixwiye ku Xanî hê di destpêka berhema xwe de xwestiye der heqê *evîna heqîqî û mecazî* de me agahdar bike. Di vê beytê de, rindiya Xwedê derdikeve pêşiya me, ku ev her du evînen ji hev cuda dibin sehne û awêneya rindiya xwedayî. Taybetiya baweriyên Xanî yê der heqê *evîna heqîqî û mecazî* de ew e, ku wî di *Mem û Zîna* xwe de bi tewrekî xurt cî daye her du evînen cihê û ev her du evîn li gorî felsefeya xwe hûnandiye. *Zewqa jiyana guherbar û ya madî (hûjenî)*, nimûneyên erotîzmê û *têkiliyên gerdûnî*, ku giş di rewşeke zahîrî û guherbar de ne, di *têkiliyên Tacdîn û Stiyê* de xwiya dibin. Rewşa *seyr û sulûkiyê*, *jiyana manewî û berdana tiştînen mecazî*, *kuştina nefse û fenebûnê* giş di kesayetî û *têkiliyên Mem û Zînê* de kifş dibin. Ji ber vê, Ehmedê Xanê têgeha *rindiyê* bi van her du evînan ve girêdaye. Xanî bi vê beytê xwestiye ku der barê felsefe û tesewifa xwe de bala me bikişîne ser du xalan, ku ev xal

(rindiya mecazî û rindiya ebedî) di felsefeya wî de ciyekî girîng digirin. Xanî mentiqê rindiyê di nava çalakiyên *seyr û sulûkiyê* de dîtîye û bi devê Mem şiroveya *rindiya ebedî û tesewifî* kiriye.

*Ê çêkiri neynika cemalê / Tîra xwe numa bi zilf û xalê / Fanosê beden kiri mitella / Tê da ji me ra kiri tecella* (rûp. 412)

Di vê şîrê de, Xanî eyan kiriye ku *rindiya ebedî* çêbûn û hebûneke Xwedê ye; ji ber ku Xwedê mirov afirandiye, ev afirandin nimûneyek ji rindiya xwedayî ye, ku wek awêneyekê Xwedê nişan dide. Xwedê bi xwe li ser vê bedenê nexşê xwe (ev nexş bi xal û bisk tê temsîlkirin) û hebûna xwe daye kifşkirin. Bi kurtî jî, divê der barê *rindiya ebedî* de em peyitandinên xwe wiha şirove bikin. *Rindiya ebedî* di tiştên mecazî, madî û guherbar de veşartî ne. Tiştên mecazî cî û warên rindiya ebedî ne. Ji peyitandinên Xanî ev jî derdikeve holê, ku rindiya ebedî *wate, kakil û batiniya* tiştên ku berbiçav in. Xanî gava ku qala *evîna mecazî û evîna heqîqî* dike, dixwaze bala me bikişîne ser vê mijarê. Dema ku Xanî li ser rindiya mecazî radiweste, dîsa peyitandinên dewlemend derdixe pêş û bala me dikişîne ser taybetiya rastiya rindiya mecazî. Xanî wiha difikire:

*Etrab û kewaibêd-i ezra / Mirdan û mirahiqêd-i ziba / Eshabê qumaşê lutfê ruxsar / Erbabê metaê hisnê didar / Wan lêk dikirin metaê yek erz / Texmîn dikirin bi tûlê wel-erz* (rûp. 108)

## REWSEN-NAME

Gava ku em li ser vê mijarê ji radiwestin, em ê bibêjin ku Xanî der barê rindiya mecazî de xwestiye bala me bikîşîne ser tiştên berbiçav û dinyawî, ku ev giş ji hêlekê ve mirovan dixapînin, ji hêlekê ve ji bala mirov dikişînin ser berhem û afirandinên xwedayî. Xanî di vê şîrê de, li ser rindiya ku her kes der heqê wê de gelek tiştan dizane û nirxandinan dike radiweste. Armanca wî ew e ku vê rindiya han şirove bike û bikeve kûraniya vê rindiya mecazî, ku ev rindî dibe pêpelûkeke ji bo rindiya ebedî. Jixwe Xanî gava ku qala rindiya mecazî dike, ew pê bawer e ku ev rindî di *zahirê xwe de xapînok e, di hatinê xwe de rasteqîniyeke xwedayî ye.*

Divê di felsefeya Xanî de mijarên li ser hebûn û baweriya xwedayî tişteki ecêb neyên xwiyanê, ji ber ku Xanî mutesewifekî kurd ê herî bibawerî ye. Giraniya wî bi hin mutesewifên payebilind re wek hev e. Ji hêleke din ve jî, Xanî qala rindiyeke gelekî objektîf û dinyawî kiriye, ku di Mem û Zîna wî de ev tê xwiyanê. Ev jî dide kifşkirin ku Xanî xwedî kesatiyeke gelekî dewlemend e, ku mirov nikare ji bo Xanî ramanê standart derxe holê. Baweriyên Xanî yên der barê *Kurdistanê* de, yên der barê *jiyan û azadbûna gelê kurd* de û ew *xweşikiyên dinyawî*, ew nirxandinên ku der barê *mir* û dewlemendiya wan de dike, giş rindiyên mecazî û objektîf in. Xanî li ser wan bi awayekî gelekî hêzdar radiweste. Divê em Xanî wekî mutesewifekî cihêreng bihesibînin. Ew der barê rindiya mecazî de jî li gorî kevneşopa şîra klasik a faris û ereban difikire. Dîsa pêwîst e em bibînin ku Xanî gava ku pesnê jinan dide, ew qala rindiyeke mecazî dike; lew re ev rindiya mecazî giş li ba Xanî bi tewrekî mistîk jî tê nirxandin.

*Lêvla'l-û semen'unar û gulrux / Rewneq sikenê bi tunê xullux / Zikfeyn-i misalê tayê sinbil / Xeddeyn-i ji rengê ruyê sorgul / Ew sorgul û simbilêd-i azad / Bişkiftî li qeddê serwê şimşad / Sorgul ji xwe de li ser rehîstî / Sinbil bi xwe pêk ve daherîstî / Hisna xetê rux ji xetê yaqût / Çaha ziqenê ji suhrê Harût* (rûp.84, 85, 86)



Ehmedo Xani

Di *mentiqê evîna heqiqî û mecazî* de, zagon, rê û rêçên ji hev cuda hene, ku Xanî dixwaze rastiya van her du evînan derxe holê û di nava mentiqê van her du evînan de xwe bigihîne *rindiya ebedî û ya mecazî*. Mentiqê tesewifê û baweriya rindiya ku Xanî diparêze di van beytan de ye, ku reheke wê digihê hemû têkiliyên jiyanê, ya din digihê jiyan û baweriyeke manewî.

*Hem ehlê nezer nebên ku kurmanc / Işqê nekirin ji bo xwe armanc* (rûp. 59)

*Têk da ne di talib in, ne metlûb / Vêk ra ne mihub in, ne mehbûb / Bêbehre ne ew ji îşqêbazî / Farix ji heqiqî û mecazî* (rûp. 62)

Xanî li pey ramanê girîng ketiye, xwestiye ku di nava kurdan de *rindiya evîna heqiqî û mecazî* bibîne û taybetiyên wê derxe holê. Ji ber ku ew naxwaze mesnewiyeke wek *Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrinê* û hwd., ku zêde di nava çanda kurdî de nînin, bihûne. Ew di jiyana kurdan de li nimûneyeke neteweyî digere. Ji ber vê, Xanî di nava rehên mîtologyayên kurdistanî de bûyera

*Mem û Zînê* derdixe pêş. Der heqê hemû nîfşên rindiyê de. di berhemên xwe de nimûneyan pêşkêşî me dike. Mîrov dikare bibêje, *Mem û Zîna* Xanî serdanpê kana rindiyê ye, ku Xanî ew bi tewrekî *estetîkî, felsefî û tesewîfî* hûnaye. Ehmedê Xanî gava ku li *rindiyê* digere, ew bi *eqil û mentiq* na, lê bi *çavên dil*. bi *mentiqê dil* li rindiyê dimeyizîne. Eyan e ku li ba Ehmedê Xanî *felsefeya dil, mentiq û têgeha baweriyê* ciyekî gelekî mezin digire. Xanî di gelek peyitandinên xwe de cî daye vê babetê, ku *riya rindiyê bi zimane dilin û haweriyê kifş dibe*. Ev xal taybetiya tesewîfa Xanî ye. Li gorî Xanî, *Xweda hezkiriyê dilan e û Xweda ye ku hemû dilan dikîşîne ba xwe*. Ew wiha difikire:

*Mehbûbê qulûbê men lehul qelb / Qelban tu diki bi hat xwe va celb* (rûp. 19)

*Meyla te ye aşiqan dikêşit / Dêrdê te ye dil ji her diêşit* (rûp. 26)

Mîrov ku li ser felsefeya Xanî radiweste, nimûneyên *rindiyê* carinan di nava têkiliyên evîndariyê de derdikevin pêşiya me, carinan jî di wan tiştên ku ji hêla Xwedê ve hatinê afirandin de tîn dîtin. Xanî di *Mem û Zîna* xwe de, exlebî li ser vê babetê radiweste. Gava ku Xanî li ser alema madî radiweste, dibîne ku di vê alemê de her tişt ber bi guhîran û mirinê ve diçe, heya ku ew tê ser vê ramanê ku ev alema han a berbiçav wek *xeyalekî* ye, ku tu carî jê re rastiyeke nîne. Xanî pê bawer e ku, Xweda nebe û *rindî û şemala wî* nebe, tu tiştêk û bûnewerek wê neyê xwiyane. Di ciyekî mesnewiya xwe de, wiha dibêje:

*Zahir kirin ev qedê sanayî / Peyda kirin ev qedê bedayî / Her yek ji edem kirin te peyda / Ibad kirin te bê hevûla / Her yek ji te ra we hûne mezher / Ew reng e di wan tu bûyî muzmer / Bê hisnê te nîne wan wicûdek / Bê nûrê te nîne wan nimûdek* (rûp. 26)

Di sa di heqê *rindiyê* de, li ba Xanî bûjen (made) û giyan (ruh) wekî du tiştên li dijî hev in û zagonên wan jî hev cuda ne. Xanî dibêje, giyan û bûjen bi zora xwestina Xwedê bi hev re ne. Ew difikire ku giyan bi xwe rindî ye, ku tiştên rind pîroz in. Ev pîrozî nebe, hemû bûjenên berbiçav û guherbar xwedî tu dilq û naverokê nabin. Xanî dixwaze bandûra rindiyê li ba nerindiyê bibîne û xwe bigihîne nirxandineke estetîkî. Dibêje,

*"Hemû tiştên berbiçav û razber ji hêla Xwedê ve bi kakilê bûjenê hatine neqşandin. giyan ji pîrozîyê hatine xemilandin."* Li ba Xanî, nirxa bûjenê kêma e. *Pîrozî* jî tirêja rindiyê tê. Ev jî, tê wê wateyê ku, ev alema madî çî qas bi guhîran be û wekî *xeyalekî* be jî, heya ku di xwe de tirêja pîrozî bihewîne, wê her dem tiştêkî wekî berbiçav be û wê nîfşên rindiya ebedî û pîroz biteyisîne. Xanî wiha difikire:

*Eşbeh-i miressm in ji nasût / Erwah-i miwessem in bi lahût / Ev ruh û ceset bi cebr û ikrah / Tezwic-i bûyan bi emrê Ellah / Nasût-i eger çî rengsefal e / Lahût-i ji pertewa cemal e* (rûp. 20)

Di *Mem û Zîna* Xanî de, rola Xwedê di hemû nîfşên bûnewerê de dixwiye û her tişt bi vîna xwedayî jî tunehiyê çêdibe. Gava ku tişt ji hêla Xwedê ve çêdibin, ev tişt di xwe de *ibret û mucizayan* dihewînin û dibin awêne û nîşangeha xwedayî. Her hebûnek di xwe de *tirêja rindiya ebedî* dihewîne. Hukmê rindiya ebedî nebe, ew tiştên ku em bi çavan dibînin û bi guhan dibihîzin tu carî nayêne xwiyane û rastiyeke wan a objektîf çênabe. Xanî gava ku di heqê hebûna xwedayî de peyitandinan dike, ew di nava çend têgehên balkêş de diçe û tê. Ji bo ku ramanên xwe qehîmtir bike, jî *Qur'an û hedîsan*, jî *literetûra tesewîfa sunî û heteredoksî* gelek nimûneyan radixe pêş çavên me. Jixwe baweriyên Xanî bi serdanpê girêdayî vê çarçoveyê ne. Wisa dixwiye ku Xanî li jêr bandûra wan tesewîf û felsefeyan e, ku ji hin hêlan ve digihên **Hallacê Mansûr**, **Bayezîd-î Bestamî**, **Mûhyiddîn İbn-il Erebî**, **Mewlana Celaleddîn-î Rûmî** û êd. Ehmedê Xanî çî qas jî li ser baweriyaya *Wahdet-il Wicûdê* nebe jî, ew di tiştên hatine afirandin de *rindî* û *taybetiya rindiya xwedayî* digere, heya li hin deran mîrov nizane ka gelo Xanî hukmê xwedayî, an Xwedê bi xwe di heyberê û hebûnan de dibîne.

*Genc û tu di nêv tilsimê alem / Kenzê alem / Kenz î tu eyan ji ismê Adem* (rûp. 20)

*Maşûq-i tu yî, bi ferx û nazi / Aşiq tu yî, lêk î bê niyazî* (rûp. 18)

*Ayine te çêkirin mikerer / Hisna xwe di wan te kir missewer* (rûp. 28)

*Hikmet ew e batin û zahir / Qudret ew e xaibî û hazir / Ninin te tecezzî-yî temekun / Ema we di*

## REWSÊN-NAME

wan diki tewetun / Goya hemî cîsmek in tu can î /  
Goya hemî şehrek in tu xan î (rûp. 26)

Xanî tîkiliyeke dewlemend di navbera rindiya ebedî û rindiya mecazî de dibîne. Van her du nirxan bi pisporî bi hev ve girêdide û rastiya wan di jiyane de kifş dike. Ji ber ku Xanî bi van her du nimûneyên rindiyê, dewlemendiya jiyane dinirxîne. Lê rindiya ku madî ye û berbiçav e, Xanî bi şikberî lê temaşe dike, dixwaze ev rindiya han a guherbar a *bidawî* û *bimirin* bibe pêpelûkeke girîng ku mirov bigihê *rindiya ebedî*. Ya ku her tim heye û tu carî mirov nikare wê bi hiş û mentiqê xwe bibîne. Ji ber vê, Xanî hê di serê berhema xwe de bala me dikişîne ser *evîn* û *rindiya mecazî ya guherbar*. Ji ber ku Xanî *Mem û Zina* xwe li ser her du evînan ava kiriye. Di van her du evînen ji hev cuda de, hemû raman, hunermendî û taybetiyên mutesewîfîya Xanî veşartî ne. Jihevvezkirina *Stî û Tacdîn* minakeke berbiçav e, ku Xanî xwestiye girîngiya taybetî û jiyane mecazî derxe pêş. Minakên erotîzma ku Xanî di tîkiliya Tacdîn û Stiyê de dide xwiyakirin bi serê xwe bersivê e, minakeke herî xurt e ji bo evîna mecazî û tîkiliyên madî û dinyawî. *Mem û Zina* Ehmedê Xanî di vê derheqê de, bi nîfşên du evîndaran ve hatiye dagirtin. Di nava daxwazên Xanî de, azadbûna Kurdistanê, yekîtiya gelê kurd, pêdaketina li ser zimên û çandê û tîgihîştina wateya neteweyîtiyê û hwd. Giş xwe noqî nava baweriya Ehmedê Xanî ya ku der heqê evîna mecazî de ye dikan. Gava ku em di *Mem û Zinê* de, beşa *Derdê Me* bixwînin, em ê bibînin ku Xanî ne ku bi tenê xwestiye qala *evîneke heqîqî* û *xwedayî* bike, li ba wî ev cihan çî qas jî şemal û çîrûska nûra xwedayî be jî, ew dîsa tê ser vê ramanê ku divê ev cihan bê qezenckirin. Lew re Xanî di beşa *Rindî û Evîne* de, kifş dike, ku ev her du evîn û rindî jî pêwîst in, çî qas jî ku li ser rindiya ebedî raweste jî, lê ew rindiya mecazî jî girîngtir dibîne.

*Hisna nebitin çû hed û xayet / Nabit jixwe aşiqan nihayet / Lê aşiq û bulhewes cuda ne / Hin*

*faîdexwaz û hin fida ne / Cananteleb in hinek ji bo can / Hin canteleb in ji boyê canan / Hin weslehebîn ji rengê Tacdîn / Hin derdeguzîn weki Mem û Zîn* (rûp. 92)

Dibêje, “Ew rindiya ku tu carî dawiya wê nîne û bêsînor e, dîsa jixwe ji bo vê rindiya han a ku tu carî heweskarên wê kê mabin û dawî li wan evîndarên ku li pey vê rindiyê ketine tu carî nayên.” Lê dîsa, Xanî van nirxandinên xwe digihîne hin encamên girîng. Ew e dibêje, “Tu carî ew kesên evîndar û yê heweskar, an jî “bulhewes” ne wekî hev in. Ew kesên ku “bulhewes” in û li pey nefsa xwe digerin û bi her awayî li pey rindiyên dinyawî ne, cuda ne ji kesên evîndar ên ku dev ji cîhanê berdane û xwe ji dil û can avêtine nava agirê evîndariyê.” Wisa tê xwiyane ku Xanî di van her du evînen ji hev cuda de para *rindiya ebedî* li gorî taybetiyên wan par vedike.

Jixwe ev rewş di hemû mesnewiyên gelan ên Rojhilat de xwe didin der. Ango, li ba Xanî *evîn* û *rindiya mecazî* jî pêwîst e, li gorî mercên xwe xweşiktir e û di jiyana mirovan de rola wê girîng e. Ev bûyer û xal taybetiya baweriyên Xanî yê neteweyî jî derdixe holê. Li ba Ehmedê Xanî, rindiya mecazî serdanpê li hemberî jiyane xwestin û çalakiyeke xurt dixwaze, ji bo vê evîne mantiqeke objektîf pêdivî ye. Lê çî heye ku Xanî di berhemên xwe de di vê derheqê de bi giştî minakên li derveyî vê boçûna me dide, ango em dibînin ku li ba wî, rindiya vê cîhanê tiştek e ku mirov divê jê bikerixe û tu carî pê bawer neke. Ev helwest me dibe ser taybetiya bawerî û jiyana Xanî ya tesewîfî. Ji ber ku Xanî mirovek bûye ku bi sêmpatî li terîqetan nihêriye û ev bûyer jî bûye sedema ku ew bi awayekî kerixî li cîhanê binihêre. Jixwe di berhema xwe de wiha dibêje:

*Em fanî-yû jar û miştexak in*

*Hadî ne tu bî, xwe em helak in* (rûp. 48)

Di vê beytê de, ew hemû tiştên ku dinyawî ne



yek bi yek. bi tewrekî nizm, jar û bênixr dihesibîne. Lê Xanî dîsa li hemberî vê helwesta xwe ya tesewifî helwesteke ji vê cudatir jî derdixê holê, ku ew dixwaze di nava kurdan de *bedewî û xweşikiya her du evînên ji hev cuda* derxe holê. Heya ku Xanî qala jiyân û têkiliyên welatê kurdan dike. ew bi tewrekî objektîf û dinyawî xwe berdide nava etnografya, erdnîgarî û filozofiyê û hwd. Mîrov dikare bibêje, Xanî şaîr û mutesewifekî wisa zanyar û objektîf e, mînakên ku der heqê jiyân û rewşa kurdan de dide, mirov têderdixê ku Xanî pêwîstiyê mezînin dide û cîhanê û çalakîyên mirov ên bi kend û kesp. Xanî li pey çand û hunera kurdî ya neteweyî ketiye, li nîrxên neteweyî geriyaye. bala xwe daye têkiliyên jiyânê ên civakî, cînsî, dînî û felsefeyî, kevneşopî û hwd. Qala **Melayê Cizîrî** dike, qala **Feqîyê Teyran û Eliyê Herîrî** dike, dibêje, “Ev nîrxên herî objektîf in ku rindîya jiyânê ya mecazî bi rasteqînî dixemilînin û li ser vê rindîya ebedî bilind dibê.” Jixwe Xanî eyan dike ku di nava kurdan de jî rindiyên ji hev cuda hene, gelek jî dewlemend in. Xanî bi xwe kifş dike, ku “Kurd hem hez dikin, hem jî têne hezkirin û di nava wan de têkiliya her du evîn û rindiyên ji hev cuda gelekî xurt in.” Di nava beytên Xanî de, ev rewş yek bi yek derdikevin holê. Vêca divê em bibêjin, Xanî bi tewrekî vala li ser *evîna heqîqî û ya mecazî* nesekiniye. Dixwaze em têbigihên ku di van her du evînan de mantiqên du rindiyan hene. Rindîya ebedî (Ev rindî di tesewifa Ehmedê Xanî de hatiye hûnandin.) û rindîya mecazî (Di mesnewiya Xanî de rindîya mecazî di gelek bûyerên *Mem û Zînê* de hatiye ristîn.). Di van her du rindiyan de jî, felsefeya Xanî ya der heqê ya dînî, estetîkî û dinyawî de derdikevin pêşîya mirov. Xanî gava ku pesnê rindîya mecazî dide, dirûvê rindîya ebedî pê dixê. ku ew nebe, rindîya mecazî tu carî dernakeve holê û wateyê wê çênabe.

*Hisnê ruxê wan çu kes nedîbû / Zêra ji cemalê sermedî bû* (rûp. 85)

Xanî di vê beytê de dibêje, “Tu kesî hevalek nedîtibû ji bo rindîya wan. jî ber ku rindîya wan jî rindîya ebedî dihat.” Dixwaze me bibe vê rastîyê, ku di warê rindiyê de *zahir û batin* her dem bi hev re ne. *rindîya zahîrî* (guhêrbar) girêdayî *rindîya batînî* (derûnî) ye. Di navbera van

her du rindiyan de, têkiliyê gelekî xurt heye. Gava ku em li ser beşa *Pesnê Mîrê Botan û Xwîşkêd Wî Stî û Zînê* rawestin, em ê bibînin ku Xanî di vir de li ser rindîya zahîrî û berbiçavî bi tewrekî metafîzîkî rawestiyaye, hemû rindiyên mecazî bi awayekî estetîkî şibandîye sîmbol û hêmayên dînî, xeyalî, wêjeyî û mîtolojîk. Di dîroka tesewifê de, tê zanîn ku ji bilî Xwedê tu tiştêkî din ê rind nîne, ger çî rindîya wan hebe, ev rindî rindiyê guherbar e, di cîyê xwe de bê guhîran nasekine, wekî rindiyê ku rindîya wê di kakilê wê de nebe, ji bo vê Xanî di *Mem û Zîna* xwe de di beşa *Rindî û Evinê* de, gelek nimûneyên berbiçav raxistîye pêşîya me.

*Hidî ku di qeyserê di dinya / Vêk dane Xwedê meta'ikala / Mecmûê xezainêd-i Qeyser / Heta vigî duxmeya Skender / Durrêd-i defainêd-ixaqan / La'la ku di xetema Silêman / Her çendî ziyade têrbûhab in / Bilcîmle bi cuz'ê hisnê nabin* (rûp. 84)

Divê bibêjim ku der barê tesewif, rindî û evîna heqîqî de gilî û gotinên Ehmedê Xanî giş jî peyvên erebî pêk tînin, ev jî li gorî wê demê tiştêkî asayî bû, ku em îro vê helwestê tiştêkî bimetirsî nabînin. Şaîr û mutesewifê giran, di vê şîira xwe de dibêje: “Çî qas rindî, dewlemendî û xweşikiyên ji hêla Xwedê ve ji bo mirov hatine afirandin û mirov xwediyê wan taybetîyan e, heke giş werin ba hev, xwe nagihînin rindîya ebedî; ango li hemberî rindîya ebedî rindîya wan nayê xwiyan, ew tim werin ba hev, nikarin nivê rindîya ebedî bigirin.” Tê xwiyanê ku Xanî bi tenê şaîrekî ku li ser evîne nivîsîbe nîne. Xanî berê pêşîn mutesewifekî payebilind e, ku di jiyana xwe de hukmê vê tesewifê pêk aniye. Ji bo kurdan jî ev pêwîstîr dîtiye. Li ba Xanî, rindîya mecazî hemû nîrxên neteweyî nîşan dide, bi pêwîstiyê mezînin li ser van xalan disekine. Gava ku qala rindî û xweşikiya şîira her sê şaîrên kurd dike, ew bala me dikîşîne ser rindîya mecazî û ya neteweyî. Lê dîsa, Xanî di van her du rindiyan de armançê dibîne, lê ev armanca han li ba hin kesan wekî hev nayêne xwiyanê. Kesên ku têkildarî rindîya mecazî ne, ew evîndarên rindîya cîhanê û xweşikiyên wê ne. Lê nîzanin ku ev evîn û heweskarî jî rindîya Xwedê tê. Ji ber ku di van tiştan de û di van qalibên xapînok de tîrê-



## REWŞEN-NAME

ja rindiya ebedî veşartî ye. Lê kesê ku li rindiya ebedî digere, ew kes gava ku li cihanê mêze bike, di hemû tiştan de dikare rindiya Xwedê bibîne. Jixwe Xanî ji bo dîtina rindiya ebedî, riya *seyr û sulûkiyê, murşîdî û fenabûnê* nîşan dide. Ku em li ser *Mem û Zînê* baponijîn, em ê bibînin ku Mem di vê riyê de ye û ew gihiştîye rindiya ebedî, ku gava rastî Zînê dibe, Zîn ji bo wî dibe neynikeke ku Xwedê nîşan dide. Tesewifa Xanî her gav di vê riyê de dimeşe, lê wisa tê xwiyane ku ev tesewif gelek caran ji nava çarçoveya eqîdeya ehlê sunne de dernakeve. Lê bi rastî mirov dikare bibêje. Xanî di gelek ciyan de ji vî sînorî derbas dibe. li gorî xwe xetêke taybet çêdike. Dibêje: "Her kes li rindiya digere, lê di vê gerê de cudatiyên mezin hene, rê çî dibe bila bibe, "rindî yek e":

*Ger şêx in û ger mela û mîr in / Derwêş û xeni  
û ger feqîr in / Kes nîne ne talibê cemalê / Kes  
nîne ne raxibê wisalê / Hin raxibê  
hisnê layezal in / Hin talibê qalibê  
betal in / Lêkin hemîyan yek e  
yeqîn dost / Ferqa ku heye ji  
mexzê ta post (rûp. 88)*

Vêga em dixwazin ji vir tişteki derxin, ku Xanî di şîrê de bala me dikîşîne ser rindiya ku tu

*curî naqede, rindiya qalibê betal û têkiliya di navbera van her du rindiyan de. Xanî bes li ser van her du rindiyan nasekine, ew dibêje, "rindiya qalibê betal" ku qalib pûç bû, ew rindî xwe digihîne rindiya ebedî. Ji ber vê, Xanî di şîra xwe de ev beyt pêşkêşî me kiriye:*

*Lêkin hemîyan yek e yeqîn dost / Ferqa ku heye ji mexzê ta post (rûp. 88)*

Mantiqê rindiya mecazî, ku Xanî di berhemên xwe de pêk anîye, ne bi tenê li ser şopa edebiyata klasîk e. Xanî li gorî taybetiyekê û li gorî hin merc û pêdivîyan, baweriyêke cihêreng ristiye û di vê der heqê de ew wekî mutesewifekî rohilatî yê mezin e ku ketiye qada dîroka edebiyata gelan. Mirov dikare bibêje, ramanên Xanî yên li ser evîna mecazî ji gelek şaxan tînin û li ba Xanî rindiya mecazî ji van rehan tê:

1-Sîmbol û taybetiyên şîra klasîk

2-Rastî û rasteqîniya jiyanê û ya li derveyî tesewifê. (Ev xal bi xwe di felsefê û nêrinên Xanî

yên siyasî de çî digirin. Xanî di vî warî de gelekî realist e, ku bi pûtepêdan û bi awayekî objektîf li ser rastiya civakê û jiyanê disekine, der barê jiyan û hebûnê de gelek agahiyên dîrokî û zanyarî derdixe pêşîya me.)

3-Baweriyên Xanî yên li ser tesewifê, ku ev tesewif carinan xwe digihîne *Wehdet-il Wicûdê*, carinan xwe digihîne pêkanînen tesewifên *ehlê sunneyên wekî Nexşebendî, Qadirî û Mewlewîyan*. Di *Mem û Zînê* de, ji bo van nimûneyan gelek beytên giranbiha hene.

4-Bawerî û ramanên Xanî yên li ser mîtoloji û efsaneyên kurdan, rastiyan li ser jiyana kurdan, bandûr û ponijanên li ser folklorê kurdî û exlebî jî bandûra dengbêjan.

5-Bi ya min, Xanî rehên felsefeya xwe û çavkaniyên bawerîya rindî û evîna mecazî û ya ebedî, ji dîroka tesewifan hilçiniye û exlebî jî bi tewrekî tund guhê xwe daye gotinên

mutesewifên wekî **Muhyîddîn Îbn-î Erebi, Mewlana Celaleddîn, Îmamê Xezalî** û hwd.

Ehmedê Xanî di *Mem û Zînê* de kesên aşîq û kesên ku ne aşîq in ji hev cuda kiriye. Ango dibêje, *Lê aşîq û bulhewes cuda ne / Hin faîdexwaz û hin fîda ne.* (r. 92) Xanî di vê beytê de sînorên her du evînan û rindiyan diyar dike. Dibêje: "Kesên ku di nava helwest û xwestineke mecazî de ne, ew *bulhewes in*, angu xwedî xwestekên objektîf û zahîrî ne. Ew kes dixwazin ji bo van xwestekên xwe li pey xweşîkiyên ku heqîqî nînin herin, ji ber vê ew kes ne aşîq in, lê daxwazker in û ne cefakar in." Ku em hevgihiştina Tacdîn û Stiyê bi bîr bînin, em ê bibînin ku ev hevgihiştin serdanpê nîfş û mînakên bulhewesiyê ne. Xwestin û daxwazên mecazî ne, xwestina *qalibê vala ye*, ku ev qalib wek xweşîkî tê xwiyane. Ango, Xanî di vê beytê de dixwaze sînorên evîna mecazî dayne û vê evîne şîrove bike da ku ji evîna heqîqî bîqetîne. Li gorî Ehmedê Xanî, ji van her du

aşiqan yek aşiqê mecazî ye, dixwaze ji evîn û cihanê sûde wergire, xwe bigihîne xweşikiya berbimirinî û zahirî, yê din (aşiqê heqîqî) jî dixwaze ji bo evîna xwe xwe feda bike. "Fedakirin di tesewif û estetîka bawerî û zanîna Xanî de ciyekî girîng distîne, ku *Mem û Zîn* bi tenê ji bo vê tijî minak in. "Feda û rastiya fedabûnê hêza rastiya "ronakbîrî û mutesewifiya" Xanî ye. Ew ji bo welatekî azad jî hukmê "fedabûnê" dixwaze, ji bo azadiyê şer dixwaze. Xanî di beyteke xwe de wiha dibêje: *Bê ceng û cîdal û hê tehwir / Qet vê şixulê mekin tesewwir* (rûp. 354) Lê di vê bendê de, em dixwazin baweriyên Xanî yên der heqê *evîna mecazî û ya heqîqî* de derxin holê. Ji ber vê yekê, wateya fedabûnê di nava çalakiyên tesewifê de ciyekî taybet digire. Jixwe em jî dixwazin balê bikişînin ser vê û bi vê yekê jî, rola *rindiya ebedî û mecazî* diyar bikin. Li gorî Ehmedê Xanî, Mem fedakar e, ji ber ku armanca Mem ev cihan û xwestinên mecazî (li gorî estetîka tesewifê) nînin. Mem wekî aşiqekî, wekî mirîdekî, wekî kesekî ku gihîştibe mertebeya mirşidî û mitesewifiyê. Di qatê Xanî de, Mem ew kes e, ku gihîştîye hukmê fenabûnê. (*Fenabûn* ew e ku ew kesê têkiliya xwe ji tiştên dinyawî qetandîye û ji her hêlê ve di hêz û tîrêja Xwedê de mehikiye.) Vêca Xanî di vê û van beytan de, Mem wekî aşiqekî, Tacdîn wekî daxwazkar û dilxwazekî dihesibîne. Yek fedakar e, yek daxwazkar e, bigihîştin e. Yek sîmbola vê cihanê ye, yek sîmbola jiyana xwedayî û ebedî ye. Yek di xwe de hemû taybetiyên cihanê dihewîne, yek di xwe de terkedinyayî, devjêberdana hemû xwestekên mirovî û cînsî dihewîne. Di vê der heqê de, Xanî di rastiya Mem de xwestiye rê û rêça mitesewifiyê, seyr û sulûkiyê (Ji hêleke din ve mirov lê mêze bike, wê bê dîtî ku Xanî sîmbola Mem bi awayekî neteweyî jî nirxandîye, wekî ku mirov tama welatparêziyêke cihêreng di kesayetiya Mem de dibîne. Ji ber ku çarenûsa Mem carinan dişibe çarenûsa gelê kurd. Ev rewş di berhemên Xanî de ew qas eyan nebin jî, mirov têdigihê ku Mem ji hêlekê ve sîmbola gelê kurd e jî. Ango dibe ku em vê nirxandinê li gorî bîr û baweriyên xwe jî dikin.) û rîya fenabûn û cefayê nişan bide. Xanî di kesayetiya xwe de jî xwedan terîqet û xwedan seyr û sulûk e. Niha

Xanî ji bo Mem minakên fedabûn û cefayê di berhema xwe de, di gelek ciyan de hûnaye:

*Havêtine çalek bi zarî / Teşbihê gorê bi reng û tarî / Mektûh e wekî dehanê ejder / Menkûr e wekî nerkîr û munkîr / Rûniştin di wê ve abidan e / Zîndan li wî bûye çillexan e* (rûp. 336) *Sofi ku gihîşte kuncê xelwetê / Şêxîni giha meqamê wahdet / Geh şibhetê aşiqan bi dilxwaz / Geh şibhetê abidan bi daxwaz / Her lehze di gel kelagirîne / Ev reng e he wî digote Zînê* (rûp. 336)

Ku mirov baş têbigihê, wê bibîne ku Xanî di her misreyeke mesnewiya xwe de xwestiye wateya tesewif, wêje û gotinên estetîkî û felsefeyî bi tewrekî dewlemend li dar bixe. Felsefeya Xanî di nava çarçoveya *kelama sunî, mitesewifiya sunî û baweriyên heteredoksî* (baweriyên li derveyî gotinên "ehlê sunne") de ye. Xanî mertebeya *aşiqî, abidî û murşidîyê* di Mem de dibîne. Lê Xanî di beytên xwe de rastiyeke din jî derdixe holê, ew jî ev e. "Aşiq bi dilê xwe dixwazin, gava ku bi mantiqê dil xwestin çêbû ev helwest aşiq derdixe radeya abidî û murşidîyê." Xwiya ye murşidî li ba Xanî payeyeke bilind e, ku ji rîya aşiqiyê çêdibe. Aşiqî jî, ew e ku mirov xwe bi fedayî, bi bawerî, bi cefayî ber bi rindiya ebedî ve bikişîne. Rindiya ebedî mantiqa evîna heqîqî ye, ku ew jî di kesayetiya Mem de civiyaye. Bi tenê ev hêma jî rastiya *Mem û Zînê* dernaxe holê, her wekî Xanî di *Mem û Zînê* de hezkirina welatekî jî derxistiye pêş çavan. Divê ev jî bê dîtî. Disa, mirov dikare ji bo wan beytên li jorê bibêje, ku Xanî bingeha sofitî û murşidîyêke payebilind jî davêje. Vêga ku em bizivirin li ser mijara xwe, armanca me ew bû, ku em felsefeya Xanî ya li ser tesewifê bizanibin. Bi giştî nebe jî, ev her du xal wê me bibin ser taybetiya felsefeya Xanî ya der heqê *evîn, rindî û rindiya tesewifî*. Ji ber ku Ehmedê Xanî mutesewifekî ku bi giştî di çarçoveya *eqîdeya ehlê sune* de ye û di wê rêçê de difikire. Gava ku mirov li taybetiya baweriyên wî mêze dike, têdigihê ku Xanî gelek caran ji nava vê çarçoveyê derketiye û xwe xistiye nava dewlemendiya hemû jiyana û çanda neteweyî♦

## Sê Hêvî û Du Têkçûn

Şevîn Gulşenî

Êvar bûye mifteh  
Û vedike qufla tirsên sê rojan  
Xwîna ku  
Di boxçika dil de zuha bûye!  
Tu yê kingê bibî hubr  
Û binivîsînî bi dizîka  
Hestên eciqî  
-ên bi temenê xwe dilbikul-  
Dixwazî bi eşkeryî xêz bike!  
Gelo tu çawa afirîyî  
Ji destê ins an cinan  
An jî ji destên tilîweşiyayîyan  
Nizanim qet nizanim...  
Tiştê ku dizanim  
Bi tenê destmalek hatiye vereşandin  
Herî zêde û heta dawî  
Bi zayîna te ve  
Ev destmal jî bihevşabûna evîndaran  
-ewên ku bi tenê di xewnan de digihîjin hev-  
hatiye hûnandin  
Ger jî nû ve binî bê danîn  
Wê qewlîkirinên min  
Ji xwe bibizdin  
Lê tu ji deşîfrebûnê ditirsî  
Û dewa veşartina xwe li min dikî  
Te xatir xwest û herikiyî  
Nava golên dil

-ku bi reng hûn dişibin hev-  
Hêviya duyemîn  
Diranên ku ji bêcixaretiyê  
Ketine greva birçîbûnê  
De ka rabin çalakiya xwe xurttir bikin  
Û bigerin li ser bedena şilfitazî  
Zû bi zû  
Hê ku lêvên heywanî  
Baznedane li ser çermê çilmisî  
Û nefetisandine  
Şûna hembêzkirinên paqij  
De bi têra dilê xwe vereşin  
Hêmayên şahidî dorhêlê  
Çawa be wê serî bên hilqetandin  
Di devê tacîzkirinê  
Talî ji qelsiyê we jî  
Ez tenê hiştim  
Û têkçûn bû dudu  
Du niqut xwîna bêguneh  
Hêviya herî dawîn  
Bi bertîlîkirinê nexapî ha!  
Bejna xwe biparêze  
Wê ji te re bibêjin belbî  
Tu jî qîzaniyê ketiyî  
Lê wê ji êvarê re bibêjin  
Te bi xwe welidand  
Hubra sor...

# Dildar

## (1918 - 1948)

feqî huseyn

**N**avê vî zatî yê rasteqîn **Yûnis Raûf e. Dildar** nasnavê wî ye. Ji aliyê kesan ve ev zat piranî bi vî nasnavî tê nasîn. Bi xwe jî, mexlesa **Dildar** bi kar dianî. Em ê jî, di vê nivîsê de bi vî nasnavî vî zatî bidin nasîn. Jixwe ev nasnav wisa lê hatiye ku çareya ji hevdu cudakirina goşt û neynûk nemaye. Wî jî, mîna piraniya nivîskar, lêgerîner, dahûrfîner û helbestkarên kurdan bi nasnavêkî ve xwe daye nasîn.

Rewşenbîrê mezin Dildar, di 20'ê avrêla 1918'an de, li bajarê Koysancaqê ji dayik bûye. Navê bavê wî **Mihemed e. Mihemed** kurê **Mele Seîd e. Ji malbata wan re Malbata Xadil Secdîn** digotin û bavê wî karmendekî biçûk bû. Navê dayika wî **Zelwe** bû û Zelwe keça **Xorşîd Efendî** bû. Malbata dayika wî ilimzade ne û ji Zehawayê hatine li rex Koyê cîwar bûne. Heta **Hecî Qadirê Koyiyê** binavbang jî ji wê malbatê ye. Bi kurtî, melatî ji aliyê dê û bavê ve digihîje vê malbatê.

Dildar zarokatiya xwe li bajarê Koysancaqê derbas dîke. Bi hewa, hêlim û ava wê derê ve mezin dibe. Di temenê xwendinê de, derbasî Ranyayê dibe û li wir dibistana seretayî dixwîne. Ji bo xwendina dibistana navîn diçe bajarê Hewlêrê û li wir dibistana navîn û lîseyê kuta dîke. Ji bo xwendina bilind di sala 1935'an de diçe Bexdayê. Li wir, qeyda xwe li Zankoya Bexdayê, di Fakûlteya Dadê de çêdike û dest bi xwendina dadê dîke. Tam di dema xwe de fakûlteyê kuta dîke û dibe parêzerekî qenc. Berê

bi awayekî neşandilxwazî dozan digire, lê piştî ku bi şerpezetiya xizanan dihişe, dozên wan bi kêfxweşî hildide ser milê xwe. Li Bexdayê, dest bi nivîsandina helbestan dîke. Pexşan û helbestên xwe di kovara *Gelawêjê* de diweşîne. Li vir, dixwazim helbesteke wî pêşkêşî we bikim.

*Şi'rê, hemû germa laşê min mişt,  
Berê min li firmêsk û hêsirên çavan e  
Û ez bedena xwe bi ava baranê dişom,  
Yan jî, di ciyê şêrîniya jiyandê de  
Ez talîtiya feqîrî û nedariyê dikişînim*

Dildar yek ji wan kesên wêjevan, rêzan, nivîskar, rêber û helbestkarên navdar ên Kurdistanê Başûr e. Vî zatî gelek berhem afirandine. Sirûda Neteweyî Ya Kurd *Ey Reqîb* jî, yek ji wan berheman e. Ev sirûd ji aliyê kurdan ve ji roja damezirandina Komara Mehabadê bigirin heya dawiya vê komarê hate xwendin. Ev sirûd bi zaravayê kurmançiya jêrîn hatiye nivîsîn, lê wergera wê ya kurmançiya jorîn jî hatiye kirin. Îro bi her du zaravayan jî tê xwendin. Em ê li vir, wê bi her du zaravayan pêşkêşî we bikin.

### Ey Reqîb

*Ey reqîb her mawe qewmî kurd zeman  
Nay şikênê daney topî zeman  
Kes nelê kurd mirduwe, kurd zinduwe  
Zinduwe qet nanewê alakeman*

## REWSÊN-NAME

*Lawî kurd hesta ye ser pê wek dilêr  
Ta be xûn nexşî deka taci jîyan  
Kes nelê kurd mirduwe, kurd zinduwe  
Zinduwe qet nanewê alakeman*

*Ême roley Midya w Keyxusrew in  
Dînman e, ayînman e Kurdistan  
Kes nelê kurd mirduwe, kurd zinduwe  
Zinduwe qet nanewê alakeman*

*Ême roley rengî sûr û sorîş in  
Seyrî ke xûnawîya rabirdûman  
Kes nelê kurd mirduwe, kurd zinduwe  
Zinduwe qet nanewê alakeman*

*Lawî kurdî hazir û amade ye  
Gîyanfîda ne, gîyanfîda gîyanfîda ne  
Kes nelê kurd mirduwe, kurd zinduwe  
Zinduwe qet nanewê alakeman*

\*\*\*

### **Ey Reqîb**

*Ey reqîb her maye qewmê kurd zeman  
Naşikê û danayê topê zeman  
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin  
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Em xortên Medya û Keyxusrew in  
Seyr hîke xwîna diyan me darijand  
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin  
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Em xortên rengê sor û şoreş in  
Ta hi xwîn nexşin bikin taca cîhan  
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin  
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Lawên kurd rahûne ser xwe wek şêran  
Dîn iman û ayînman kurd û Kurdistan  
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin  
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Lawên kurd tev hazir û amade ne  
Canfîda ne canfîda tev canfîda  
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin  
Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*



Nivîskarê sirûda neteweyî ya kurdî  
*Ey Reqîbê Dildar*  
(1918 - 1948)

Dildar bi zaravayê kurmanciya jorîn û kurmanciya jêrîn dizanibû û bi wan her du zaravayan jî dikaribû helbest û pexşan binivîsanda. Bi zimanê tirkî, farisî, erebî, fransîzî, îngilîzî û yewnanî jî dizanibû. Wêjeya wan welatan bala wî gelekî dikişand û xwe li ser xebata wêjeyî zêdetir sor dikir. Dixwest wêjeya kurdî jî bilind bibe û bigihîje wêjeya welatên pêşveçûyî.

Dildar ew qas riste û helbestên tekûz dinivîsand ku di devê dengbêjan de bi salan diman û di civat û diwanên kurdan de bi sêwirandina dengê xwe dixwendin. Sirûdên ku wî li dar dixist dibûn sirûdên neteweyî û van sirûdan bi salan hêjatiyên xwe wînda nedikirin. Di gel van qabiliyetên xwe, dîsa jî digot, "Wêje bi lawje, laje, stran, riste û helbestan bi tenê nayê holê."



Ç'irok, kurteç'irok, metelok, fiqre, pend, gotinên hedew û roman ji şaxên wêjeyê ne." Wêjezanê me ev dîtin di peyivîna de nehiştiye, di heman demê de jî bi cî aniyê. Di wan hemû şaxên wêjeyî de, berhemên wî zafî hene û hem jî pir in. Niha dixwazim li vir nameya vî zafî, ku ji biraziya xwe Nesrînê re şandiye, pêşkêşî xwendevanên xwe bikim. Wî ev name her çî qas jî biraziya xwe re şandibe jî, wate û şîretên wê nameyê jî hemû keçên kurdan re ne. Jixwe ew jî, di nameyê de dabaşa vê gotinê bi rewşeke vekirî dîke. Ji ber vê yekê dixwazim ku keçên me hemû vê nameya hêja bi bêhneke fireh bixwînin û wan şîretan têxin serê xwe û pêkbinin. Name ev e:

"Biraziya min Nesrîn.

Dema ku ez nêzikî te bûm, tiştên ku min nikaribû ji te re bibêjim ez ê niha ji bo te binivîsim. Ez dizanim wan tiştên ji bo te dinivîsim wê di nava me de biminin. Ez niha ji te dûr im. Nameya ku min ji te re şandiye ne bi tenê ji bo te ye, ji bo hemû keçên kurdên di temenên te de ye.

Tu dema biçûk bûyî, dergûşa şêrîn bûyî. Çavên te yên wekî kestaneyê, her dem ronahî ji wan dibarî. Hêvî û şênayî dida jiyana me. Di her kenê te de, lêvên te dibûn wek sêvên sor, her gav kenên te yên dergûşî jiyana me geş dikir. Em her dem tevî te dikiyan, lê ew awazên te, ew awazên qedim, em didan kenandin û dawî dida xemgîniya dilê me. Şênayîya te em dilşa dikirin. Keder û hirina dil dikewand. Ji bo diya te demên şahî bûn. Wekî mizgîniyek be û ji bo me, wekî ala dilşahiye bû. Di dema xemgîniya te de, çavên te bi xemgîni digiriyan. Hêsrên te yên germ wekî morikan ji çavên te dihatin xwarê û wekî ava haranê diherikin. Gelo tu xwediyê kijan wêneyê bûyî? Tu dizanî dema ku çirûska hêviya çik û tenê bûyî, zarokeke bi tenê bûyî, tu dizanî çawa me guh dida te. Ez hêvî dikim her dem ew pîrsa hanê tu yê jî ji xwe bipirsi.

Tu keça min a yekemîn bûyî, zaroka yekemîn, kulilka yekemîn, dê û bavê te wekî pinpinikan li dora te dizivîrin. Ku çî bibûya, her gav tu bi her du destan dihatî hembêzkirin. Di sermayê de, ji te re dibûn lihêf û wan tu germ dikirî. Dema ku çaviya odeya te sar dibû, wan germ dikir; dema ku germ dibû, ser te vedikirin û ji te re dibûn hawêşin. Dema ku tu nexweş diketî, heta sibehê li

ser te nobedarî dikirin. Dema ku canê te diêşiya, êşa te dikete can û dilê wan. Ji bo ku te bi perwerdehiyê baş mezin bikin, ji hemû elem û xeman re amade bûn. Dema ku tu mezin bûyî û tu baş têgihîştî û dema ku te xwe baş nas kir, vê nameya min bigire here ber neynika mala xwe rûnê, gelo tu yê bikaribî di neynikê de xwe baş bibîni?

Êdî tu pir mezin bûyî, bejna te ya zirav û dirêj. Bedena te gihîştîye û êdî tu gihîştîyî kamiliyê, ber bi mezinbûna xweşikbûnê ve diçî, ber bi azadiyê, xweşikbûna ahengiya jiyana lihevkerinê ve dimeşî.

Duh tu pir biçûk bûyî, wekî min ji te re got: ji parastina te û ji bo ku te baş mezin bikin, dê û bavê te, çî ji destê wan hat, ji bo te teksîr nekirin. Her tişt ji bo te kirin. Ango, tu mezin bûyî, pêwîst e te çawa bikaribûya xwe ji wan metirsiyan biparasta? Pêwîst e tu hatina xwe bikaribî biparêzî. Dema ku tu biçûk bûyî, ew karê hanê dê û bavê te dikir. Vêga tu mezin bûyî, pêwîst e tu bi xwe bikaribî ji wan metirsiyan xwe biparêzî.

Gelo tu dikarî vê berpîrsiyariya hanê binî cî. Lê vê berpîrsiyariya hanê, xeynî te çî mirovek nikare bîne cî. Ango, dizanim tu nameya min bi awayekî ecêbmayî dixwîni. An jî, çavên xwe ber bi esmên berjor dikî û dipirsi, gelo kijan parastin û xwe ji kê biparêzim? Ez naxwazim te li hemberî sermayê biparêzim, ne jî li hemberî germê, qileriyê, nexweşiyê û ne jî xemgîni û ji kederê biparêzim. Na, wan parastinên hanê, ku ez behs dikim, dê bikaribî bi xwe xwe ji wan tiştan biparêzî. Ez zêdetir dixwazim behs ji parastina ramanî bikim. Mêjiyê te ji ramanên bedxû û dilê te ji tiştên nepak biparêzim. Min dixwest behsa wan parastinan ji bo te bikim. Ez dixwazim tişteki ji bo te bibêjim, bi vê nameya min ketina te ya di deriyê cihana materyalî re jî dest pê dîke. Di vê cihanê de, mirov dikare gelek tiştên curbecur bi çavên xwe bibîne. Mirov bi çavên xwe dibîne û bi destên xwe dipelîkîne. Bi wî awayî, perdeyên şik û gumanan diçirîne û her tişt dibe rastiya jiyane. Kulilkên di nava baxçeyan de vedikin, şênahiya xwezayê û morikên biharê bi çavên xwe dibîne. Di mehên zivistanê de, li ber kozika êgir, ronahiya berfê, dengê avê, şewqa heyvê, tîna bê, dengê bilbilan, rengê esmanan, bayê berbanga sibehê, ronahiya stêrkan, tîrêja rojê, tariya şevê,

## REWŞEN-NAME

kişandina wêneyekî xema melodiya awaza muzikê. tama naskirina welatperweriyê, ji derveyê girêdana bireseran û xwe bi kêfxweşiyê ve girêde. Tiştên ku min yek û yek ji bo te jimartin wê gazî te bikin. Bi wî awayî tu dikarî hebûna tiştan fêhm bikî. Ber bi wan ve biçî û xwe hinî hebûna wan bikî. Ji bir meke ku ew hebûna çavkaniya rastiye û xwenaskirinê ne û bi van tu dikarî rastiye di wan de bibînî. Ew ramanên hanê hebûna serbilindiyê ne. Gelek tişt ber bi hilweşandinê ve diçin. xerabûn û nexwezayîtiyê. Ew ê te ber bi geliyên elem û xemginiyê ve bibe. Ji ber ku jinek di nava civaku me ya bêmedeniyet, di nava wê de, keçên ciwan, bi adetê hêsan ve bi zincîrkî hatine girêdan. Keçik wekî lawikan, law wekî keçikan li rastiye nagerin. Ji ber vê yekê pêwîst e tu zêdetir baldar bî û ji dora xwe haydar bî û her gaveke ku tu diavêjî pêwîst e bibe pîvan. Bibexişîne Nesrîn, bi xweşkbûna mirovekî nexape, hela bi rûkeniya xortan qet nexape. Peyvên wan ên beredayî û çîrokên wan ên badilhewa. Qet guh medê û bi wan qet nexape û guh mede wan peyvên vala. Teqlida maqyajan meke û bila dilê te neavêje kincên hinek xwişkên te yên ku li xwe dikin. Ew tiştên ku hemû min ji bo te jimart ji bo jinên sivik in. Lê tiştê ku ez dixwazim ji bo te bibêjim, ku tu bikaribî, dilşahiya mirovan û nermbûnekê ji bo mirovan biafirîne. Lê bi taybetî, dilşadî ne mirîneke vala ye û ne ji kenekî xemgîn e. Pêwîst e tu wî tiştî baş bizanibî; te di nava gelekî derengxistî û paşxistî de çavên xwe li cîhanê vekir. Tu di nava wî gelî de dijî. Sibehê tu yê bibî xwediyê zarokên xemgîn û bêkêf, an jî tu yê bibî xwediyê zarokeke baş perwerdebûyî? Bê guman dayikbûn jiyana heviya gelekî ye û welatekî ye. Ango dest pê bike, bêhna ava kulîlkan li xwe bide, ji bo ku tu bikaribî fêkiyên baş û qedîm ji xwe re hilgirî. Keça min, pêwîstiya welêt bi te heye, pêwîstiya welêt bi dayikên ku bikaribin zarokên baş xwedî û perwerde bikin heye. Ji bo vê yekê, tiştên ku ez dixwazim ji bo te bibêjim, dixwazim rasterê ji te re bibêjim. "Hatina Nesrînê ya dinyayê têkoşînek e ji bo hebûnê, mirov belaseheb nayê riwê dinyayê." Va ye, ez te datînim ser riwên hebûnê. Ji wan her yek ji te re dibe riya rûmet, dilşahi û şenahiyên dinyayê, ji bo ketina riyan te bi tena serê te dihêlim û pêwîst e tu bi

xwe hîlbijartina xwe bikî. Ez te bi serê te bihêlim, tu bi xwe hîlbijartina xwe bikî. Tu ji wan daxwazan kijanê hîlbijêrî, ew dibe daxwaziya te, serbilindiya te.

Apê te"

Dildar gelek helbest û kurteçîrok jî nivîsandine. Ji wan beşek di *Gelawêjê* de hatine weşandin. Mixabin giraniya berhemên wî neweşandî mane. Ev hozan û wêjevanê hêja di temenekî pir xort de, ku dikaribû gelek berhem ji gelê xwe re bihişt, cîhana xwe guhertiye. Lew re hê di 30 saliya xwe de, di 12'ê kewçêra 1948'î de koça dawî dike. Bedena wî ji nava me derdikeve, lê gîyanê wî bi me re ye. Ji bo bîranînê, dixwazim helbesteke wî pêşkêşî we bikim.

### Kurdistan

*Kurdistana xweş, niştimana ciwan  
Qiblegaha min bê guman*

*Çavên min bişkiwîn li çiyayên te  
Bûne inî jiyîna baxên te  
Dengê şimşala şivanên te  
Zirqî û baqî ciwana te  
Qaspa kewê li pala te  
Xulîna avên newalên te*

*Ev hemû di guhê min de ne  
Girtiyê evîna şêrê dîla me*

*Nû nemamek bûm, li vê axê gihîştim  
Bi xoşewîstî min welatê xwe av dida  
Belê, Kurdistan, te ez xuliqandim  
Te ez xuliqandim, te jîn da min*

*Xweşjîna min xweşjîna te ye  
Êşa jîna min roja şîna te ye*

*Çimkî Kurdistan, niştimana ciwan  
Tu qiblegaha dil î bê guman*

## beybûnên bêjî

rodî zerya

ey berbeyanên derewîn  
bila lêvên me negihabin lêvên qîzên xama  
û şevên serxweş bi me karibin  
bila ronî û diwarojên me bûbin sergoya reşetariyan  
û bila wext henekê xwe bi me bike  
ne xem e

wexta me mîna zarokan hêviyên we di xewnhêlanên xwe de dilorandin  
dilên we yên i'tim pêl me kirin û em pelçiqandin  
wexta em ji bo we dihatin kuştin  
we hemû deriyên xwe heta roja qiyametê ji me re girtin  
ne xem e

em di hevşahiya qeder û qesîdeyên xwe de gemarî bûbûn  
me kefenên gewrîboz ji nifirên we ji xezebên we fesilandin  
bo bajarên roj bi roj dîn dibin  
bi xwe dikevin  
xwîna xwe vedixwin  
ne xem e

em ê li hev mikur bân êdî welato  
tu bê pîrik za  
li ber rûreşiya piçika pozê vê dîrokê  
ebeden gunehê xwe bi xwe neyne  
çermê çîrokên te gurandin ji gumikan heta paşsiqulîlka te  
rojê fatîheyek xwendin li ser kolaneke te  
tu bû seyda çeqelîkê çeqelan  
lê kes bêguneh nîn e welato  
tu çû  
efsûna bîranînên te ku wextekê bi sedan sedsal xwarin ji hoîê rabû  
dilîrîne berbû pistepista bêjyên te li dû  
ne xem e welato ne xem e

bêjî:  
tajiyên ji bê bezatir her du guliyên xewna me bi ser mêraniya me de jêkirin  
mizgînxêrkên biharên me bûbûn dermale ji mêj ve  
bedenên me û dansa stêrkên xezebê muptela ne ji hev re  
li dû çûyîna te welato  
hûrhûrî kirin hemû nasnavên me  
eşkere eşkere  
gunehkariyên te ewilî em fêrî firîne dawiyê em hînî mirîne kirin  
keç û lawên te bi kevjalan re birîn mahrên xwe  
bûn dostikên beqan  
req bi dû wan ketin  
li ser golzeryayên te welato ev nivîsîbûn bi zewacên xwe:  
"aş êdî nagere bêyî xwîna qeraş"  
fêr bûbûn welato bêjyên te  
dîreqisîn  
di şikeftên şikestî de diqefilîn  
dîreqisîh  
wext ji bo wan toltajyeke gumre  
û nimêjên xwe kirin kevirê sebrê ji kurmên eyûb re  
welato bahoz in sêwiyên te  
barê wan baran  
êdî ji bo wan xem xem e  
xem xem e xweş xem e

Ev hevpeyvîn li gel Jean Paul Sartre piştî civîna **Dadgeha Russellê** hatiye kirin. Ev civîn li ser komkujîya ku Emerîkayê li Wîetnamê kiribû hatibû lidarxistin. Sartre, berî niha bi dehan salan, li ser cendirmetiya Emerîkayê wisa peyiviye. Êdî sazûmana ku hêza mezin Emerîka li ser hemû dinyayê ferz dike gelekî eşkere ye. Êrişa 11 Rezberê dûman bi ser dinyayê xist û Emerîka di nava vê xumamiyê de dinya kir pêgeha xwe...

Me ev nivîs wergerand, da ku careke din em bînin bira xwe bê ka kî bi rastî qesas û mêrkuj e, kî azadixwaz e!

**-Civîna pêşîn a "Dadgeha Russell"ê li ser şert û mercên êrişa Emerîka û azîneyên ser ên hêzên Dewletên Yekbûyî sekînbû. Ez dixwazim ji we, beriya civîna duyem, hûn tiştên çawa hîn bûn, bipîrsin.**

**SARTRE-** Em hîni gelek tiştan bûn, lê ya herî girîng, me fêm kir. Me fêm kir ku şerekî ji vî durûtir, jê kêmduristir tuneye. Raya giştî ya dinyayê li ser tu şeran ew qasî baş nehat agahdarkirin. Lê ji wateya xwe ya rastîn jî ew qasî dîr nehat hiştin.

Li Kopenhagê, tişteki gelekî cidî qewimî. Hîn di destpêkê de, me dizanibû ku em ê li gelemşeya "génocide"ê rast werin, û ji roja pêşîn ve em li ser vê yekê sekînin. Lê divê ez vê jî beyan bikim, wê peyvê hema hema em hemû aciz dikirin. Bi wateya girseyî, ango gava ku bi wateya "tunekirina gelekî" tê nixandîn, têgiheke gelekî xumamî ye ev û reng e bê gotin, her mirovahî hebûye, "génocide" jî hebûye. Bi wateya hiqûqî, di navbera her du şerên dinyayê de, têgiheke ji aliyê Lemkin ve hatiye bilêvkirin; qala bi carekê ve tunekirina hin gelan dike; û ji aliyê komcivîneke navneteweyî ve, ji bo qirkirinên wekî ku çawa Hitler cihû qir kirine, di sêrî de mehkûm bikin, encax di sala 1948'an de kete ferhengê hiqûqê.

Heta ez jî, difikirim, gelo di mijara Wîetnamê de bi rastî jî fêdeya bikaranîna vê peyva gir heye, an tuneye. Ji bo çî ew qasî zêde pê de dihat çûyîn? Ne bes bû gelo şikenceya emrîkanan, ku li mirovan kirine, şinahiya ku ji kokê ve rakirine, malbat ji hev belav kirine û hîn gelek tawanên şer

ku kirine derketa holê? -Û me bi hêsanî dikaribû ev yek bikira. Hin hevalan ji Parîsê tîlefûn dikirin: "Yeçîn hûn biryara génocidê nagirin. Ew qas wê zêde çêbibe." digotin.

Piştî ku îfadeyên kesên ku dîtine li ber me kom bûn û me rûyê rasteçîn ê şer dît -ji ber ku, ligel her tiştî, em hîni gelek tiştî bûn di vê civîna dawî de- ji bo ku em bikaribin tiştên ku li Wîetnamê qewimîne şirove bikin, me fêm kir ku di destê me de -kêm an zêde- ji têgiha "génocide"ê û pê ve tişteke tuneye. Heta ku yên di sêrî de gelekî bêbiryar bûn jî, dû re, bi qasî yên din baweriya xwe bi vê yekê anîn.

**-Ciyawaziyeke raser di navbera tiştên ku îro emrîkanan li Wîetnamê kirine û tiştên ku artêşên ketine "şerê ji berêvkê" yên ku berê kirine heye? Çaxa Şerê Duyemîn Ê Dinyayê, gava ku roavayîyan li "Dresden û Hamburg"ê kevir li ser kêvir nehiştin, tu kesî negot, birevin, "génocide"ê dikin! Bi rastî, armanca me ew bû, heta ji dest bihata, me zêde elman bikuştana.**

**SARTRE-** Di "şerên ji berêvkê" yên di navbera neteweyên hêzên wan bi qasî hev xurt de, qala "génocide"ê nayê kirin, ji ber ku, qet nebe di sêrî de, metirsî ji bo her du aliyan jî wek hev e. Di "şerê ji berêvkê" de, ciyawaziya sivil û leşker nayê kirin, ji ber ku netewe giş tevî şer dibe, wî dipejirîne. Bo nimûne, rewşa di 1914'an de: sendîqavan û sosyalîstên ku ji bo aştîyê çî ji destê wan hatibe kirine, ji nişkê ve rabûn ser xwe û wekî her kesî gotin, "Ber bi Berlîne ve! Ber bi



## REWŞEN-NAME

Berlinê ve!" û reviyên eniyê. Di vê yekê de, ji ber ku gelê sivil jî wekî leşkeran difikire, dijmin bi heman rengî êrişî wan jî dike. Lê metirsî ji bo her du aliyan jî heman metirsî ye. Neteweya ku êriş dike jî, di metirsiyê de ye. Elmanyaya Hitler ser û binê Ewrûpayê kir yek, lê dawîya dawîn, bixwazî nexwazî, ew ê ji têkbişikiya - û têkşikiya jî. Dibe ku Emerîka bixwaze Sowyetistanê bi bombeyên atomê ji holê rake, lê gelekî baş dizane. wê bersiva Sowyetistanê, li welatê wan jî bi milyonan mirovan bi carekê ve bikuje. Ku Emerîka dînitîyeke wisa bike jî, ev bi têgiha "génocide"ê nayê şirovekirin, ji ber ku di vê tevgerê de, jiholêrakirineke bêmetirsî, hesabkirî ji bo aliyekî tune ye.

Mînakên vê hene. Ji holê rakirina cihûyan ji aliyê Naziyan ve jî, piştî Şerê Duyem Ê Dinyayê paqijkirina teteran ji aliyê Sowyetistanê ve jî tam "génocide" bû. Stalîn -heq an neheq- bawer dikir ku teter alîkariya elmanan dikin, ji ber vê yekê jî, hemû dan girtin û şandin kampan û wî ev gel "paqij kir".

Di sedsala XIX. de, şerên mêtîngeriye bûne sedema gelek "génocide"an. Lê ev ne zêde bûn, ji ber ku gelê welatê ku êriş çûye serê wê were mêtin. kedkarên erzan wê ji wir bîn peydakirin, bi vê yekê jî, wê li ser şiyara standina doringên xav (hammadde) yên erzan û firotina hilberînan biha bazirganiyeke mêtîngeriye bihata avakirin. Tew, ji bo ku bikaribin kedkarên ked-erzan peyda bikin, li serjîmareke pir jî digeriyan, ji ber vê yekê jî, ji zêdekuştina mirovan direvin.

Li Wîetnamê, rewş gelekî cuda ye. Emrîkan ne wekî mêtîngerên klasîk li wir in, ji ber ku berjewendiya aboriya wan ku biparêzin tune ye, an jî gelekî kê m e. Armanca wan ne ew e çavkaniyeke doringê xav, an jî bajarekî di destê xwe de bigirin -General Westmoreland ev yek di meha kewçerê de eşkere got- li ser parzemîna Asyayê bibin xwediyê baregeheke leşkerî û nişanî hemû dinyayê bidin ku "gerîla bi kêrî tiştêkî nayê". Ku bi vî çavî bê nîrxandin, pêdiviya emrîkanan bi Wîetnamê hîç tune ye. Tixûbê berjewendiyeke ku ber qirkirina yên li hemerî wan derdikevin bigire jî tune ye. Niha ji ber ku gelê Wîetnamê serî li ber rakiriye, encama mantiqî ya ku tevî şerê Wîetnamê bûye, wê tam ber bi "génocide"ê ve, ango qet nebe kom bi kom jiholêrakirina gelê Wîetnamê ve dibe.

Karbidestên Emerîkayê vê yekê eşkere nabêjin, lê yên ku şer dikin vê yekê zêde seh dikin, ji ber ku, çawa ku tîr qada şer, bi rastî ji du formulên ku li dijî hev dixwiyan yekê dipejirînin. A yekem ev e: "Baştirîn wîetnamî wîetnamiyê mirî ye." Ji bo emrîkanan ev peyveke rast e, ji ber ku nikarin bi hevkarên xwe yên başûrî bawer bikin. Îhtimala leşkerekî Saygonî ku bêbextiyê bike her tim ji sedî pêncî ye. Dema ku dest bi tevgera "sêgoşeya pola" ya ku têkçû kirin, emrîkanan li ser vê mijarê, ji Serkirdayetiya Giştî Ya Wîetnamê re tiştêk negotin, ji ber ku dizanibûn ku wê gelek kes ji artêşê birevin. Formula duyem jî ev e: "Her wîetnamiyê ku dimire wîetkong e." Ev formul hem bi kêrî rastderxistina qirkirina li ser navê ya yekem dibe tê, hem jî derdixe holê ku hemû gel li hemerî wan radibe.

*-Hûn dibêjin, encama xwezayî ya ku Emerîka pozê xwe dirêjî ve yekê kiriye, me ber bi bi giştî jiholêrakirina gelê Wîetnamê ve dibe.*

*Gelo tiştên li wir diqewimin ve yekê rast derdixin?*

**SARTRE-**  
Tiştên ku emrîkanan li wir

kirine, em ji şahidên ku me li Kopenhagê guhdarî kirine hîn bûn.

Wîetnamiyên -bi merdî, bi duristî, heta ku bi nefsbîçûkiyeke ku mirov dike heyrana xwe-şahidî kirin; lê ligel wan, ne qaçaxên leşkeryê, emrîkanên ciwan ên ku xizmeta xwe ya li Wîetnamê qedandine û bi xwe xwestine ku werin dadgehê şahidiyê bikin hebûn.

Kêliyêkê berê, we qala wêneyan kir ku car caran di "New York Times"ê de çap bûne, yên wîetnamiyên ku şikenceyê bi wîetnamiyên dikin. Lê ya ku di van wêneyan de xwiya nabe,



şewirmendên wan ên emrîkan in, ji ber ku di hemû sehneyên bi vî rengî de, li paş perdeyê, tim caran şewirmendek heye. Pergala lêpîrsînê ji aliyê şahidekî emrîkan ve, ku hem bi xwe şikence kiriye û hem ji li ser vê yekê ders daye hinên din, hat beyankirin. Deh mehan ev kar kiriye û bi şewazeke jixwebawer: "Ez emrîkanekî bi hal û wextê xwe ne xerab im; lê niha dibînim ku ez tawanbarekî şer im." digot. Wekî nanopêjekî baş ku nanê xwe dipêje, bi awayê mirovekî teknîkî, qala tiştên ku kiribû dikir. Bi dilsoziya leşkeriya ku di dil de bû digot, "ji yên din çêtir encamê" digire. Ji ber ku bi zimanê wîetnamiyên dizanibûye, ji ber vê yekê jî, şikenceyên giyanî û yên fizîkî dianibûye ba hev.

Ji me re got, girtî hema li wir, li ciyê ku tîn girtin nakevin lêpîrsînê. Gava ku gundekî di binê desthilatdariya Wîetkongê de tê bidestxistin, gund tê rûxandin, gelê di gund de tê veguhestin -bi taybetî jin, zarok, pîr, ji ber ku mîr li derveyê gund, li ba wan hêzan in ku şer dikin. Li wan mirovan hemû bi çavê "kesên şikbar" tê nihêrin û hemû tîn şandin "gundên nû yên jiyanê" (navê wan ê berê "gundên straticîk" bûye.) Dû re, yên ku li wan tîn dayin ku wîetkong in û yên ku çek li mala wan tîn girtin tîn kişandin lêpîrsînê. Ku leşkerên saygonî tevî tevgerê bûbin, lêpîrsînê ew dikin, lê di binê kontrola efserekî emrîkan de. Hemû îfadeyên şahidên li ser vê mijarê hev du digirin. Di karê şikenceyê de, tişteki ku hîni wîetnamiyên bê kirin tune. Ji ber ku ew jî dikarin li ser bifikirin, lê emrîkan li wir in. Nişanî wan didin bê ka wê şikence li gorî kîjan pêpelûkan bê kirin: Nexwe, bê îmkân bûye ku encamekê ji şikenceyê bigirin. Şahidê me digot: "Ez ê çawa agahiyê ji yekî ku ser çavê wî bi qundaxê hatiye eciqandin bistînim?"

Ku bi tenê emrîkan tevî tevgerê bûbin, lêpîrsînê ji ew dimeşînin -ango şikenceyê dikin-, lê wê çaxê jî wergêrekî wîetnamî bi xwe re dibin. Me filimek dît, emrîkanekî girs, bêtî ku jê aciz bibe û bibetile, pehîl li libatên zayendî yên wîetnamiyekî ku li erdê rast bûye dixist. Bi kurtî, wisa an ne wisa, di hemû şikenceyan de emrîkan hene. Û gotina ku bê gotin ku wîetnamî şikenceyê li hev dikin nîv-rastiyek e; ev nîv-rastî, li Amerîkayê, derew e tê bikaranîn ku piştgiriya fikra "ev mirov hemû hov in" bigire.

Girtiyek, bipeyive an nepeyive, piştî ku hat kişandin lêpîrsînê û şikence xwar, ku lêpîrsîna

duyem pêwîst bibe, emrîkan wî/wê didin destê hêzên hukimetê, ew jî wî/wê dişînin zindanê an jî kampê. Li wan deran, ji nû ve şikenceyên xedar lê tê kirin. Bo nimûne, tiştên ku me li ser şikenceyên qirêj ên li Girtîgeha Poulo-Condor bihîst kezeba mirov dişewitînin. Emrîkan bi wateya kontrolkirinê hem li vê girtîgehê, hem jî li yên din digerin, lê tevî ku bi hemû tiştên ku diqewimin dizanin jî, tilka xwe jî nalivin. Ev jî tawaneke şer e, ji ber ku her artêş ji ewlehiya girtiyên ku bi dest xistine berpîrsiyar e.

Tiştêki din, gelekî hindik şervan dîl tîn girtin. Jin û pîr û kalan digirin û diwin, lê leşkerên Wîetkongê, bi piranî, li ciyê ku bi dest dikevin tîn kuştin. Me li filîmeke ku leşkerêki emrîkan kişandîye temaşe kir; di filîmê de, leşker girtiyên birîndar dicehimand. Ji şahidên me yekî, di tevgerê de, pîrsiyê ku girtiyên bi dest xistiye çi bike, jê re gotine "paqij bike!" Wekî ku fêm nekiribe tevgeriyaye, lê gava ku tevî girtiyên veg-eriyaye baregehê, gelekî pê re xeyidîne: "Em çi bikin ji van zilaman" û girtî dane destê hêzên Saygonê.

Ez li tiştêki gelekî şaş û metel mam. Wê bê bîra we, piştî şer, di rojnameyan de, madxelandî me li wêneyên ku elmanan kişandibû temaşe kiribû: Mirovên ku eş dikişandin an jî li ber mirinê bûn, cihûyên jin û mîr ku dibirin odayên gazê û ev wêne, baweriyaya me hemûyan, hem bi tawanbariya şefên Naziyan û hem jî bi tawanbariya leşkerên ku bi kêfxweşî ev kişandîne filîman jî anî ku ew jî tawanbar in. Me heman tişt li Kopenhagê jî dît. Filîma belgeyî ya sinemager Bréz Pic, eger wêne û filîmên ku emrîkanan bi destê xwe kişandîne tunebûna, pêkan nedibû. Di filîmê de, sahneyeke xedar heye: Ji leşkeran yek wîetnamiyekî bi du guleyên ku berî paş stûyê wî dide dîkuje, dû re ji bo ku hevalê xwe yê ku filîmê dikişîne bikenîne, du guleyan berî zotika qurbanê xwe dide.

Ez nabêjim, hemû leşkerên emrîkan wisa kêfa xwe derdixin -ji me re hat gotin ku gelek kes ji ber karê ku dikin zivêr in-, lê bi hinekan re, wekî bi leşkerên Hitler re hebû, kêfeke rengsar a kuştinê heye.

Wekî her tim, yên ku naşîbin wan jî, bibêjî nebêjî wekî hemûyan dikin. Reşîkekî ciwan î emrîkan ji me re qala dema paqijiyekê kir ku efsere wî jîneke ku di ber wan re derbas bûye nişan daye û gotiye: "Ka ez te bibînim, vêya bixîne!" Û leşker jinik li erdê rast kiriye. Efsere ne

## REWŞEN-NAME

miroveki *sadique* bû: Bi tenê pêwîst bû ku dema paqijiyê her kes paqij bikirana. Me jî şahid pirsî ku çima beradaye. Li me vegerand got, "Min jinik nekuşt, zû an jî dereng, wê yên me ez bikuştama."

Û jî me re qala generalekî emrikan jî kirin; li helikopterê siwar dibûye, derdiketibûye "nêçira Wietkongê". Bi çeka otomatîk gule li her kesê ku didît dibarandibûye. "Lê jî bilî jinan" digotibûye. Lê wekî hûn jî dizanin, jinên wietnamî jî, wekî

mêran bêcemeyekî reş û şevqeyekî li xwe dikin. Ji jorê ve yeqîn wisa ne hêsan e ku jinek û mêrek jî hev bîn derxistin.

Wekî van hîn ez dikarim qala gelek bûyeran bikim. Lê çawa be jî, ev hemû wê tiştekî bi ser diyardeya bingehîn nexin: Ku we dest pê kir hûn berî hemû tiştên rengzêr bidin ku çavên we dibîne dilive. Tê wateya ku we dest bi "bi giştî jîholêrakirine" kiriye. Tiştekî ecêb e ku berê pêşîn leşkerên jî rêzê li vê yekê hay bûne. Her çî qasî fikreke wan tunebe jî, hatine Wietnamê ku "mirovên baş" jî şerê "nebaşan" biparêzin. Lê di demeke kurt de, fêm kirine ku ruhê wietnamiyan hemûyan jî wan diçe. mirovekî "baş" tune ye û nehatine vir ku neteweyekê rizgar bikin, hatine hemû wietnamiyan bikujin. Lê hay bûne ku hatine xapandin, lê ji dêvla ku hêrsa wan li hukimeta wan bê. Li mirovên ku quspetiya jî dêvla rizgarkirine mirin pejirandine tê. Gelek jî wan tiştên ku bi wan hatiye kirin fêm dikin, lê nabêjin, jî ber ku ne tiştekî hêsan e ev. Fransîzên ciwan ên "destên xwe di xwînê dakiribûn" ên jî Cezairê vegeriyan tê bira we: Hemûyan jî nedixwestin ku biaxivin.

"Génocide" bi tenê di tevgera leşkerî de der-nakeve holê. Ji aliyê hiqûqî ve, me ev mebest, bi awayê hewleke zanistî ku tê meşandin, li her derê destnîşan kir: Hewlên kêmkirina zayîne, têkbirina aqil û hiş û laşê mirovan, sewqkirina gel bi



*Di serê Wietnamê de, bi hejaran mirovên sivil li xwe ji dest da.*

giştî bi aliyê henderanê ve... Emrikan nabêjin mebesteke wan a wisa heye, lê hewla çawa pêwîst be didin.

Ser meselê, em qala "şewitandina erdan" bikin. Li Başûr, erdên ku dikarin bîn çandin, ên di binê desthilatdariya Wietkongê de, bi madeyên jehrî tîn dermankirin. Ceribandin ku pelên darên daristanên ku hîn bivir lê neketine biweşinin, lê tiştek bi dest nexistin: Daristanên ku hîn bivir lê neketine gelekî xurt in, gelekî li ber xwe didin, hişk nabin, jî nû ve şîn dibin. Ji ber vê yekê jî, êrişî "xaka raste" kirin. Wisa difikirin: "Madem artêşa şoreşê di nava gel de wekî masiyê di qavanozê de dijî, wê hingê em ê jî ava qavanozê vala bikin.", ango em têkevin ber xwexwedîkirina gel û xwedîkirina yên şer dikin, em ê pişt a wan hemûyan bişikênin. Gundiyên ku gundên wan tîn rûxandin û şewitandin, dawiya dawîn, bêgav dimînin ku li kêleka daristanan bijîn, axa wekî şirîtê zirav biçînin; ev erdên ku di binê daran de dimînin jî balafirê ve xwiya nabin, jî ber vê yekê jî nikarin bombeyan lê bibarînin, an jî dermanên jehrî li wan wer bikin. A rast, emrikan "nikarin ava qavanozê vala bikin", jî ber ku şervanên Eniya Rizgariya Neteweyî rêkxistina xwe di nava daristanê de saz dikin û xwarina xwe jî ji deverên din tînin. Xwe bispêrin gundiyên ku emrikan dixwazin wan qir bikin li aliyekî, pirê caran, ew van gundiyan xwedî dikin û derman dikin.

Ligel vê yekê, emrîkan mafekî hîlbijartinê didin van gundiyan: Eger dixwazin ji bombeyan û birçîtiyê xelas bin, dikarin xwe bispêrin hêza nêzikîtirin a Emerîkayê, an jî Wîetnama Başûr (eger naxwazin bibin nişana helîkopterê, baştir e ku vî karî bi şev bikin); piştî vê yekê, ew ê di "gundê nûjiyanê" de bêne bicîkirin.

Werin, em rastiya vê çîrokê bibînin. Mirovên ku li van gundan bi cî dibin, beriya ku werin vir, ji ber ku du sê salan di deverên ku di binê desthilatdariya Wîetkongê de jiyane, teqez "kesên şik-bar" in. Çawa pêwîst be li hemberî wan, helbet wê bê kirin. Berê pêşin, malbata ku li Asyayê girîngiyeke mezin didinê wê ji hev bê belavkirin. Pirê caran, mêr demeke dirêj berê çûne tevî E.R.N'yê bibin. Eger ku neçûbe û radest bûbe, derhal tê kişandin lêpîrsinê, pirê caran di şikenceyê re derbas dibe. Eger ciwan be, tevî hêzên hukimetê dibe. Bi vê yekê re, malbat an bi giştî, an jî hema hema ji holê radibe û zayîn kêm dibe. Ji bo ku hîn bibim ku ev kêmbûn girîng e, an ne girîng e, ez bi xwe zêde zêde li ser sekinîm; tîrsa min rast derxistin: Carekê, pênc sed hezar kes di girtîgehê de ne û pê re jî, di deverên ku di binê desthilatdariya Emerîkayê de ne, ji sisyan yekê zêdetir gel di van "gundên nû yên jiyanê" de dijîn. Lê li gorî peymanê 1948'an, her tevgera ku rê li ber kêmkirina zayînê vedike "génocide" e.

Pirê caran derfeta xebatê ya evên li wan gundên biçûk dijîn tuneye. Ên ku hindik guman li ser wan hene li kampên Emerîkayê kar bi wan tê kirin. Lê mîzîna jiyan û xebatê ya ku bîngeha hemû çandan e têkçûye. Rewşa tenduristiyê dil parçe dike. Xwarin ew qasî hindik e ku mirov ji ber fedî dike; an emrîkan "ji bîr dikin" ku birinc belav bikin, an jî -bi rastî jî deverên din jî gel tê dizîn- birinca ku wê li gel bê belavkirin jî aliyê karmendên Wîetnama Başûr li qereborsayê tê firotin. Ev hemû rê li ber "rûxîna giyanî û can" vedike ku di peymanê 1948'an de ev yek tawana "génocide"ê qebûl bûye.

Tê wateya ku ev yek ji bo wîetnamiyan, an li gundê xwe bimînin û bimirin, an jî biçin van "gundên nûjiyanê" û hêdî hêdî bimirin. Li holê, tiştêkî ku hîlbijêrin jî tuneye, lewma mirovan didin zorê ku hîlbijêrin: Rebenên belengaz, gava ku êdî hew bikaribin xwe li ber bombebaranê bigirin. an jî bi zora singûyan "serî ditewînin". Ev mafê "hîlbijartina azad" a ku pêşberî gelê

Wîetnamê dibe, tam dereweke emrîkane ye.

*-Bi vê yekê re, emrîkan îdla dikin ku derfeteke hîlbijartinê ya gelekî zelal dane Wîetnama Bakur: Dibêjin, dev ji piştgiriya gerîlayên li Başûr berdin, em ê we rihet bihêlin.*

**SARTRE**- Ev jî, dikeve nava heman listikê. Carekê, emrîkan jî gelekî baş dizanin, gava ku êrîş birin ser Wîetnama Bakur, alîkariya Bakur li Başûr gelekî qels bû (li gorî texmînên emrîkanan, jî % 10'ê hêza wan a leşkerî). Lêbelê dîsa jî, tiştê ku avêtin meydanê pêşnumayek bû ku li hev anîbûn, ji ber ku Wîetnama Bakur bixwesta jî, nikaribû ya nepêkan pêkêne ku şervanên başûrî dev ji çekan berdin. Te di mirov bawer neke jî, ku hukimeta Hanoiyê ji emrîkanan re bibêje, "Temam, em dev ji alîkariyê berdidin." jî, wê şer bidome; wê çaxê emrîkan jî dikarin bibêjin, "Gava ku we digot em dixwazin li hev bîn, we derew dikir, jî ber ku li Başûr şer didome: Wê çaxê, em ê jî bombebaranê bidomînin."

Emrîkan li Wîetnama Bakur jî tawana "génocide"ê dikin, ji ber ku armanca bombebaranê wan rûxandina pergala civakî ya welêt e û têkbirina wan tiştan e ku sosyalîzmê di navbera sêzdeh salan de pêkaniye. Ew dixwazin nişan bidin ku ne bi tenê gerîla, sosyalîzm jî nikare bi ser bikeve. Qaşo Wîetnama Bakur xwe bide ber ku li hev bikin, her tiştên ku têkçûne wê dîsa çekin - emrîkanan soz daye li ser vê yekê- û li ser "esasên gelekî asêtir." Lê hewl didin ku vê bi tirsandineke ku mêjiyê mirov tevlihev dike bi dest bixin. Wezîrê Tenduristiyê Yê Wîetnama Bakur hat -ji ber ku di navbera şer de ev qebûl kiriye, min ev jî bo wî şerefeke mezin qebûl kir- got ku, asabên hinek mirovan, bi taybetî jî yên pîr û kal û zarokan perîşan bûne, dibe ku bandora bombebaranê bi salan jî ser gel neçe. Ev tirs jî, "génocide" e, ji ber ku armanca xerakirina hişê kesên civateke diyar pê re heye; li gorî Peymana 1948'an, tawaneke ku ketiye nava têgiha "jiholêrakirina bi giştî".

A rast ev e ku emrîkan bi "pêşniyar"ên derewîn nêzikî wîetnamiyan dibin, da ku dev ji baregeheke li Wîetnamê bernedin, ji bo wan jî, rîyeke wekî din tuneye. Ji bo dewleteke mezin î mêtînger "jiholêrakirina bi giştî" bersiveke straticîk î tekane ye ku bikaribin bidin neteweyeke ku ji heft



## REWŞEN-NAME

salî heta heftê salî şer dikin -baş guhdarî bikin, ez nabêjim taktîk e-. Emrîkanan ev nedît û demexist holê helbet, lê riyeke din tuneye. Dibe ku hinekan, serkarên di nava hukimetê de xwedî wezîfe jî, gava ku dest bi şerê Wîetnamê kirin, bi vê yekê nizanibin; lê îro êdî nikarin bibêjin, em nizanin. Du rê hene ji bo wan: Dev jê berdin û herin, an jî her tiştî ji holê rakin. Hukimeta Emrîkan bi vê dizane û tawana wê ya herî mezin, encama mantîqî, ya ku mirov nikare jê bireve, ya polîtîkaya ku li ser navê wê dimeşîne ji gelê xwe vedişêre.

*-Madem ku polîtîkaya emrîkanan hew gava ku digihîje "jiholêrakirina bi giştî" dibe xwedî wateyekê, ji bo çî gelo Dewletên Yekbûyî "pêdeçûnê" bêtir nakin û vê yekê naqedînin?*

**SARTRE-** Ji ber sedemên aborî, straticîk û leşkerî nikarin bikin. Tevgerêke wisa bi tena serî nabe. Sazûmaneke mezin a esmên û erdê, avakirina rê û pireyan, bingeheke bêkêmasî divê. Ev yek di-rojekê de nabe û binihêrin ev tenê bi tena serê xwe jî astengeke madî ye ku derdikeve pêş "pêdeçûnê". Dibe ku bikaranîna çekên atomê her tişt hêsanîr bikira, lê ev çek li gel welatên ku bajarvaniya wan qels e zêde bi kêr nayê. Pîspor bawer dikin ku gava li dereke wisa biçûk bê bikaranîn, xisarê dide yê bi kar tîne jî. Li aliyekî jî, encamên wê yê navneteweyî ji aliyê madî wê bêtir cidî bûn dîtin.

Şerekî wisa jiholêrakirinê gelekî biha ye. Divê gel hêdî hêdî hîni mesrefên ku tên kirin bikin. Tew li gel kargerên emrîkan gelemşeyeke gelekî girîng a giyanî heye: Berî bi sê salan, ji gel re gotibûn ku mesele wê gelekî bi hêsanî wê çareser bibe: niha jî nikarin bidin fêmkirin ku ji bo bikaribin der heqê welatekî cotkar î biçûk ê Asyayî de werin, wekî çaxa Hitler, pêwîst e ku aboriya hemû welêt bidin ber.

Tê wateya ku hêdîbûna "pêşveçûnê" ne ji ber dilrehiya mirovane ya hukimeta emrîkan e, ji ber sedemên giyanî û aborî ye, ji ber ku pêkan nîn e ku zûtir pê de biçin.

Lêbelê, heman armanc e.

"Jiholêrakirina bi giştî"; ji ber ku binihêrin ez careke din dibêjim, ji bo welatekî heta bixwazî teknîka wê bi pêş de çûyî riyeke din tuneye da ku bikaribin welatekî xizan, ku hemû gelê wî bi şerekî şoreşgerî serî li berê hildaye, têxin binê destên xwe.

*-Emerîkî dikin bi ser bikevin?*

**SARTRE-** Na, ji ber ku gelê Wîetnamê li gel wan, bi awayekî di dîrokê de nimûneyeke ku kêma hatibe dîtin, serî hildaye û li ber xwe dide. Wîetnamiyên şewaz guhertin û bingeha aboriya xwe parastin. Û birêveçûna sosyalîst hem rizgar kirin û hem jî xurt kirin. Lê em ê helbet vê hewla kesnedîtî ya ku cangoriyan daye, li gel berjewendîya celadan wekî sedemêke ku siviktir bike bi kar neynin! Bi ser de jî, polîtîkaya jiholêrakirina bi giştî ya ku Emerîka li gel Wîetnamê bi kar anîye dualî ye. Ev hem gefeke "jiholêrakirina bi giştî" ye li gelê Wîetnamê hatiye kirin, hem jî dixwaze gelên din ên dinyayê, bi taybetî jî gelên Emerîkaya Başûr, ku dixwazin şoreşekê li welatê xwe pêk bînin, bitirsîne. Tawana ku Emerîkayê li Wîetnamê kiriye, tovên gelek tawanan, ku amade ye li her derên ku wê desthilatdariya wan têkeve metirsiyê, di xwe de dihevine. Gelê Emerîkayê bi vê nizane, ji ber ku derew lê tê kirin, ji ber ku bawer in ku ala wan bi tenê li derên ku ji bo azadiyê şer dikin bilind dibe. Û binihêrin, ji ber vê yekê kîna ji her derên ku mirovên ji bo azadiyê şer dikin li hemberî wan zêde dibe fêma nakin ♦



*Xwepêşandaneke li dijî Şerê Wîetnamê, New York, 1969*



## keça keyser

lal laleş

I

di rehê xwezaya dilîn û ramanên sikakên ku  
wek çemê bi ber qutba pîroz de diherike  
tê xwendin malikwêran ji diwana  
wê rebera şûm û rind!

ew yar her çi qas derewîn be jî, li dû xwe  
sîlûeta mirinî dihêle û xwe li sînore îmaj  
hêma û utopyayê bi romantîzma xizan dile-  
bike dixê û binxetî helbestê dibe!

amûrên newaya adarê seglawîbûna demsala hawarê  
li reşariya gencîneya pelê payîzê, keleha  
qedr û qîmetê dûrbûyîne çêdike.

li ber denklanjora dûrbûyîna rebenê  
heft keroşk / dîllll  
sê telaq / jinnnn  
çil rovî / virrrr  
hezar û yek çîrok / evinnnn  
tê kuştin!

erotîka şeng bû ew, li esmanê çiyayê cengê  
li kêleka deriyê darîn, li şikeftên tarî li ser  
doşek, lihêf û balgîfên hiri!  
li ber mekeve porkurê  
balgîfa te çongê çiyê ye!  
li ber van bikeve!  
ew bêbavana kujer in, xwîniyê xezala  
kezîzer in xwînmijên keça Keyser in!

## II

- ka? Şerbikê dilê diltiya min
  - ji te re perîkê pêûsa te.
  - ka tîr û kevanê min?
  - ji te re perîdeya peyxama te.
  - .....
  - zuhreya min?
  - ji te re hêsteyê te.
  - ka şekala min?
  - ji te re kelemê kilama te.
  - .....
  - ka katjimêra min?
  - ji te re roja te heyva min.
  - ka nivîsta min?
  - ji te re stranên qedîm, dûrikên biaxîn
  - .....
  - ka mirina min?
- Ji te re bermayiyê qelpkirina xwekustina te.

## III

gelemşeya hevdîtina kevokan  
wek stêrkên dixwircin şibaka tarfîreş

bi saetan, bi sedsalan, bi.....  
mam li benda derketina kevokan ji şibakê  
mixabin!  
"ji pacê qertelek  
di dêv de / qetikek taraheya kirmansan / û terhek ji mêwê  
derket"  
kewlalê ez gorî  
ka derkeve  
merhema merhemet lê neqşandî bibîne!

5 Avrêl 2001

# Lêkolînek li ser lawikan

beşîr botanî

## I

### Lawik çi ye?

**L**awik ji biçûkkirina peyva *law* peyda bûye. Ji ber ku berê ev babet bi tenê ji aliyê lawan ve dihate strandin. Lawik bi xwe jiyana civakî ya kurdan bû, wek stranên şer û evîne û ta dawiyê. Di vê babetê de, qala şer, xweşmirovekî, an jî evîna du kesan dihat kirin.

### Lawikname

Dema ku ez 17 salî bûm, min lêkolînek li ser lawikan berhev dikir, hingê min pir jêderk ji ragihandinên erebî û kurdî werdigirtin, wisa ji xizmên xwe jî; ji malbata me bi tenê lawikbêjek hebû. ew jî **Guro** bû, pismamê bavê min e. Ez lawikan jê fêr bûm, wisa bavê min jî dengê wî tomar kir. Êdî min jî li pey karîna xwe ev babet diparast û hêviya min ew bû ku nameya **Hesen Cizîrî** û **Mihemed Arifê Cizîrî** di pêşerojê de pêşkêşî neteweya xwe bikim, da ku nîfşê nû pûte pê bide.

### Awazê Helbestê

Bend û ristên lawikan bi giştî dirêj in, lê kêm kurt hene, dastan jî nimûneyek e, ya ku xêzên wê gelek in. Lê lawikên sêqafiyeyî jî hene. Eger naverokên helbestan xweşî bin, an xem bin, mirov dikare teknîk û awazên lawikan baş bi kar bîne. Ango muzîka lawikan pir fireh e û bêsinor e.

### Awazê awazê

Awazên lawikan ji dîwanekê ta du dîwanan (ji 8 dangan bêtir) in. Jenîna wan pir şewat e û hem jî taybet e. Lawik bi yekem mork (stîl) li nik kurd û nekurd tê pejirandin. Veşartî û nihêniya wî rengê hunerê bi xwe lehengî û hestên xortan e. Piraniya wan li ser hewayên *beyat kurdî*, *hicaz*, *kurd*, *rast* tîn strandin, pişkek ji wan jî li ser hewayên din, wekî *nihawend*, *ecem*, *seba*, *sêgeh* û ta dûmahiyê. Wekî hat gotin, naverokên helbestan, çi xweşî bin, çi xem bin, mirov dikare muzîka lawikan bi kar bîne. Êdî ji ber hindê, ev babet li Rohilatê Navîn û li Efrîqayê baş belav bû. Belavkirina wan jî, hemû bi saya dengbêj û hunermendên Botan bû û nemaze ev her du bilbil; **Hesen Cizîrî** û **Mihemed Arifê Cizîrî** bûn.

Her nayê mandelkirin (înkarkirin) ku hunermendên kurd û tirk ji bo bipêşvebirina muzîka tirkî muzîka lawikan bi kar aniye.

### Cureyên Wan

Xortan ji hestên dilên xwe peyv û muzik (ango lawik) peyda kiribûn. Her lawikek babeteke serbixwe ye û ciyê mixabinê ye ku gelek caran çi hunermend, an hunerhez, bi çewtî çend lawik, payîzok û heyranokan têkel dikin, ango ji van her sê morkan şorbeyeke nexweş derdikeve. Lê çewtiyên wisa ji aliyê peyvnan, an muzîkê ve baş diyar in. Ji ber ku naverok û awazên lawikan ji heyranok û payîzokan cuda ne

## REWŞEN-NAME

û her ne wek hev in. Sê cureyên lawikan jî hene û wek heyranokan bi dengê nerm û zelal tên strandin.

### 1- Lawikên Dewlemend

Awazên wan jî dîwanekê heta du dîwanan in, ango ji oktavekê heta du oktavan in (ji 8 dengan heta 16 dengan). Ev cure bi tenê li Botan dihatin bikaranîn û ji ber bizava hunerî li başûrê welêt, îro li Badînan jî bi awayekî pir baş tên bikaranîn.

### Xanê

**Hewa:** *Beyat Kurdî*

**Folklor:** *Deşta Mişarê-Botan*

**Belavkirin:** *Elmazxan*

*Xanê gidvê. îsal sala tirsê ye, j' dûriya te dilê mi' b'xem e, hoê*

*Hey delalê. çiya bilind e te nabinim, rexekî me tirk e, yê dî ecem e, hoê*

*Xanê gidvê. ez çî dîla' nahevînim lê, of, min soz daye te, ez jî bo te me, hoê*

...

2- Pesteyên lawikan, pîvanên wan 4/4, 2/4, 3/4 û heta dûmahiyê

### Min Dîtibû Ber Odê

**Hewa:** *Beyat Kurdî*

**Folklor:** *Cizîra Botan*

**Belavkirin:** *R. Cizîrî*

**Destkarî û deng:** *M. A. Cizîrî*

*Min dîtibû ber odê*

*Oy, oy, oy, oy eman*

*Hingê guhdarî dikir*

*Ay, ay, ay, ay eman*

*Xweş dihat dengê ûdê*

*Were lê lê, were were, de were*

*Were Belqîsê were*

*Ez 'ê bûme jî te re*


*Yar, yar eman*

...

### Esmer

**Hewa:** *Hicaz*

**Folklor:** *Sêrtê*



*Besir Botani*

**Belavkirin: Beşîr Botanî**

*Esmer te d'got we nakim  
Soja xwe xira nakim  
Hoy, were hoy, hoy, hoy  
Çi cara' te j'bir nakim*

...

**3- Lawikên Sanahî**

Mirov dikare bibêje ku muzîka vê babetê *heyranok* e û helbest *lawik* e.

Wekî tê zanîn, muzîka *heyranokan sanahî* ye, ji lew re ev cure li hemû deverên kurmancan tê bikaranîn. Me gencîneyeke pir mezin ji vê babetê heye, ango piraniya *lawikên* me *sanahî* ne. Ji ber ku armanc di vê babetê de ne muzîk e, lêbelê naveroka *helbestê* ye û hew. Bi kurtî, muzîka *heyranokan* beşek ji muzîka *lawikan* tê hejmartin.

**Maziçînê**

**Hewa:** *Beyat Kurdî*

**Folklor:** *Zaxo*

**Belavkirin:** *Îbrahîm Hesên*

*Were maziçînê, heke tu maziçîn î, tu rabe here  
gelyê jorî, pesarbilind e*

*Ez ê gazî te bikime, eger tu b'heval î, cabê  
l'mîn nede*

*Heke tu bêheval î, hêdî hêdî xwe b'gelyê jêrî  
da berde*

*Lê lê lê oy, ox, de lê lê lê, lê maziçîna min lê  
lê oy oy ox*

...

**Ciyên Wan**

*Lawikên dewlemend* berê bi tenê li Botan dihatin strandin. Lê ji bo çêjê jî, ji bilî devera *Serhedê*, gihiştin hemû deverên kurmancan û *lawikên sanahî* li hemû deverên welêt peyda dibin.

**Peyvên Wan**

*Peyvên lawikan* yên xortan (kur û keç) in. Naverokên wan jî pir dewlemend in:

- 1- Jîna civakî ji hemû aliyan ve.
- 2- Dastan, beyt, çîrokên evînî.

3- Ceng, palevanî û mêranî.

4- Zindan û stem.

5- Siruşt.

6- Dîroka kurd û Kurdistanê.

Ev naveroka pir girîng û dewlemend li gel sê cureyên muzîkê bû pênasa *lawikan*. Ev babet ji babetên din ên folklorî bêtir hatiye strandin, tomarkirin, bipêşxistin û belavkirin. Hunermendên ku baş *lawik* xwendin *Hesên Cizîrî*, *Mihemed Arifê Cizîrî*, *S. A. Cizîrî*, *Miryemxan*, *Nesrîn Şîrwan*, *Elmazxan*, *Îbrahîm Hesên*, *Gulbehar*, *Eyşe Şan*, *Tehsîn Taha*, *Beşar Zaxoyî*, *E. Zaxoyî* û heta dawiyê.

**Kêmbûna Wan**

*Ciyê mixabinê* ye ku îro *lawik kêm* tene strandin, lê *kêmbûna wan* ne bive (metirsî) ye. *Ragihandina kurdî*, ji bilî *Radyoya Bexdayê-Beşa Kurdî* û *KTV*, yê din her pûte bi *lawikan* nadin. Hema ji ber hindê, valahiyeke mezin di qada hunerî de heye.

**Parastin û Vejandina Wan**

Li *dabeşkirina lawikan*, ji her aliyekî ve *sanahî* bû. Lewma ev nivîs dê bibe alîkariyek, an dergehkek ji bo xwendinê. Êdî *karekî* baş e eger em *lawikan* bi zanistî biparêzin û vejînin, li gel *jenîna van amûrên* ku berê dihatin bikaranîn: *bîlûr*, *ûd*, *tenbûr*, *tevtewîk (kemençe)*, *keman*, *kanûn*, *def*, *dunbuk*.

**Lawikên Nûberhevkerî**

**Gula sor**

*Xizêmzer, gerdenmor*

*Stêra Sibê derket jor*

*Ez gorî keçka pispor*

*Gula sor, gula sor*

*Taynim, naynim, gula sor*

...

**Helbesta Gula Sor a kevin**

**Helbest:** *Gulnaz Cizîrî*

*Taynim, naynim, gula sor*

*Stêra Sibê derket jor*



## REWŞEN-NAME

*Heyrana lawkê pispör*

...

Çiroka vê stranê **Vahak Botanyan** (1960) ji kurê xwe Aramî re gêra:

"*Gula sor pesn e û navê wê Sorê ye, keça Mirdixê Boî ye û Nêrgîza Diyarbekirî ye. Di dawiya çerxa 19'an de, ango nêzîkî 1890'î, ji dayika xwe bû. Keçeke pir ciwan bû û ji ber ciwaniya wê **Gulnaza Cizîrî** di destpêka çerxa 20'an de pesnê wê da. Gava fermana ermeniyân (1915) rabû, malbata Sorê hemû hatin kuştin û winda bûn.*"

Dema ku min ev çirok di sala 1984'an de bihist, stran bêawaz bû, min helbesteke nû jê re nivîsî û awazeke nû ava kir. Lê mixabin e ku ev stran li ser navê stranbêj **Şivan Perwer** belav bû; helbest û awaz a wî bû û bi dengê **Gulistanê bû**.

### **Xezal Xezal**

**Helbest û awaz:** *Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arifê Cizîrî*

### **Jêderk**

Xezal bi xwe keçeke cihû bû û li devera Duhokê dijiya. Hunermendê nemir Mihemed Arifê Cizîrî stranek li ser rewşa wê strand û pé pir binavûdeng bû.

Ango, jêderka vê stranê bi xwe bi tenê Mihemed Arifê Cizîrî ye, lê karê seyr ew e ku stranbêj **Şivan Perwer** navê **Mehmûd Baksî** danî, li ser hindê re çend peyvên wê jî guhert.

*Xezal. Xezal. hayê... îro j'piştî xwe re ji min re rê neke. hawar e çi nîşana' oy Xezal*

*Kulên dilê min pir in, wan kula' binim, hawar e danim rex kovana' oy Xezal*

*Ma hûn nizanin rûkên Xezala min sor bûne j'kit û matên ramûsana' oy Xezal*

*Xezal xerîb e hoy cefayê. Xezal xizan e hoy nemînê*

*Xizani zehmet e hoy Xezal. ez ê çi bikim ez û Xezala xwe ketinê*

*Hoy Xezal*

### **Jêderk:**

1- Hesên Cizîrî

2- Mihemed Arifê Cizîrî

3- S. Cizîrî

4- Mîryemxan

5- Elmazxan

6- Nesrîn Şîrwan

7- Îbrahîm Hesên

8- Eyşe Şan

9- Tehsîn Taha

10- Beşar Zaxoyî

11- Semîr Kalcan

12- Fuad Ehmed (Stranên Gulbehare)

13-Rojnameya Welat, Folklorî Botan, berhevkirina Beşîr Botanî, hejmar 4, rûpel 11, 1992.

## Dilgirtî

Mehmet Esen

çemekî ji hêsir, ji xwîn û xwêdanê  
diherike li ber çavê cîhanê me  
rêça min asê, dirêj û dijwar  
rêwiyê çola sahrayê me

ne qefesa zêrîn ne mal û milk  
hesretkêşê zozanên bêdawî me  
dadgeh zindan dadger bûyî gur  
ji çêbûna xwe de sezaxwarî me

Heyva li çardehan şewqa xwe berda çavên min  
lê dîsa ji ez aşiqê tîrêja tavê me  
Dilopek hêvî di dil de bûye lehî bûye derya  
rê me rêwî me bêdawî me

**m i j**

joîn mamûk

Tariyeke spî ye  
Û evîndara bê ye  
Ango mêrkuja xwe bi xwe

Mij  
Qîrîneke bêdeng e  
Di navbera erd û esmên de

Mij  
Bûkeke şermok e  
Ku her sibeh porê xwe  
Li ser dilê me şe dîke

Wexta ku  
Li ser hesinên girtîgehê belawela dibe  
Evîna xwe, qîrîna xwe û porê xwe  
ji me re dihêle

28.11.2000

# Xwetelandin

kawa nemir

*"But we are encompassed with snakes and dogs: therefore  
some must labour, and others must hold the spears."\**

Ji Koroyên 'The Rock'e

Koro V

T. S. Eliot

Pûç dibe mîrnişîniya axa şor, zinarên bêxîlok,  
darên zîzok. Kesî mil neda ber zanyariya  
qesirbendiya ku gul vedide, kul vedide di bê,  
tavê, berfê û baranê de. Kes nexebitî, kesên  
din jî rim negirtin.

Çar werz, heft kişwer derbas bûme di vê etlasi  
aramiya dilçepel re. Di êvara dîrokî re, bi bayê  
birûskê. Li ber derwazeyê hewşeke mermer bêhna  
xwe berdidim dîsa. Dîsa li ber sincirfina şax û guliyên  
dêliya ku dirêjî kuçeya tirabêlk dibe.

Lê yên ku rîman bigirin gelek in, heke dîwan  
di hucre û medreseyên kaviil de bajen bikin.  
Mezê rêwiyê sikûm sar û asê! Berbanga sor  
avjenî dike di wê direfşa li serê kokelê de.

*\*Lê mar û kûçikan dor li me girtiye: lewma divê hinek  
bixebitin, yên din jî rîman bigirin.*

# bi berken bereh re hevpeyvîn

\_\_\_\_\_ kawa nemir \_\_\_\_\_

**X**wedê em dan xatirê dayikên me yên ku di nava şikestinên giran re zimanê me anîn spartin me zarokên kurdên vê sedsalê. Êdî Êşa we dikeve hundirê malên xwendevanên kurd. Bê guman êdî wê gotinên we hebin: Gelo Berken Bereh çawa û kingê biryar girt ku bi zimanekî li ber sikralê dest biavêje rewandêjiya heyna xwe ya têr êş û jandar?

• Beriya ku gotina xwe bibêjim, dixwazim spasdariya xwe binim zimên ji bo Dayika xwe û bavê xwe yê diltenik û niştimanperwer. Ji ber ku bi saya serê wan ev zimanê şêrîn û birîndar giyan û hişê min xemiland. Diya min neçûbû dibistanê. Xwendin û nivîsandina wê tunebû. Bavê min evîndarê welatê xwe û miriyê zimanê xwe bû. Xweş tê bîra min, ez di dibistana seretayî, pola pêncan de bûm, bavê min rojekê elfabeya kurdî (a Mihemed Emîn Bozarşan) anî malê û bi serbilindî û quretî şanî diya min û me da û got, va elfabeya me hatiye çapkirin. Me bi malbatî bi rojan ew xwend û mîna pirtûka pîroz hembêz kir. Hingê li Başûr kurdan bi şerê çekdarî li ber xwe dida. Bavê min, ji ber ku rojnameya *Günaydinê* nûçeyên şer belav dikir, bûbû aboneyê wê. Wênayekî gorbihuşt Mela Mistefa Barzanî li diwêr hilawistibû. Her roj danê êvaran me bi malbatî guhdariya Radyoya Yerevanê dikir. Ez di malbatek wisa de mezin bûm. Her tim min dixwest ji bo me kurdan tişteki bikim. Lew re zilm û zora li ser gel û xizaniya xedar bêhn li me



çikandibû. Gelek caran nûçeyên diltezin dihatin ku qomandoyan avêtiye ser gundan, qaşo li gund *eşqiya* hebûne. Gelek şevan di xewna xwe de min jî şerê leşkerên Îraqê dikir. Bi damezrandina şaxa DDKO'yê li Hezo ji bo min bû mîladek. Ez her roj diçûm wir û bi hevalan re me belavok û kitêbên li ser kurdan dixwendin. Bi kurtî, jiyana min bi tevayî di nava kar û xebatên siyasî yên kurdewarî de bihurî. Di sala 1975'an de, bi derketina kovara *Rizgarîyê* re di hişê min de beledî vedan. Her çî qas di warê zimên de ne têgihiştî bûm jî, min rahişt pênûsê û bi zimanê xwe êşa xwe derkir. Mixabin heta sala 1980'yî ji bo weşandina wan min derfet nedît. Min tenê di şevbihêrk û şahiyên de carinan dixwendin. Bi derketina kovara *Tirêjê* re -ku yekem kovara xwerû bi kurdî bû li Bakur- helbestên min hatin weşandin. Ji wê rojê û vir ve ye em her du dilkovan û sêwî (ez û ziman) serê xwe datînin ser yek balgiyê.

*Bi we, helbesta me ya îro, ku bi vê kurmançiya me ya îro tê nivîsandin, dikare peyamên xwe bigihîne çinên civaka kurd?*

## REWŞEN-NAME

Kêşeyeke me ya herî mezin jî ev e. Kurmanciya me ya ku em bi kar tînin ji ya ku gel bi kar tîne hişkîr e. Ne rewan û şayîk e. Giyanê wê nekemiliye. Ji ber ku kes ji me bi zimanê xwe perwerde nebûye. Zimanê mêtîngeran, ku em bi salan pê perwerde bûn, bandoreke neyînî li ser hiş û mêjiyê me kir. Ji ber van sedeman, divê heta ji me were em têkiliya xwe û gel xurt bikin û jiyana xwe li ser vê bîngê saz bikin. Ger em berê xwe bidin kelepûra xwe û xwe bispêrin wan, bi ya min di demeke kin de dê ev kêşe ji holê rabe. Ji bo destpêkê dîsa jî ne ew çend xirab e.

*Di mijara kelepûra çandî de, hûn gencîneya kurdan û ya dinyayê çawa dinirxînin? Di helbesta kurdî û ya dinyayê de, kes û serdemên ku hûn xwe dispêrinê çi ne û kî ne?*

Çanda kurdan ne ji yên gelên dinyayê qelstir e. Hê di sedsala 16'an de hunermendên kurdan berhemên wisa afirandine ku serî li pêşiya cîhanê digirin. Nemir Ehmedê Xanî yek ji van kesan e. Dema ku mirov şahkarê wî *Mem û Zînê* dixwîne, mirov hem serbilind dibe û hem jî wek neviyekî wî xwe berpirsiyar dibîne ku li wêjeyê sor bibe. Hêzeke darî çavan dide mirov. Dîsa Feqiyê Teyran ez dikarim bibêjim bîngêha wêje û bîrdoza çîna bindestan damezîrandiye. Melayê Cizîrî romantîzma kurdan ava kiriye. Cegerxwîn di nava hevçaxên xwe de, bi helbestkarî û siyasatmedariya xwe yê herî berbiçav e. Ango, çand û kelepûra me hem ji aliyê naverokê ve û hem jî bi estetîzma xwe ne ji ya cîhanê kêmtir e. Helbet jiyana kurdan a nexwezayî, zîlm û stemkariya li ser wan ji bo geşedana çanda me bandoreke neyînî kiriye. Her dem li ber pênuş û zimanê wan bend û kosp hatine danîn. Lê kurdan riya vê jî dîtiye û çanda xwe ya devkî gelekî bi pêş xistiye. Nexwestiye xwe ji çanda cîhanê veqetîne.


Feqiyê Teyran bi realîzm û pêşbîniya xwe, Melayê Cizîrî bi romantîzma xwe, Ehmedê Xanî bi felsefe û estetîzma xwe gelekî bandor li min kiriye û hê jî dixwazim bi kûrahî berhemên wan bixwînim û sûdê ji wan wergirim. Dema ku em bîn ser serdem û nivîskarên cîhanê, serdema dawîya sedsala 19'an û helbestkarên wê demê, ku bîngêha gelek ekolan saz kirine, ji wan kesan Louis Aragon, Baudelaire, Rimbaud, Paul Eluard, Nerûda, Mayakovski, Attila Jozef, Nazım Hikmet, Ahmed Arif, bêtirîn jî romantîzm û realîzma fransîzan bandor li min dike.

*Pirsa 'kelepûr'ê rasterê girêdayî wê têkiliyê ye ku di navbera mirî û zindiyên rabirdûyê û îroyê de ye. Ez bi xwe lept û livandinên 'nîşkekî nû' hest dikim û dibêjim, "zindiyê dawî" yê beriya me Cegerxwîn bû. Li gorî we, Cegerxwîn û siya ku wî bi helbesta xwe li ser me pêkaniye çi qas rast û durist hatiye hêlsengandin?*

Belê, Nemir Cegerxwîn mînaka wêjeya kurdî ya hemdem e. Dema ku em bîn ser pirsra we, bi ya min, me heta niha gelek sûd jê werne-girtiye. Dibe ku me bi seresere berhemên wî xwendibin, lê ez dibêjim,

hê me felsefe, estetîzm û zimanê wî yê ku ji jiyana rojane ya gel pêkaniye di xwe de bi cî nekiriye, ango me ji xwe re nekiriye rêbaza vegotinê. Bi ya min, em tev her çend dibêjin, me sûdeke baş jê wergirtiye jî, berhemên me duri gotinên me ne. Ez nabêjim, rasterast em ferhenga wî bi kar bînin, na! Lê em rêbaza vegotina wî (ji aliyê mijarê ve) ji xwe re bikin bîngêh, ew ê riya vegotîneke rewan û kurdewarî li me veke. Wekî din, me hê cîyê xwe hilnebijartiye ka em ji bo kê û çima dinivîsin? Ji ber wê yekê lingê me erd nagire.





*Hêmasaziya helbesta me ya îro di hundirê xwe de şop û nişaneyên hêmayên zimanê dagirkeran nahewîne gelo? Heke wisa be, hûn vê arîşeyê çawa çareser dikin?*

Mixabin heta demekê ev şop û nişaneyên zimanê dagirkeran wê hebin. Divê em binhişiya zimanê xwe paqij bikin û wê valahiyê bi zimanê xwe tijî bikin, ew jî encax bi jiyanê kurdewarî û tîkiliyêke dilsozane û kedeke evîndarî bi gel re divê. Birêz Rodî Zerya di hevpeyvîneke xwe de gotibû "Em beravêtîyên vî zimanî ne. Ango, em

ne kurd in, ne jî kesekî din; em jî nizanin em çi ne." Bi ya min, ev tespîteke li cî ye. Bi zimanekî qedexebûyî û jiyanê neşiruştî mirov nikare tu serkeftinên berbiçav biafirîne û bi dest bixe. Ez bi xwe, heta ji min tê, xwe dispêrim zarokatiya xwe û zimanê wê demê, ango zimanê rojane yê gel. Ev helwest hinekî bar li min sivik dike. Rê dide ku bêhna xwe bidim û bistînim. Dîsa berhemên bi zimanê kurdî li ser jîyan û çanda kurdan û bêtîrîn kilam û heyranok, payîzok hwd..

*Eşkere ye, digel hemû kêmasiyên xwe yên siruştî, ku dê gav bi gav çareser bibin, helbesta me ya îro bêzariyêke civakî bi rêk dixê. Gelo rê û derfet hene ku ev helbest ala pêşengiya girseyê bike? Ji ber ku rola ku Rimbaud, Yeats, Neruda û Mehmûd Derwêş li helbestê bar kiriye tê bîra min...*

Ez îro di vî warî de çirûskeke wisa nabînim. Sedemên vê ne bi tenê helbestkar û nivîskar in. Gel, sazî û siyasetên me jî hê ne amade ne ji bo vê çendê. Jiyan me kurdan çi carî bi rêk û pêk nebûye. Nemaze di van salên dawî de serobino bû. Kurd mîna saçmeyên tivingê ji hev belawela bûn û pijiqîn. Jiyan hem di warê siyasetê de û hem jî de warê aboriyê de tîk çû. Heta jiyanêke bi rêk û pêk pêk neyê, dê ev xewna me nîvco bimîne. Helbestkarên me, hema bibêje, ji sedî sed karmend in. Nikarin dema xwe ji bo nivîsandinê bi tîra xwe terxan bikin. Aborî li ber wan barekî giran e. Saziyên me yên çandî, civakî çi nîrx û rûmetê nadin zimên û yên ku bi vî zimanî dinivîsin. Siyasetên me dixwazin nivîskaran ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin. Berevajî, gere rê û derfetan ji wan re çar bikin. Nivîskarên me hê nebûne xwediyên saziyekê an jî berpirsiyarekî. Ev astengî û kêmasî tev de dibin sedema qels bûna nivîskêr û berhemên wî. Wa tu bi xwe dibînî û dijîyî malkambaxiya wêjevanên me û bextreşîya wan. Dema merc û civak ev bin, wê Rimbaudê me çawa çêbe?!

*Tevî ku hest pê dikim ev pîrs pîrseke zû ye, lê ez ê dîsa jî bipîrsim. Li Bakur, zimanê xortên ku piştî Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrican, Reşîdê Kurd, Rojen Barnas, Arjen Arî, Ehmed Huseynî û Berken Bereh rabûne sext e, an sexte ye?*

Kereseya wêjeyê ziman e. Ziman jî, ji deng û

## REWŞEN-NAME


peyvan pêk hatiye. Hunermend bi peyvan hest û dilînên xwe vedibêje. Peyv jî, mîna hemû giyanberan bi siruştê re di têkiliyê de ye. Qewimîn û bûyer li ser giyanên wan jî bandorên xwe dikin. Hinek ji peyvan dimirin, hinekên din dizên. Ger hunermend giyanê peyvê bizanibe, pê hisiyabe, dikare wê ji xwe re bi kar bîne. An na, peyvên ku hatine cem hev wê li hev nekin û wê hêma, an jî wateyê baş pêk neyê. Wekî din, zimanê me bi sedan salan e hatiye qedexekirin. Vê yekê rê nedaye ku li Bakur ziman bi pêş bikeve û ji bo wêjeyê bistewe. Ziman hê zeviyeke beyar e li Bakur. Di zimanê me tevan de, hişkiyek heye, ev tiştêkî asayî ye. Heta demekê wê wisa be. Dema ku ziman bi aramiya zîvkerekî bi destê wêjevanan hate sûrandin, hingê ev hişkayî wê ji holê rabe.

*Bajar û bajarîbûn pirsên risteyên we ne. Hûn têkiliyên civakî yên civaka me çi qas bi pîvanên bajarîbûneke rêkûpêk re diguncînin? Bo nimûne, kurmanciya me (an jî şewaza ku hûn ava dikin) têra derevekirin û vegotina van têkiliyên me yên şetane dikin, an na?*

Bajar û bajarîbûn remza şaristanî û nûjeniyê

ye. Di jiyana mirovahiyê de, asta herî bilind a serdema netewebûyîne ye. Li Ewrûpayê, bi bajarîbûnê re civakê di her warî de pêşketineke mezin bi dest xist. Di qada perwerdehî, karbeşî, huner û hilberînê de gavine balkêş hatin avêtin. Çînên nû, takekesên azad derketin holê. Mixabin li erdnîgariya me, ji ber sedemên ku li jorê jî min derbiribû, berevajî vê yekê, bajarvanî nebû destpêka şaristanî û netewebûyîne. Gundiyên me ji neçariyê hatin bajarên. Jixwe bajarên me jî niv-bajar bûn. Zilm û zora li ser bajar û bajarîyên me her ku diçe dibe sedema têkçûyîna çand û kelepûra me. Gel ji zimanê xwe, ji xwe, ji dab û nêrîtên xwe bi dûr dikeve. Civak her ku diçe ji hev belawela dibe. Pîvanga têkiliyên civakê tén guhertin. Navgîn û alavên nû derdikevin holê. Dema ku em bèn ser gotina we, îroroj zimanê me têra vê vegotinê dike, lê divê ziman jî xwe nû bike. Lew re li bajarên livbazîyek heye, her roj tiştine nû derdikevin

*Ez bi xwe ji zû de ye pê hisiyame -mixabin-wêjeya me ya parçeyê bakur ê Kurdistanê ji kelepûra xwendinên bi tirkî aş dibe.*



*Nêzîktêdayîna we ya li wergerê bi çi awayî ye? Berhemên ku heya niha bo kurdî hatine wergerandin bi kurdî binirxînin, çawa ye?*

Wergerandina berhemên nivîskarên bi nav û deng ên dinyayê ji bo me wê gelekî baş bibe. Lê divê wergêr jêhatî û zîrek be, ango ziman û wêjeya wî gelî baş bizanibe. Di wergerandina berhemê de pir baldar bibe. Mixabin ji bilî çend mînakên, wergêr bi mantiqa zimanê tirkî berhem wergerandiye. Ev li ber geşedana me û zimanê me dibe kelem û asteng. Dixwazim li vir mînekeke baş bidim ji bo wergerê. Pirtûka we ya wergerandî ya William Butler Yeats a bi navê *Mirin Niquî Dilê Firokevanekî Îrlandî* ji bo wergerê mînekeke baş e. Min bi xwe tam û çêja zimanê me tê de dît.

*Saziyên kurdan ên li Bakur di warê zimanê kurdî de nîn in, yên heyî -di sêrî de yên çandî-berbad û têkçûyî ne. Em diçin ber çêr, çem dîmîçiqe. Wek helbestkarekî kurd, gelo hûn di maweyeke nêzîk de çareserîya vê yekê dibînin? Pêşniyarên we çi ne?*

Ger em Înstîtûya Kurdî daynin aliyekî, gotinên we di cî de ne. Her çi qas van saziyan tiştine baş jî kiribin, bi ya min, barê li ser xwe sivik nekirine. Berî her tiştî, divê li van saziyan zimanê desthilatdar zimanê me be. Ji bo lêkoler derfetan çêbikin, nîrx û rûmetê bidin kesên berhemdar. Rêveberiyên wan saziyan divê ji kesên hunermend pêkwerin û komên mîna felsefe, ziman, huner werin amadekirin û bi kolektîfî bixebitin. Divê em bi çavên siyasetê li saziyên çandê neni-hêrin.

*Wê rola Rewşen-nameya ku piştî Jiyana Rewşenê xwe avêt gorepana wêjeya me di nava mîrateya kurdî de çi bibe? Hûn wekî nivîskarekî vê kovarê, ji kovara xwe çi hêvî dikin?*

**Jiyana Rewşen** li bakurê welêt kovara herî bitemen û di weşangeriyê de rikdar e. Bi salan ji bo me bû dergeh û mêrga wêjeyê. Me xwe li wir perwerde kir, tîna xwe şikênand, hêrsa xwe têkber û xewn û xeyalên xwe ragihand hogirên xwe û neteweya xwe. Wê xêşîmiya me pîne kir, asoya afirandin û jîrtiya me xemiland. Bû stûna paşero-

jê û pireya di navbera me û gelê me de. Ji îro pê de hêvîdar im ku wê deriyê vî dergehî her tim vekirî bimîne. Bi saya **Jiyana Rewşenê** bi dehan xort û keçên me dest avêtin pênûsê û bi zimanê xwe yê şêrîn derzên dilê me seyandin.

Em di ajneberiya zimanê xwe de ghiştin qon-axeke. Ango, em bi şêrîni û hêza zimanê xwe hisiyân. Lê hewcedariya me bi têgihan heye. Divê **Jiyana Rewşen** bêtir berê xwe bide zelalkirina van têgihan. Li ser kêşeyên wêjeya me dosyeyan (li ser ziman, hêma, teşe, naverok hwd.) amade bike. Zimanekî yekser û hevgerî biparêze. Deriyê xwe ji pênûsên nû re veke ♦

du helbest ji

şêxmûs sefer

**Neçar**

Dikarim xwe çem û çem berradim  
vê êvarê

Li kîjan tahtê bikevim  
Pê re parçeyek ji xwe bihêlim

Parsekekî nanê tisî bîm carcaran

Û qereçiyekî konê reş

Diranzerî

Bi hêsrên xwe

Xwe bifetisînim

Bi kenê xwe

Rojê şa bikim

Lê ne taht li ber min dikevin

Ne jî roj bi xelasiya min tîn

**Peyzaj**

Bihareke din kete emrê min

Bê pirsîn û bê teşqe

Her sibe bi dengê çûkan hişyar dibim

Û bi xuşexuşa Mûnzûr diterqim

# Ji ser kela Mêrdînê

Çiya Mazî

li ser pozê Kela Mêrdînê  
bi seqema bayê başûrî  
diricifim bi tava bakurf  
li hemberî min beriyek.  
Behr e...  
Reş û zer e...  
Di nava dixanê de  
Qamişlo, Girê Mozan  
hesreta Helîm Yûsiv  
û toza Amûda Ehmed Huseynî  
hê jî dinihêrim  
li aliyê çepê  
ji Bagok heta Zaxoka min  
li aliyê rastê titûna Xursê  
çiyayên Mazî  
û birêçûna rojekê  
ya min û Cihan Rojê lawikê serhedî  
di nava lehiya berfê de.  
Diricifinin bedena min.  
Belê berîka Mêrdînê...  
Dinihêrim, dinihêrim  
dawî nayê li zeriya te.  
Gelo te ev firehî  
ev heybet ji kû aniye?  
Ez li ser pozê kela te.  
Ez li ser bilindahiya xaka xwe  
Dûûr dinihêrim, hûr difikirim.  
Li Omeriyan... Zinarê Surgiçiyân  
Lê...  
Ji pêş çavê min naçe  
"Ne mutlu..." Em Şêxbizor in.  
Gelo çi wextê hatin nivîsandin  
ev bêyomî  
gelo çi wextê ez hatim  
û çi wextê ew...  
ji min standin  
şabûna min.  
Ka bêje Kela Mêrdînê  
kîjan demê ez û hesretiyên xwe  
li bin siya te bîn ba hev  
û tu bibêjî  
ez ya we me  
hûn ya min in.

# x e n ç e r

yaşar kemal

**T**ava sincirî ya li ser serê gir siya wî wekî gilovereke tarî li ber piyên wî radixe û her ku pê lê dikir, piyên wî heta gûzekê di toza sincirî ya li ser rê re diçûn xwarê.

Ser û bin di nava tozê de mabû û xwêdana ku di stûyê wî re dinizilî li nava tozê ketibû, bûbû herî. Goşeyê destmala ku di serê xwe de girêdabû xistibû nava diranên xwe, dicût û her du destên xwe li ba dikir, xwe bi xwe re dipeyivî.

Di demeke ku xwe bi pêş ve xûz kiribû û toz bi çar aliyên xwe ve didêrand û bi lez dimeşiya, ji nişkê ve sekini. Goşeyê destmala di devê xwe de bi hêrs gez kir. Dê tûka xwe bavêta, devê wî çila bûbû û zimanê wî bi esmanê devê wî ve zeliqîbû.

"Ez" got, "ez ê nişanê wî bidim. Ma ez ew meriv im ku diziyê bikim? Di dawiya vî karî de mirin heye."

Hêz da rêveçûna xwe. Êdî haya wî ji toza ku piyên wî dişewitand jî nemabû. Paşê çî qewimî nayê zanîn, ji ser rê derket û berê xwe da nava zeviyê.

Sap di binê piyên wî de dikirin çitînî. Li dûr, makîneyeke bêderan bi teqereq dişixwilî û dijûnên paleyan dihatin bihîstin. Bêyî ku lê warqile di ber makîneya bêderan re derbas bû, çû.

Çavên wî kuskusîbûn; rûyê wî yê biçûçik biçûktir û reştir bûbû. Qermîçekên eniya wî jî bi heriyê hatibûn dagirtin.

Erda ku li ser dimeşiya qelişibû, terk wekî mala pîrikê şax şax li her derê belav bûbûn. Piyekî wî ket qeliştekekê, li ba ket. Gelekî êşiya. Ji ber êşê di ciyê xwe de çok veda. Axê goştê wî wekî hesinê sincirî dax kir. Êşa şewatê... Êşa axê... Ji nişkê ve çindik da... Gavekê bi şaşwazî nihêrî. Paşê ji erdê rahişte qevdek sapên hişk û

dest bi cûtinê kir. Her ku dicût, devê wî çila dibû û dixewirî. Ê di devê xwe de tif kir. Paşê rahişte qevdekî din.

Bi ser de jî wisa westiyabû... Dihejiya, ber bi kêlekê ve dilewlibî.

Got tep û sekini. Şaşomaşo bû.

Çi dibû, bi kû ve diçû? Pê re hat bîra wî: "Bênamûsê nemerî", got bi hêrs. "bi te bikim, ez ê bi te bikim. Bizanibe lo, di dawiya vî karî de mirin heye. Ez ew meriv im ku diziyê bikim? Ev qas sal e li Çiqûrovayê me, ez bi namûsa xwe dixebitim." Paşê dîsa xwe da ser behra êqil. Tavê mêjiyê wî dikeland.

Wê rojê heta esrê, kesên ku di riya hember re derbas dibûn, di nava zeviyê de, li ber tavê. Li deşta dûz î bêpîvan, wekî hesîreke şewqdar î heta ku dihat fesilandin raxistî, mirovekî ku xwe bi pêş ve tewandibû û bê lept û liv rawestiyabû, didîtin.

Çavên mêrik girtî... Li binê dareke gûzê, zarokê sê salî diranên wî çilspî, dikene û bi çar-lepkî diçe... Zarok bi kêf xwe davêje stûyê diya xwe. Xwêdanê di ser zarok re avêtiye. Ji serçavên wî xwêdan dinizile. Kurtikê zarok qetiyaye, zarok digirî... Her ji ber çî be nayê zanîn, bê rawestan digirî. Paşê jinika ciwan ji zeviyê vedigere. Lêvên wê terikîne. Dayika pîr, porspî... Bi kêleka xwe digire û tiştinan dibêje... Terk li destên dayikê ketine... Dest di nava germa Çiqûrovayê re, ku bi hezar şewq û şemalî li ba dibe, dirêj dibin.

Bi hemû hêza xwe diranên xwe şidand:

"Bênamûs... Ez ê nişanî te bidim... Min dizî kiriye ha! Min nivê şevê pembûyê Miherem Axa diziyê, wisa ha? Tu yê min ji kar bavêjî?"

Bayê xerbî nermenerm dest bi wezanê kir.



## REWŞEN-NAME

Siya wî ber bi rohilatî ve bi qasî qamekê dirêj bûbû. Ta li başûr, li ser serê Deryaya Spî telpên ewrên spî bilind dibûn.

Piçekî lebitî. Paşê lingek avêt û sekinî. Bi dû re bi lez dest bi meşê kir.

Ji nava zeviyê derbasî ser riya bitoz bû. Li pêşiya wî mirovek bi rê ve diçû. Çavên xwe kuskusand, nihêrî. Ji ber ku êdî tarî dikete derdorê, kir nekir çavên wî kesê, ku li pêşiyê bi rê ve diçû nebiri.

Gavên xwe vekir. Gihîşt yê ku li pêşiyê bi rê ve diçû:

"Hişt lo!.."

Ê din zivirî.

Kêfxweş bû:

"Elî lo, tu yî?"

Elî rawestiya:

"Ew tiştê ku te kir baş nebû Huseyn."

Huseyn: "Min...", got "Ji rikê serpalê ve min ew tişt kir."

Elî: "Di heqê te de axift... çî hat ber devê wî got. Got diz. Got bênamûs. Got ev mirov in ku rûmeta palyan dîkin pênc qurîş. Çî dizanim ez... Got lawê... Diviya te ev tişt nekira, te xwe nehetikanda."

Huseyn: "Wî çêr kir?", got.

Elî:

"Belaya xwe ji min veke. Ez wê nizamim."

"Çawa tu nizanî?"

"Nizamim..."

"Çêr nekir?"

"Nizamim."

"Wekî din çî got?"

"Nizamim."

"Got, ez bi jina wî re razame, wisa ha?"

"Nizamim, lê ew mirov gelekî bênamûs e."

"Yanî got, razame!"

"Ew mirovekî gelekî bênamûs e"

"Yanî bidî sed kesî wisa got ha?"

"Ew nemerdek e."

"Way min di dê û jina wî! Wisa ha?"

Elî.

"Di hemû Çiqûrovayê de, mirovekî ji wî bênamûstir peyda nabe. Ne serpale ye, celadê palyan e. Kûçikê axayan û neyarê palyan e... Wî çewalek pembûyê te di nava ew qas palyayî de nişanî axa nedaya, tu rezil û ruswa nekirayî nedibû qey? Tahdeyiyê li her kesî dike. Kesek ji heqê wî demeket. Kesê ku mêr be, tiştêkî wiha bibîne

jî, xwe lê danayne. Yek jî..."

Huseyn bi milê Elî girt û ew da sekinandin. Çavên xwe yên ku bûbûn wek tasa xwîne, wekî ku qul bike, kuta çavên wî:

"Bibêj lo," got, "got, ez bi jina wî re razame?"

Elî guh nedayê:

"Ji kû dizanim..."

Ji nişkê ve xençer di destê Huseyn de çirûsî.

"Bibêj lo," got "bibêj!"

Elî lêv lê bada:

"Tu ji dêvla ku vê xençerê li min dikişîm!..."

Huseyn Elî bi hêrs dahf da û bi paş ve zivirî.

Baz dida, di nav zeviyên re, di nava deviyên re derbas dibû, bêhna wî diçikiya û radiwestiya, paşê dîsa dibeziya. Çimên wî di nava xwîne de mabûn.

Yek caran telpekî ewr rûyê heyvê digirt, her ku ewr dihat, dilê Huseyn dikir gurmîni.

Huseyn di tariya deviyê reş de deverû dirêjbûyî, xençera di destê xwe de dişidîne, diricife û bi hemû hêza xwe tevzînokan dide xwe.

Heyv ber bi çiyayên roava ve dageriya. Çavên Huseyn li çiyayên tarî yên li hember û li heyva gir a li esmên e. Heyv nedîçû ava.

Piçekî li pêş, li ser bêderan pale ji zû ve ketibûn xewê.

Ji palyan bi wê de, li aliyê rast ê bêderê, cimêlîka serpalê bi bayê ku nermenerm diweziya hedî hedî li ba dibû.

Heyv li ser serê çiyê rûniştibû. Huseyn bi qevda xençerê girtibû... Wekî ku bi firê bikeve...

Heyv diçe ava.

Bi gotinê re heyv çû ava. Huseyn diqilqile û ricafek...

Huseyn deverû ber bi cimêlîkê ve diçe. Bêhn jî nade û nastîne.

Hêdîka xwe li kêleka cimêlîkê dirêj kir. Ê di hundirê cimêlîkê de bi xem dike xirînî û di ber xwe de dibelîne.

Huseyn li tariya cimêlîkê xwe seranser dirêj kiriye... Ê din dike xirînî û di nava ciyan de dizivire... Di zenda destê Huseyn a ku bi xençerê girtiye de çîkek... Zend wekî ku bikeve... Dengê dilê wî bi teqereq e. Huseyn ji teqereqê bizdiya.

Piçek li pêş reşek tevdigere...

Huseyn bi xişim xençer di xweliyê de çik kir, pekiya.

Bi terpeterp ber bi gund ve dibeziya ♦

**Werger: Mehmet Dicle**

# biyanîbûna min

Dînoyê Gurî

Ji dîwarê odeka min  
wêneyê hêviyê:  
"Zeryayeke aram û bêhempa,  
kelekeke bibabirek, sê zarok  
û asoya bêsînor."  
Ji dîmenên dora min;  
alozî, bêhna mêjjiyê kurmî  
bazirganiya hestan  
wêneyê mirinê...  
evîn û evîndarên qelp,  
bişirîna wan a qelp.

Wekî her zarokî  
li vî welatî  
berdêla mezinbûna bilez didim.  
bûn şerab hestên min,  
şarezayekî li dilê min kon vegirtiye.  
Çi ye?  
Gelo... ma asoya evîne bi dawî dibe?

Di tixûbê xwe,  
ez bûme wek penaberekî  
geh li te digirim, geh li xwe  
li vê xaka qedîm,  
geh li welatê neçar digirim  
geh li çavên te yên şermok.

## şeytanê pîr

pearl s(ydenstricker) buck

**P**îrika Wang bê guman dizanibû ku şerek hebû. Ji mêj ve bû her kes pê beled bû şerekî ku didomiya hebû û japonan çîni dikuştin. Lê hê jî tişteki rast û ji bilî salixan tunebû. Lew re tu kesê ji malbata Wang nehatibû kuştin. Gundê “Sê Mîl Wang” ê li ser qeraxa çemê zer, ku gundê qebileya pîrika Wang bû, tu bêji japonek jî nedîtibûn. Ji ber vê yekê, hiç qala japonan nekiribûn.

Êvareke destpêka havînê bû, Pîrika Wang, piştî ku şîva xwe xwar, ji pêlekane bendavê hilkişiya, wekî ku her roj dikir, ji bo ku bibîne bê ka çem çî qas bilind bûye. Ew ji japonan bêtir ji çem ditirsiya. Wê dizanibû çem dikaribû çî bikiira. Û yek bi yek gundiyan da pey wê heya ser bendavê, tev sekinîn û li ava xêrnexwaz a zer ku mîna bê qam marên xwe vedigevizandin û li kêlekên bendava bilind dixist, temaşe kirin.

“Min hiç ev ew qas zû bilind bibe nedîtibû”, got Pîrika Wangê. Li ser kursiya ji dara bambûyê ya ku neviyê wê, berazê biçûk, ji bo wê anîbû, rûnişt û tif kire nava avê.

“Ev ji japonan xerabtir e, ev çemê şeytan î pîr,” got berazê biçûk bê hemdê xwe.

“Ehmeq” Pîrika Wangê bi lezgîni got.

“Yezdanê çem dê te bibihîze. Behsa tişteki din bike.”

Wisa, axaftina di barê japonan de domandin... Bo nimûne, gava ku çav bi wan bikevin, dê çawa bizanin ew japon in? Nanpêjê zirnevîyê Pîrika Wangê pirsîyarî wê kir.

Pîrika Wangê di vê mijarê de bersiveke erênî da. “Hûn ê wan nas bikin. Carekê min biyaniyek

dît. Ew ji sivinga mala min bilindtir bû. Porê wî rengê heriyê dida, rengê çavên wî mîna yên masiyan bû. Her kesê ku dirûvê me pê nekeve japon e.”

Hemûyan li wê guhdarî kir, ji ber ku ew jina herî pîr a di gund de bû û her tiştta ku wê digot ciyek digirt.

Hingê Berazê Biçûk bi terzê xwe yê şaşmatî axift, “Tu nikarî wan bibîni pîrê. Ew li esmên, di hundirê balafiran de xwe vedişêrin.”

Pîrika Wangê yekser bersiv nedayê. Jixwe carekê erênî xeber dabû. “Heya ku nebînim, bawerîya xwe bi balafiran naynim.” Lê gelek tiştên ku wê bawer nekiribû rast derketibûn. -Keybanû, wekî mînak, bawer nekiribû miriye, miribû.

Komar dîsa wisa, jê bawer nedikir, lew re nedizanî çî ka çî tişt e. Hê jî nizane, lê ew demeke dirêj e ku dibêjin Komarek heye. Û hingê bi tenê bê deng û his li bendavê nihêrî, ciyê ku tev li dora wê rûniştibûn. Pir hênik û xweş bû. Û tu tişt xema wê nebû, eger bi tenê çem raneba û nefîlitiya.

“Ez ji japonan bawer nakim” wê rasterast got. Hinek pê kenîyan, lê tu kes neaxift. Yekê qelûna xwe vexist -ew jina berazê biçûk bû, ku qelûn di ser her tiştî re digirt. Kîşand.

“Bistrê berazê biçûk!” yekî bang lê kir.

Wisa berazê biçûk dest bi strandina straneke berê kir, bi dengê hêl û lertzokî. Pîrika Wangê lê guhdarî kir, japon ji bîra wê çûn.

Êvar xweş bû, esman ew çend paqij û sayî bû, ku bîşengên li ser piyê bendavê dahêliyabûn, di nava ava şêlî de jî sî didan. Her tişt di nava aramiyê de bû. Sî malên ku gund pêk dianîn li

binê wan rêz dibûn. Tu tiştî nema dikarî vê aramiyê xera bike. Çi qas be, japon jî bi tenê mirov bûn.

“Ez jî wan balafiran şikbar im,” wê bi awayekî nerm gote berazê biçûk, gava ku wî stran qedand. Bes berazê biçûk, bêyî ku bersivê bidiyê, bi straneke din domand.

Di hemû salên ku hatin û çûn de, wê êvarên havînê wekî niha li ser bendavê derbas kir. Cara yekem hivdeh salî bû, hê bûk bû, mêrê wê jê re qîriyabû, da ku jî malê derkeve, were ser bendavê. Hatibû, jî şermê sorbûyî destên xwe dabû hev, da ku xwe di nava jinan de veşêre, tevî ku mêran kirê wê dianîn û henek pê dikirin. Dîsa jî wan jî wê hez kiribû.

“Tîkeyek goştê xweş di tasa te de ye” wisa gotibûne mêrê wê. “Pê, piçekî mezin in” wî ne bi dilê xwe bersiv dabû. Bes wê dikaribû bibîne ku ew jê kêfxweş bû û wisa bi hêdî şerma wê rabû.

Ew mêrê xizan di lehiyekê de roda çûbû, hê xort bû. Wê bi salan li peristgehên bûdîstan dua ji bo wî kir. Dawiyê li vî tiştî danavî bû. Di ser re zarok û zevî mabû di stûyê wê de, dema ku keşe bi zimanê hilû gotê, “deh heb zîvên din bide, hingê dê ruhê mêrê te bi temamî rizgar bibe”. Wê jî keşe pirs kir, “Ma kê dera wî tê de maye?”

“Bi tenê milê wî yê rastê” keşe got û dil kir ku wê bihewisîne. Hingê sebra wê nema. Deh dolar! Wê seranserê zivistanekê ew têr bikira. Bi ser de jî, diviya ji bo para xwe ya temîrkirina bendavê karker bigirta. wisa lehî ranedibû êdî. “Heke bi tenê milek mabe, dikare xwe bikişîne derve!” wê bi tundî got.

Gelek caran mereq kiribû bê ka mêrê xizan î bêhiş ev tişt kariye. Ew qas nebe jî, carcaran bi şev bi dilkeserî difikirî ku ev li vê derê hê jî sekiniye û li hêviya wê ye ku tişteki bike. Ew mirovekî wiha bû. Erê, dibe ku rojekê, dema ku jina berazê biçûk zaroka xwe ya yekem bi ewlehî bîne û hinek jî zêde pereyê wê hebe, dikare bi şûn de here Erafê, wî xelas bike. Her çi qas tişteki lezê tunebû...

“Dapîrê, divê tu herî hundir,” dengê jina berazê biçûk ê nerm got. “Bi çaxa ku roj diqulibe re xumam ji çem radibe.”

“Erê, ez bawer im divê biçim” Pîrika Wangê pejirand -Qasekê li çem nihêrî. Ew çem -tîjî pakî û nepakî bû, bi hev re. Dema ku dihate zeftkirin, vê zevî av dida, lê heke inçek ji jorê re bidanayê,

wê hingê mîna ziyayekî dikire barebar diherikî. Mêrê wê bi vî awayî roda çûbû. Bala xwe nedida aliyê bendavê yê bi para wî diket. Her car wê biçûya ew selih bikira, her car wê biçûya hinek ax tîjî ser bikira û pişt re jî şevêkê çem rabû, di ser bendavê re avêt. Mêrê wê jî malê reviyabû, ew bi zaroka xwe re hilkişiyabû ser bêt. Her wiha vê mêrê wê roda biribû. Belê, cardin çem dahf dabûn pişt bendavê û vê carê li ciyê xwe mabû. Her roj ew bi xwe li qeraxa çem diçû dihat, her çi qas gund tev li wê karê dinihêrî û jê berpirsiyar bû. Mêr dikeniyar digotin, “Heke tişteki xerab li bendavê çêbibe, Granny ê jî me re bibêje.”

Tu carî kesekî bir nebîr ku gund jî çem dîr bibe. Malbatên Wangê bi nifşan li wê derê jiyan, hinek her dem jî lehiyan reviyar, her wiha bi çem re şerên dijwar kirin.

Berazê biçûk jî nişkê ve strandin hişt.

“Heyv quloz dibe” wî kire qîr. “Ew ne baş e. Balafir di şevên heyveronê de derdikevin.”

“Tu wan tiştên di heqê balafiran de tev jî kû hîn dibî?” Pîrika Wangê jê pirsî.

“Ew min bêzar dîke,” wê wisa bi tundî domand, ku tu kes neaxift. Di vê bédengiyê de, girte milê jina berazê biçûk û di pêlekane jî axê ku ber bi gund ve dirêj dibûn re dakete xwarê, bi destê xwe yê din qelûna xwe ya dirêj wekî gopalekî digirt. Piştî wê, gundî peya bûn, yek bi yek çûn razanê. Tu kes beriya wê jî ci neliviya, lê tu kes jî piştî wê nema li wê derê. Ê dawiyê di nava nivînen xwe de, li binê perdeyên şîn î pembû yên ji bo pêşûyan, ku jina berazê biçûk saxlem dirûtibû, kete xeweke xweş.

Qedera ku di heqê japonan fikirîbû û mereq dikir bê ka çima dixwestin şer bikin, hinekî hişyar mabû. Bi tenê mirovên pir bedxwaz şer dixwestin. Di mējiyê xwe de mirovê xerab î qeraxê dît. Heke bihatana, diviya yek li ber wan bigeriya, ew gazî çayvexwarinê bikirana, wisa fikirî, jî wan re bi mantiqî rave bikira, -çi ka çima hatibûn gundekî aşfîxwaz ê cotkaran?..

Her wisa wê amadekariya xwe ya dawîn nekiribû, gava ku jina berazê biçûk qîriyabû ji wî re, ku japon hatibûn. Li ser nivînan rûniştibû, dikire bilmebilm “Çaydanka çayê -çaydanka-”

“Dapîrê, wext tune” jina berazê biçûk qîriya. “Ew li vir in, li vir in!”

“Li kû?” Pîrika Wang qîriya, hê hişyarnebûyî.

“Li esmên” jina berazê biçûk bang kir.

## REWSËN-NAME

Reviyabûn ber bi berbanga sayî, mêze dikirin. Li wê derê tiştên di şiklê çivîkan de, mezin û wekî qazên payîzê yên beyanî ku difirin hebûn.

"Bes ew çi ne?" Pîrika Wang qîriya. Pişt re wekî ku hêkeke zîv bikeve tişteke ber bi jêrê ve çû, li zeviyeke li dûrî gund ket. Xwelî ji erdê quloz bû, tev reviyana ku wî tiştî bibînin.

Quleke si gav vebûbû, bi qasî liçekê mezin bû. Ew qas ecêb mabûn ku ziman li wan nedigeriya. Paşê, beriya ku kesek tişteki bibêje, yeke din û yeke din, hêk li ser hev barîn, her kes reviya...

Her kes, ji bilî Pîrika Wangê. Gava ku jina berazê biçûk bi destê wê girt da ku wî kaş bike, Pîrika Wangê xwe kişand, li pala bendavê rûnişt.

"Ez nikarim bazdim" wê got. "Ev heftê sal in ku ez nereviyame, ji roja ku piyên min hatin girêdan heya niha, tu bidomîne, ka berazê biçûk?" Ew ji zû ve çûbû. "Mîna bapîrê xwe" wê got. "Her tim di revê de ye yekemîn e."

Lê jina berazê biçûk ew bernedida, heya ku Pîrika Wangê jê re got ku ew peywira wê ye.

"Heke berazê biçûk miribe" wê got "Hingê divê tu zaroka wî bînî dinê." Çaxa ku jinik dîsa jî neçû, wê hêdika bi qelûna xwe lê xist, "Heydê, here!" wê kire qîr.

Wîsa, nerazîbûyî, lew re êdî wan ji ber guregura balafirên ku dadiketî hev nedibihîstî. Jina berazê biçûk bi yên din re çû.

Heya hingê, her çi qas çend deqe derbas bûbûn, gund bûbû kavi û serbanên qirşik û kutekên dar dişewitîn. Her kes çûbû. Her ku derbas dibûn diçûn, bang li Pîrika Wangê dikirin û digotin heydê û wê bi dilgeşî bi şûn de gazî dikir, "Ez tîm, ez tîm!"

Lê neçû. Bê deng rûniştibû, li dîmena sosret temaşe dikir. Lewma qaseke din balafirên din hatin, ji ciyekî ku pê beled nebû. Lê wan êrişî yên ku pêşî hatin kirin. Tav quloz bûbû li ser zeviyên gênim yên ku digihîstî û di hewayê ronak a havînê de balafirên xwe ji hev ba dikirin, tîr davêtin hev, dikirin tiwîn. Dema ku ew tişt biqedê, ew fikirî, wê bi şûn de vegeriya gund û binihêriya bê ka tişteke li pey mabû. Di vir û wir de, diwarekî ku serbanek destek dikir mabû. Ji wê derê de nikaribû mala xwe bibîne. Bes ew ne xerîbê şer bû. Carekê rêbiran gundê wan talan kiribû, paşê jî xanî hatibûn şewitandin. Belê, niha heman tişt dîsa diqewimî. Malên ku dişewitîn yekî dikaribû pir caran bidîta, bes şerên ku wekî zîvan di esmên

de dibiriqîn, na. Wê tişteke jê fêm nekir bê ka ew çi tişt bûn, ne jî bê ka çawa li esmên disekinîn. Bi tenê rûnişt, birçî dibû û temaşe dikir.

"Dixwazim yekê ji nêzîk ve bibînim" wê bi dengê bilind got, wê gavê yek ji wan ji nişkê ve berjêr bû, mîna ku birîndar bûbû çemiya, serbijêr kete nava zeviyekê, ku berazê biçûk hê duh ji bo wan fasoliyên soya rakiribû. Di navbeyna demeke kin de, esman dîsa vala bûbû, bi tenê ew û tiştê birîndar li erdê, bi tena serê xwe mabûn.

Bi baldarî jî erdê rabû. Di vî temenê xwe de, gere jî tu tiştî netirsiya. Dikaribû, biryara xwe girt, here û bibîne bê ka ew çi ye. Wîsa xwe daxiste ser qelûna bambû, rîya xwe hêdika ber bi zeviyan domand. Di dû wê re du sê kûçikên gund derketin, dan pey wê, tirsetirs nêzîk bûn. Dema ku gihîştî balafira ketî xwarê, bi tundî kirin hewtehwet, hingê wê bi qelûna xwe li wan xist.

"Bê deng bibin" wê li wan hilkişand. "Jixwe bi tîra xwe xilepûrt çêbû ku guhên min bibişkiwîne!"

Li balafirê xist. "metal e" wê gote kûçikan. "Zîv e bê guman" wê domand. Heke biheliya, dê ew hemû dewlemend bikirana.

Li dîra vê geriya, ev ji nêzîk ve seh kir. Çi ev difirand? Mirî xwiya dikir. Di hundirê vê de tu tişt ne dilivîya, ne jî deng dîda. Paşê, ku hate ciyê ku daketibûyê, wê di hundir de mirovekî xort dît. Li ser kursiyêke biçûk ketibû nava xurdeyan. Kûçikan kir hewtehwet, lê wê dîsa li wan xist, ew li ser piştê dirêj bûn.

"Tu mirî yî?" wê bi kubarî pirs kir. Mirovê xort ber bi dengê wê ve liviya, lê neaxift. Ew bêtir nêzîkî wî bû, çavên xwe qusande qulê, ciyê ku ew rûniştibû. Ji kêleka wî xwîn diçû.

"Birîndar e!" qîriya. Bi bazinê destê wî girt, germ bû, lê bê lebat bû, gava ku berda, destê wî kete valahiyê. Li wî mêze kir. Mîna çîniyan porê wî reş û çermê wî qemer bû, lê dîsa jî nedima çîniyekî.

"Yeqîn başûrî ye." wîsa fikirî. Baş e, ya girîng ev bû ku hê jî sax bû.

"Çêtir e tu derkevî derve!" wê dest nîşan kir. "Ez ê hinek mecûna gîhê daynim ser kêleka te."

Mirovê xort bi madtirîşî tişteke di ber xwe de got.

"Te çi got?" wê jê pirs kir. Lê wê careke din negot.

"Ez hê jî bi tîra xwe xurt im." Piştî demekê



biryara xwe girt. Wisa ghişte hundir, ew ji navtengê girt û hêdika, bi helkehelk kişande derve. Ya baş, mêrik pir hûrik û sivik bû. Dema ku wê ew danî erdê, mirovê birîndar haya lingên xwe bû: li ser piyan hinekî bi terpilîn sekini, xwe li wê girt, wê ew zeft kir.

“Niha heke tu heya mala min bikaribî werî,” wê got, “ez ê bibînim gelo ew li vê derê ye.”

Paşê wî tişteke got, pir vekirî. Wê lê guhdarî kir, nekarî peyveke wî fêhm bike.

“Ew çi ye?” wê pirs kir.

Wî kûçik nîşan da. Tev sekinîbûn û dihevtiyan, guhên wan mûç bûn. Paşê dîsa axift, bi axaftinê re dirêjî erdê bû. Kûçik ketin ser, lewma mecbûr ma ku bi lepan careke din li wan bixe.

“Bicehimin!” wê kir qîrîn, “kê gote we hûn wî bikujin?”

Pişt re, gava ku kûçik bi şûn de kişiyar, wê ew hilda pişt xwe, bi terpilîn nîv pişt dikir nîv jî dixirikand. Ew bire hinda gundê wêranbûyî, bi hêla di nava kolanê de, ku bi xwe jî here mala xwe peyda bike, kûçik jî bi xwe re dibirin.

Xaniyê wê piranî rûxiyabû. Dewsa wê bi hêsanî dît. Ew li ciyê ku diviya li wê bibûya, li pêşberî derwazeyê bendavê bû. Wê her tim derwaze bi xwe raçav dikir. Lê wekî mûcîzeyekê xera nebûbû, ne jî bendav şikestibû. Wê gelekî hêsan bibûya ku xênî careke din ava bike. Bi tenê bo niha ji dest çûbû.

Wisa vegeriya ba mirovê xort. Wekî ku wê danîbû disekini, pala wî li bendavê, rengê wî zerbûyî, dikire helkehelk. Sakoyê xwe derxistibû, çenteyekî biçûk ku wî jê de bendikên parçe û şûşeya tişteki deranî. Careke din axift, careke din wê tişteke jê fêhm nekir. Bi dû re wî îşaret kirin, wê dît tiştê ku wî dixwest av bû, wisa wê cêreke şikestî ji nava gelek bermayiyên di nava kolanê de belavbûyî hilda, çû li qeraxa bendavê ew bi ava çêm tijî kir anî xwarê dîsa, pê birîna wî şûşt û parçeyên ku wî ji tomara bandajê çêkiribû dirand. Wî dizanî dê çawa parçe bida ser birîna vekirî, bi îşaretan nîşanî wê da, wê jî ev îşaret şopandin. Wî her tim dida xwe ku tişteki bibêje, bes wê nedikarî fêhm bike.

“Yeşîn tu ji Başûr î, Mîrza” wê got. Hêsan bû ku mirov bibîne wî perwerde hildabû.

Pir baqil xwiya dikir.

“Min bihîstibû ku zimanê we ji yê me cihê

ye.” Hinekî keniya ku bêhna wî fireh bike, bes wî bi tenê bi çavên bêzar, bi awirekî vala lê meyizand. Wisa wê bi coş got. “Niha, ez tişteki bibînim ku em bixwin, wê pir xweş bibe.”

Wî tu bersiv neda. Hema li ser piştê ma. Hê jî giran giran dikire helkehelk û li fezayê dinihêrî, her wisa wê hîç gotinek nekiribû.

“Bi xwarinê tu yê baştir bibî,” wê domand, “her wiha ez ê jî,” wê bi ser de jî got. Birçibûneke xayîs hest dikir.

Wer xwiya bû ku li gundê Wangê, di dukana nanpêj de dibû ku hinek nan hebûya. Her çi qas bi hawanên ku ketibûn xwarê re bûbûne herî jî, nan hê nan bû. Wê biçûya û bidîta. Lê beriya ku bidomîne, wê leşker hinekî leqand, da ku di binê siya dara bişengê de, ku li qeraxa bendavê hêşin bûbû, bimîne. Pişt re çû dukana nanpêj. Kûçik êdî çûbûn.

Dukana nanpêj, wekî hemû ciyên din, bûbû dêris. Tu kes li wê derê tunebû. Di destpêkê de, tu tişt nedît, bi tenê dîwarên bi erdê ve zeliqî hebûn. Li hingê hate birê ku firme hema li ber devê dêrî bû, çarçoveya dêrî hê jî di cî de bû, ji ber ku keviya serbên li ser piyan digirt. Li ber vê çarçoveyê sekini, her ku destê xwe di binê banê hilçiyayî de gerand, wê bergirka texte ya beroşa hesin hest kir.

Di binê vê de, gere nanê pahtî hebe. Milê xwe bi baldarî û bi nazikî şixwiland. Vî karî demeke dirêj kişand.

Lê dîsa ji ewrên tozê dikira bifetisiya. Her wiha ew mafdar bû. Destê xwe di binê bergirkê de guvaşt, rûyê nanên pahtî yê mezî hest kir, yek bi yek çar heb derxist.

“Kuştina pîreke mîna min zehmet e”, wê bi kêfxweşî ji xwe re got, gava ku vegeriya, dest bi xwarina kerek nan kir. Xwezî seriyek sîrê wê û piyanek çaya wê hebûya -bes di wan deman de kesekî nedikarî her tiştî peyda bike.

Wê hingê deng hatin ber guhê wê. Gava ku kete nava bîna hiya leşkeran, dît ku li dora wê birrek leşkerên din hene. Wilo xwiya bû ku ji ciyekî nediyar hatibûn. Li leşkerê birîndar î çavên wî êdî hatibûn girtin dinihêrî.

“Te ev japon ji kû anî, dayika pîr?” bi ser wê de qîriyan.

“Japonê çi?” wê pirs kir, ber bi wan ve hat.

“Ev e!” tev qîriyan.

“Ma ev japon e?” bi heyirîneke mezî qîriya,

## REWSËN-NAME

"Lê ev dişibe me -çavên wî reş in, çermê wî-"

"Japon e!" yekî ji wan bangî wê kir.

"Bila be" wê bê pêjin got, "ji esmên kete xwarê."

"Wî nanî bide min!" yekî din qîriya.

"Hilde" wê got, "bi tenê yekî bihêle ji bo wî"

"Meymûnekî japonan nanê xweş dixwe" leşker qîriya.

"Ez bawer im ew jî birçî ye," Pîrika Wangê bersivand. hêdî hêdî ji wan mirovan hez nekir, lê jixwe wê her tim ji leşkeran hez nekiribû.

"Xwezî hûn biçûna," wê got, "Hûn li vir çî dikin? Gundê me her daîm di nava aştiyê de bû."

"Bê guman niha gelekî aram dixwiye." Yekî ji wan mirovan bi devlikenî got, "Goristaneke çendî aram e. Tu dizanî kê ev tişt kir, dayika pîr? Vî japonî."

"Ez jî wiha texmîn dikim" wê pejirand. Pişt re pîrs kir, "Çima? Tiştê ku nakeve serê min ev e."

"Çima? Ji ber ku ew axa me dixwazin, ji bo vê yekê!"

"Axa me!" wê dubare kir, "Çima, nikarin axa me hildin?"

"Tu carî!" Tev qîriyan.

Lê di vê dema ku nanên xwe yên li hev par vekiribûn dicûtin û diaxiftin, bi hev re li asoya rohilatî dinihêrin.

"Hûn çima tim li rohilat dinihêrin?" Pîrika Wangê hingê pîrs kir.

"Japon ji vê derê de tîn" mirovê ku nan jê standibû bersivand.

"Hûn ji wan direvin?" wê bi şaşmatî pîrs kir.

"Bi tenê ji me destikek hene?" Wî wekî ku lêborîn dixwest got.

"Em ji bo parastina gundekî -Pao An, li navçeya-"

"Ez wî gundî nas dikim" Pîrika Wangê gotina wî birf.

"Ne hewce ye hûn ji min re bibêjin. Ez keç bûm li wê derê. Paoyê kal, ku di kolana naverastê de xwediyê dukana çayê ye, çawa ne? Ew birayê min e."

"Hemû kesên li wê derê mirin" mêrikî bersivand. "Japonan ew der zefî kir -arteşeke giran bi çekên xwe yên xerîb û bi tanqan hatin, wisa, me wê hingê dikaribû çî bikira?"

"Bê guman, bi tenê bazdan" wê pejirand. Her wisa wê xwe nexweş û gêjbûyî hest kir. Belê, ew

miribû, tekane birayê wê yê ku mabû! Niha ew kesa dawîn a malbata xwe bû.

Lê leşker dîsa ew tenê hiştin, bi dûr ketin.

"Wê dîsa werin ew kurtoleyên reş" digotin.

"Ya baş ew e em bidomînin."

Belê, bîstekê sekinî, wê nan hildabû, ji bo ku li mirovê birîndar î hiç nediliviya binihêre.

"Miriye?" wê lê pîrsî. Paşê, beriya ku Pîrika Wang bikaribe bersivê bide, wî ji çenteyê xwe kêreke biçûk derxist, "Mirî an sax, ez ê çend hotikan lê dim bi vê."

Lê Pîrika Wangê milê wî bi paş ve kişand.

"Na, tu nakî," wê bi deng bi ser de bilind kir.

"Heke ew miribe, wê hingê tu yê wî kerkerî bişînî Erafê. Ez bi xwe bûdîsteke qenc im."

Mirov keniya, "Ha baş e, miriye" jixwe wî bersivand û pişt re ku dît hevriyên wî ji niha ve bi dûr ketine, di par re bi pey wan ket.

Ew japon bû? Pîrika Wangê, ku bi vî kesê bê lept û liv re tenê mabû, bi awayekî lêpîrsînî lê meyizand. Pir ciwan bû, wê karî bibîne wê çaxa ku çavên wî hatibûn girtin. Destên wî ji bêhişiyê bê mecal dişibiyên destên kurikekî, bêşikil û hê digihişt. Zenda wî girt, lê rehjena wî hest nekir. Xwe bi ser de xûz kir, pariyê nanê ku wê nexwaribû bire ber lêvên wî.

"Bixwe" wê bi deng û eşkere got, "Nan!"

Lê tu bersiv tunebû. Diyar bû ku miribû. Dema ku wê nan ji firneyê derdixist, yeqîn wê hingê miribû.

Wê gavê tişteke nînbû ku bê kirin, xêncî ku nên bi xwe xelas bike. Dema ku ev kar hate kirin, fikirî ku diviya berazê biçûk, jina wî û gundiyan bişopine. Roj quloz û germtir dibû.

Xwezî biçûya, biçûya wê çetir bikira. Lê pêşî wê hilkişiya ser bendê û lê binihêriya bê ka hindav ber bi kîjan aliyê ve bû. Rasterast bi aliyê roava de çûbûn û heya ku çav dibirî li roava deşteke mezin hebû. Her wiha wê dikaribû hejmareke mezin a mirovan bi mîlan ji dûr ve bibîne. Dîsa bi gundê li tenişt jî dihisiya, dibû ku giş li wê derê bibin.

Wisa hêdîka hilkişiya bendê, kejejanê digirtê. Sûreke zirav li ser bendê hebû, baş xwiya dikir.

Hingê matmayî ma ku çem ev qas li nêzîkî serê bendê dîtibû. Çima di saeta dawîn de bilind bûbû!

"Tu şeytanê pîr!" wê bi hêrs got. Bihêle yezdanê çem bila bibihîze, heke dixwaze.

Şeytan ew bû -ew, hemû arîşe ne bes bûn, bi ser de jî çê bilind dike.

Rawestiya. Serçavê xwe û zendên xwe şuşt. Av gelekî sar bû, her çi qas bi baranê jî tijî bûbû, disa wisa bû.

Pişt re li ser darê ligan sekinî, li derûdora xwe nihêrî. Li milê roava, ji bilî leşkerên ku bi lez û bez diçûn tu tişt tunebû û ji wan bi wê de reşahiya gundê din, ku li ser gir bi cî bûbû, xwiya dikir. Ya baş ew, ber bi wî gundî ve bi rê biketa. Bê guman berazê biçûk û jina wî li wê derê li hêviya wê bûn.

Wê hê teze peya bibûya û bi rê biketa, tişteke li asoya rohilat dît. Pêşî wekî toz û dûmaneke mezin bû. Bes hingî çû li wê temaşe kir, zûtirî bû gelek xalên reş û geş. Dawiyê wê têderxist çi ye. Birrek mirov bûn; artêşek bû. Taviê wê nas kir kujan artêş e.

“Ew japon in,” fikirî. Erê, li ser wan balafirên zîvîn dikirin wingîni, li hawîrdor dizivirîn. Wer dixwiya ku li hin kesan digeriyan.

“Ez nizamî ka hûn li kê digerin” wê nehvirand. “Ji bilî min, berazê biçûk û jina wî kî be. Yê li dûmahiyê mane em in, we hîna birayê min Pao kuşt.”

Teze ji bîr kiribû ku Pao miriye, lê cardin bi tundî bi bîr anî. Dukaneke wî ya çi qas xweşik hebû; her tim paqij, çaya xweş, erzaniya goştê herî çê, ku were kirinê û biha her car eynî bû. Pao mirovekî pak bû. Bi ser de, ma jin û heft zarokên wî? Bê şik ew jî tev hatibûn kuştin. Niha heman japon li wê digeriyan. Di wê baweriyê de bû ku li ser bendavê wê bi hêsani bihata dîtin, wisa zû bi zû berjêr bû.

Heya nivê rê daketibû, wê hingê li derwazeyê avê fikirî. Ew çemê pîr -ji destpêka zemên de bûbû bela li serê wan. Çima, niha tişteki biçûk bikira bi pêş nepakiyên ku kiriye ve?

Dîsa dek û dolab li dar dixist. Hewl dida ku ji delavên xwe bifilite, erê çima nebe? Bîstekê dudilî kir. Tişteki nebaş bû bê guman, japonê mirî dê biketa ber lehiyê, roda biçûya. Kurikekî bedew bû û wê ew ji kerkeribûnê rizgar kiribû. Hemin e wekî rizgarkirina jiyane nebû, bes kêm be jî, heman tişt bû. Sax bibûya, wê bihata rizgarkirin. Çû ser, ew kişand heya kopa bendê bi cî be. Paşê cardin peya bû.

Wê baş dizanibû derwazeyê avê çawa vedibû.

Her zarokî dizanibû dolikê ji bo zeviyê veke.

Bes ji wê ve her wiha nas bû ku derwaze veke û bireve, mesele ev bû, gelo wê bikaribûya bi lez vekira ku xwe bida aliyekî?

“Ez hema jineke pîr im” wê kire pilepil. Careke din kete dudiliyê. Belê, heke nedîta jina berazê biçûk zarokekî çawa bîne, wê nexweş biketa. Lê kesek nikare her tiştî bibîne: Wê di jiyana xwe de gelek tişt dîtibûn. Dawiyeke ji bo tiştên ku kesek bibîne heye jixwe.

Dîsa li rohilat meyizand. Li naverasta deştê, japonên ku dimeşyan hebûn. Rêzeke direj î reş bû; li ser, bi hezaran xalên ku geş dikirin hebûn. Heke wê ev derwaze vekira, ava bicoş ê her bi wan re bigurguriya, di deştê de bilezanda, deryaçeyeye fireh çêbikira û ew roda bibirana. Helbet nedikarin meşa xwe bidomînin nêziktirê wê, berazê biçûk û jina wî ya ku li hêviyê bûn. Belê, berazê biçûk û jina wî dê ji bo wê di mereqê de bimana -lê wan bîra tişteki wiha tu carî nedibir. Wê bibûya çîrokeke xweş- We pê şa bibûya ku ew çirok bigota.

Bi biryardarî vegeriya derwazê. Erê, hin kesan bi balafiran şer dikirin û hin kesan jî bi çekan, lê tu dikarî bi çemekî jî şer bikî, heke ew mîna vî yekî nepak be. Wê milekî dar î mezin bada, ew bi kevza zîvîn şemitokî bûbû. Cihoka avê pekiya, bû pijiqîneke bi çoş û peroş.

Gava ku wê milekî din bada, yê mayî dê riya xwe vekirana. Dest bi kişandina wê kir û hest kir ku piçekî ji koncala xwe liviya.

“Dibe ku bi vê ez bikaribim xwe ji Erafê rizgar bikim” wisa fikirî. “Û dibe ku mêrê min jî bihêlin ji bo min. Çi tiliya wî di wan tiştan de heye? Pişt re em ê-”

Mil ji nişkê ve şemitî û derwaze li hemberî wê pekiya, bêhna wê çikand. Bi tenê dem hebû ku wê zeft bike. Ji çem re got:

“De heyde Şeytanê Pîr!”

Paşê nas kir ku derwazê ew girtiye û ber bi jorê ve bilind dike. Çem li binê wê, li dora wê bû. Ew bi kêf bi vir de, bi wê de gilol kir, pişt re ew nêzikî xwe di hembêza xwe de girt, li dijî dijmin raperiya û herikî♦

**Navê çîrokê yê bi îngilîzî: The Old Demon  
Ji îngilîzî: Samî Hêzil**

# piyano

osman mehmed

Cara pêşîn min Piyano li wir dîtibû!

Gundekî di nava tozê de... Li vir jî, niha, gav bi lez in û ez dewşên lingên xwe û yên kalikê xwe xera dikim û dimeşim li dû wan. Vê beriya nîvroyê, hema bibêje siya tu tiştî nîne! Ez dizanim ku niha çavên korik ên bavê min çî eziyetê dikişînin heta ku ber xwe dibînin. Ji ber ku -bi gotina diya min- "keleqijên" e, hilma êgir e di bêvilên me de!

Va ye zarok xarên rengorengo di destên wan de, li ber siya xaniyekî axî, ji xwe re difîzin. Bêhneke tîrş difûre ji qemçik û rûyên wan ên xwedayî, dema ku em di ber wan re derbas dibin. Ez jî zarok im. Di berîka min de jî xareke min a şîngîn heye. Ez pê dihisim ku xara min bêriya berêvarên kuçeyke fireh dike, lê ez guh nadimê.

Cara pêşîn min piyanoyek di wê qesrê de dît.

Em jî deriyê qublet ve ketibûn qesrê. Xwediyê malê, hê em li devê deriyê hewşê, hatiye pêşiya me. Lîwan fireh û belawela ye. Beriya nîvroyekê, me daye devê dêrî. Di mewsimêke ku jî zarokan û mêşan pê de, her kes di xew de, an jî çavxewî ye... Lîwana qesrê aram e jî, lêbelê ji 'pir-tiştên' tê de, çavên min ên zaro tiştêkî ji hev demaxin. Ez çî qasî bi ecêbmayîn li tiştinan dimeyîzînim!

Gava ku ez li pey hemûyan -hemûyên mezin- sola xwe ji pê dikim, wê dibînim (pêşîn ber bi çavên min dikeve). Li odeya li destê çepê, li ber pencereyê... Di wê odeya ku mase û kursiyên xweşik jî lê dibiriqîn, piyanoyek...

Kê ji min re gotibû, navê vê tiştê reş î biling "piyano" ye?

Beriya hingî bi gelekî bû:

Cara pêşîn min sûretê vê tiştê li ser berga kaseteke xalê xwe dîtibû. Kalemêrekî reş î bi berçavkeke reş, li ser kursiyêke biçûk, li ber "vê tiştê" reş î ku dibiriqê rûniştibû û tiliyên wî yên reş jî li ser wan tûşên reş û spî xwiya dikirin. Ji ber ku li ser berga kasetê bû, min têderxistibû ku ev amûreke muzîkê ye, lê... Û min navê wê ji xalê xwe pirsibû. Piştî ku pirsê min bersivandibû, min gotibû, "Yanî, wekî tembûrê?". Bi bişîrîn wî li min veşandibû dîsa, "Na, wekî xwe!". Digel ku min fêhm nekiribû jî, min serê xwe hejandibû û min nexwestibû ew bi vê fêhnekirina min bizanibe.

Tiliyên min ên ku qeytan vedikirin, niha çî qasî dixwestin li dewsa awirên min bibûna! Na!

Ez jî, bi wê xuroşê ketim odeya destê rastê di pey yên din re. (Dewşên piyan li ser merşan ne xwiya ne, çî fêde!) Xwediyê malê di ser serê min re, li benda min jî mabû heta ku ez bikevim hundir. Ez çî qasî bi kêf bûm! Bi fedî ez çûm ba kalikê xwe, li kevika doşekê 'xulamkî' rûniştim; min pala xwe neda palgehî. Çî xweş bû ku vê kêliya ku mêvan û mazûvan bi hev hênik dibûn û haya kesî ji min nebû!

Çend merşên tenik raxistî bûn li erdê. Bi du aliyan doşek û palgeh, li dawiya odeyê jî dîwançeyêke rûyê wê bi kulîkên mîna hev



neqşandî hatibûn danîn. (Bavê min çûbû li ser wê diwançeyê rûniştibû.) Perwaneya bi zikê xênî ve, ji xeynî ku mêşan ji ser me bide alî, bi kêrî tu tişteki din nedihat!.. Lê av zû bi me ve giha.

Jineke di temenê diya min de hema, (lê) porvekirî, bejinzirav û qamdirêj, di destekî de surehiyeke lekî, ku qeşa di ser avê re tê de xwiya dike: di yê din de zerikeke bafûnî, ket hundir. Ku xwe ditewand, selîbekî zêr bi stû ve daleqayî dima. Ev destên ku av dadigirtin zerikê û didan destên me, gelo li ser piyanoyê jî wilo bi bexemî diherikîn, dîsa weke avekê?!

Li miqabilê min, bi dîwêr ve sûretê jineke ku ronî ji rûyê wê belav dibê daleqayî ye: Kirasekî şîn lê ye û her du destên xwe bi hev kirine li ber sîngê xwe. Awirên xwe bi min ve kirine. Pezkûviyên li ser merşa dîwêr î di bin re tu dibêjî qey ji van awirên wê, bi tirs sekinîne. Lê na. niha ew bi kêfxweşî li wan dinihêre. Wê gavê, selîbek bi sîrûyê pezkûviyekê ji wan ve hebû? Ne li bîra min e. Ne li bîra min e ku neçîrvanekî li ser wê merşa dîwêr xwiya dikir an na, jî.

Û Îsa bi çarmixê ve... Min ev bi sûretî di kitêbekê de dîtibû berê. Niha di ser diwançeyê re, di dirûve peykerekî reş de, ew jî bi yek mixî bi dîwêr ve, wek ku dike bikeve... Va ye serê wî bi ser serê bavê min de xwar bûye jî. Ez xweş dizanim ku haya bavê min jê nîne û nabe jî. Bavê min jî wê keliyê wekî min dihisand; lê yê wî ne li piyanoyê...

Cara pêşîn di wê odekê de, ji nişkê ve dilê min bi sed caran kiribû kutekut û tişteki wekî niquteke avê xwe ji dilê min berdadû heta bi hinav û çongên min.

Kela xwîne çawa bi ser rû de difûriya gidî!

Kêliya ku ketibû hundir ew qîza paqtazî ('paqên wê wekî stûn')...

Di temenê min de xwiya dikir; lê bi qama xwe

bi ser min diket. Di temamê zarokatiya xwe de, min dîmeneke weha zindî nedîtibû! Piştî ku ji wê qubaleka di neqeba ciyê ku ez lê rûniştibûm û diwançeyê, rahiştibû tişteki ku di sa hê min neditiye û ez nas nakim û çûbû. Wê kêliya ku gavên wê di ber min re dibihurîn, ji bo ku ez jî bi sê mixeawiran, bi lûlûyên çavên wê ve neyê daleqandin, çi qasî min hewl dabû xwe, Xwedêyo! Bi çûna wê re ji lîwanê û bi wê de, dengê straneke filehî nermik nermik hatibû guhê min û pê sermesttir bûbûm. Bi wê fediya ku bi hezar rûyî li derve, li kevîka doşekê û bi wê degelbûna di qorziyeke tarî ya dil de, ez yekcar dil ketimê. Ya Rebî, ev çi tiştên xweşik û xerîb



bûn li çola ku ji heshesûkan û hidûd û pê ve tişteki li ser rûkê wê nehiştiye hetavê!!

Li pey ku me firavîn xwar (diya min gotibû, "Tu tişteki tam nekî li wê derê!"), ji bo ku ez jî destên xwe bişom, li dû wan kesan dîsa derketim hewşê. Dê wê delala kêliya din av li destê min jî bikira?! Destikê nazik ê ku bi çembilê misîn girtibû dikaribû heta hetayê wiha bimîne: Bi çûna di ser tûşên piyanoyê re, bi newayeke perwaneya dil... Erê, ji lewma... destên xwe li nava mêwîne rezekî Babilê ji bîr kiribû... Lewma, mîna her avê ev av jî, bi destê wê yê ku ji misîn-kûp dirjiya, dibû şerabeke kevnar û destên min dadiqurtand, dadiqurtand... Heta jê dihat. Jixwe siya çavên wê yên ku dikeniyar ji zû ve xwe dabû ser beyarên



## REWSËN-NAME

dilê min.

Û min, ji bêçareyî, li destên xwe dimeyizand. Destên min ên xerîb, wekî qûma çola li wî aliyê hidûd, çawa li ber barana ji dilê vê keçê gulistanek jî li têhnşikîna xwe zêde nekira?

Ez fêr bûbûm ku li nava xelkê negirim. Lê bi dengekî sist, hov û kelogirî min jê pirsî, "Navê te çi ye?". Wê bi dengekî zirav û jixwebawer got, "Navê min Piyano ye." û beşîşî, qut kir. Li navê min jî nepirsî! Nejixwe porê min şikîni û bi bedlekî nû jî bûm. Çima em hatibûn vî gundî, çima?

Piştî nîvro bû. Min di dilê xwe de xatir ji Piyano yê xwest û em çûn. Piştî nîvro bû. Xerabtir bû. Nizanim çi şitexalî kiribûn wî qasî, bes bi kêf xwiya dikirin her du mezin jî. Ku em gihîştin bajêr, ez ê ji dû wan qut bibûma êdî û bi tena serê xwe, hêdî hêdî, bi şitexaliya bi keviyekî re -ku wî bi xwe re dimeşînim û jê re dibim dost- ez ê bigihîştama malê. Em diçûn û zarok hê jî bi xaran dilîstin. Em dimeşîyan û xara min di nava destê min de xwê dabû vî carê. Hidûd avis û heshesûk qedexa bûn. Gavên me dîsa bi lez, di nava tozê de... Vê carê, ez dewşên piyên kesî xera nakim; li dewşên piyên xwe digerim vî carê. Piyano li pey gavên min tenê dima, li berêvareke ku her tişt di nava serê hev de... Û li liwanekê belkî, li qesreke babilî...

Cara dawîn min piyano û Piyano li nava gundekî kavil didît, li baxçeyekî ji teniyê reş, yê dêreke ketî... Li dawîya her tiştî toz û xwelî dimîne, ji xeynî ya min û Piyano yê.

În bû. Îna misilmanan û rojêke ji dera ha yî leşkerên xwînê û qirêjê bû. Nisana bûka heyvan bû; bûkeke çavşil bû. Sibehê, hê zû bû. Nizanim ne, piştî ku min bihîstibû gundê wan wê şeva şepirze hatiye şewitandin, ez di xewê de çûbûm wir; nizanim jî ne, ez ji berê de li wê derê li ba Piyano yê, yek ji wan bûm. Tiştê ku ez dizanim, vî sibehê, heta derekê çi qewimî, min bi çavên xwe dît!

Vê carê, bi reşêke şîni ez wê dibînim. Diçe ser sêpiya piyano yê -rûniştineke sivik-. Dîmeneke



narîn e li ber xayîniyên vî heyamê; digel ku evîna wê min dîkuje, ew tu carî ne qesasa dil e. Niha, serhildêreke temam e ew! Porê xwe yê dirêj bi piştê xwe ve berdaye. Tu dibêjî qey tayên porê wê rûyê xakeke pîroz radimûsin. Li dorê, kom û kulfet; tûrên wan, fîraxên wan ên di tirêmbêlan de û xemgîniya wan -tevî qehrekê jî-, amadeyî koçê ne. Li benda strana dawî ya ji ruhê vî erdê ne. Va ye, tiliyên xwe yên spî mîna bayekî di ser tûşên reş û spî re birin û ... got, bi zarekî şerabî:

"Ev stran ji bo we, hûn hemû pîrpirînekên bêrî û dûriyê."

Û destekî, bi tilîne wek yên Piyano yê biefsûn, ez zêft dikirim û ji nava wan derdixistim, ez difîrandim ber bi ewrîne reş de. Na, perrî bi min ve nebûn û ez bi piştê ve diketim.

Ez diçûm. Ew diman. Ez wînda dibûm. Ew dima. Piştê wê li bakur bû.

Gelo piyano li wê rastê ma?

Gelo piyano jî şewitandin (pişt re)?

Cara pêşîn û her û her, Piyano di vî dilî de ma pîrpiçêk.

Pîrpiçêk li ser rûçikê ramûsanê...

Ramûsanek li ser rûkê xakê...

Piyano! Te strana xwe qedand?

Piyano, qey tu hew peyivî?

Tu li kû yî Piyano?

Piyaa.. nooo.. noo..no..oooo!..

*Çilêyê Paşîn, 2000*

# Kewa Min

cindî

Dev ji mirinê berde  
Bes e qebeqeba te  
Wisa xemgîn û dirêj  
Tu evîn î wek hêsirên çavên min paqij  
Wek dilê min hêsr  
Wek tiliyên min qetilkar  
Di dilê te de xerabî nîn e  
Birîneke kûr e îxanet

Ez dizanim  
Tu jiyan î kewa min  
Bîranîna mirinê  
Di dilê te de hesreta welat  
Di dengê te de sikrata mirinê  
Bes e kewa min  
Deng meke  
Wê refên me belav bikin  
Wê gundê me xerab bikin  
Deng meke kewa min  
Wê min bikujin

## ke jê

gülay ersoy

**K**î dizane çend kesan bi wan destên narîn girtin. Çend kesan çavên xwe li bejna bedew gerandin. Çend kesan zêbûnî neqşand dilê wê û çend kesan ew ji jiyane sar kir. Çend kesan... Çend kesan... Kes pê nizane, ez jî pê nizanim.

Di demeke nêzik de, navê wê di taxa me de hat bihistin. Dema ku hatin taxa me, rewşa wan pir xerab bû. Kalo êdî dest ji jiyane kişandibû. Lingekî wî tunebû. Şûna ling gopalek xistibû destê xwe û di nava kolana de digeriya. Zarokên taxê kalo dorpêç dikir. "Kalo tu min dibînî, kalo lingê te li kû derê ye, kalo li nava sergo zêr heye?" digotin û dikirin ku gopalek kalo ji dêst bigirin.

Kalo sibehê zû radibû, berê xwe dida sergoyê taaxê ji bo pariyek nan, ji bo firaxekî şikestî, ji bo parçeyek pine...

Mala wan li derveyê taxê bû. Deriyê wan tim girtî bû, carinan 'ew' derdiket ber dêrî, kincên qerpalqerpalî radixist. Kesî rûyê wê nedidît. Destmala xwe heya ber çavê xwe girêdida. Carinan qîrînek dihat ji holika wan. Carinan jî nalînek... Nalîneke pir kûr ji dilê kalo dihat. Ev kûrahî naye zanîn. Di binê vê nalîne de, xuşexuşa

çeman, tevgera gundiyan, êşa birîndaran deng dida. Lê me ew deng nedibihîst, kesî nedibihîst, taxa me jî nedibihîst.

Rojeke zivistanê, her derê qeşa girtibû. Li ber deriyê me 'wê' xwiya kir. Hêdîka destê xwe li dêrî xist, dengekî zirav hat. Diya min derî lê vekir. Çavên xwe ji erdê ranedikir. Pêxwas bû. Xwîn di lêvan de nemabû, diricifî. Di dêst de firaxekî şikestî hebû. Bi dengekî bêçare, "Tu dikarî tasek ard bidî?". Sekinî, şerm kir. "Heke tunebe, mistek jî bes e." Firax di dêst de dilerizî. Bayê sar di nava fistanê wê yê qetiyayî re digihîşt laşê "wê". Diya min "ew" hilda hundir, hat li ber sobeyê rawestiya. Parçeyek kulor da dêst, "Metirse, hinekî xwe germ bike." got diya min. "Na, ez ê herim, zarok tenê ne." Çavên xwe hê jî ji ardê ranekiribû.

Mîna hemû jinên taxê, diya min jî jiyana wan mereq dikir:

-Ew kalo mêrê te ye?

-Na, xezûrê min e.

-Ma mêrê te tune ye?

Bi kurtî got, "na".

Diya min firaxê ard anî da dêst, "Serê te sax be.", hêdîka çavên xwe rakir. "Nemir, wê rojekê

were." Di nava çavan de, hêşîniya zarokan hebû. Demeke kin min li çavên wê nihêrî, wê jî bi bêwateyî li mê nihêrî. "Mala we ava, ku kalo ji xwe re karek dît, em ê deynê we bidin." Parçeyê kilgirê jî da tasa ard û ji malê derket. Bi gavên giran ber bi holika xwe ve çû. Di dû wê de, bizirûkên bertê berdabûn.

Ew çend roj bûn ji holika wan ne deng dihat, ne nalîn, ne jî ji kuleka wan dû dikişiya. Êvarê hêdî hêdî baskên xwe da ser taxa me, taxa bêkesan... Taxa belengazan... Taxa sêwiyan... Taxa perşikestiyân. Zarok pêxwas û tazî ketibûn ber pêşîra "wê". Tîna canê wê zarok dikişandin ber bi xwe. Serê du rojan bû ku Kalo ji ser sergo nehatibû. Tî û birçî li hêviya kalê xwe bû. Kalo ji wan re nanê gemarî, pîneka çiravî, zikê têr, odeya germ bû. Kalo wekî bêhna bavo bû... Hêz bû û şaxa dara jiyane bû.

Kalo ji ber van berpirsiyariyên giran berê xwe dabû sergoyê cemidî. Bi berbangê re rabû, derve hîn cemidî, hîn tarî bû, her kes di xewê de bû. Erebyên kolana wî hê hişyar nebûbûn. Xewa giran û bêhêziyê çavên kalo digirtin. Lê dîsa jî, ji holikê derket, deriyê teneke kişand û da ser riya sergo. Dixwest beriya hemû belengazên taxê xwe bigihîne ser sergo. Ji bo ku dema kamyona sergo hat, pariyek nan, piçek xwarina bermayî bîne holika birçî. Di sewgura berbangê de, dengê gopale kalo diket guhê taxê. Bi gavên kal hat ser sergo. pišta xwe da erebeyeke xurde û ma li benda kamyonê. Bi demekê şûn de gujeguja kamyonê hat. Kalo guhên xwe bel kir bê ka ew kamyona xwarinê ye an na. Rabû ser piyan, ber bi rê ve hat. deng hîn bi hîn nêzik dibû. Bi kamyonê re bêhna nan û xwarinê bi ser wan de hat. Du sê zarokên belengaz li dû kamyonê dibeziyân. Her derê qeşa girtibû. Zarok carinan dişiqitiyan û diketin erdê. Kamyon hat nêzikê kalo. Kalo li dûmena li ber xwe nihêrî, kela girî lê rabû. Ji xwe fedî kir, ji bo pariyek nan mêraniya xwe ji bir kiribû. Pir li ber xwe ket.

Ajovan diqîriya, "Kalo, tu vê çiçîka sibehê, li ser riya min çi gûyî dixwî?". Kalo nebihîst, ajovên dîsa, "Ho kalo, ji ber kamyonê derkeve!" Careke din li qorneyê xist, kalo veciniqî, xwe ji riya kamyonê da alî. Kamyon hat ser sergo, dest bi yalakirin barê xwe kir. Kalo bala xwe dabû

barê ku vala dibe. Çavên kalo di nava barê sergo de bi nanê somin ketin. Bi hêz xwe avêt ser nanê somin. Nan ketibû binê tekerê kamyonê, Kalo xwest ku sominê hembêz bike. Lê kamyon dixebitî, dema ku kalo xwe avêt ser sominê, kamyon paşepêlî hat û laşê kalo avêt binê tekerên xwe, parsûyên kalo di hev re derbas bûn. Kalo deng neda, an jî deng da, kesî nebihîst. Parsûyên kalo bûn şûrên dilê kalo. Serê parsûyên kalo ketibûn nava dilê pîr. Çilkek xwîn rijiya ser sergo... Çilkek û hew... Ajovên karê xwe kuta kir, da ser riya bajêr. Kamyon diçû... Di dû re bayê bêwelatiyê rabû, qirş û qal anî ser termê bêkes... Bayê koçeriyê rabû, çend bajarên biyanî anî ji kalo re. Kalo nedixwest çilkek ji xwîna xwe bide axa biyanî, lê êdî ne di destê wî de bû.

Kejê bédeng bû li hemberî gotinên jinikê. Dixwest ku hişê wê biçelpîne. Kejê deng nekir. Ma wê çawa navê xwê qirêj bikirana... Na, na... Ma tu carî tiştêkî wiha dibe... Ar, namûs, mirovahî... Nepejirand... Em ê ji nêza bimirin, namûsa xwe navêjin binê piyê xelkê. Jinik şande mala wê, zarokên xwe kişand dora xwe û dest bi lorînê kir, lorîna axinê... Koçberiyê... Biyaniyê. Tev bi hev re ketin xewê, roj nivî razayî, nivî hişyar derbas dibû. Lê bedena zarokên biçûk li ber xwe nedan. Nivê şevê êşek kete canê lawikê biçûk. Kûr kûr dinaliya. Dora devê wî, tiliyên wî, zimanê wî hêşîn bûbû. Xwedayo... Lorî... Lorî... Lorî... Êşa zirav, êşa bêbav, êşa sêwî... Dinaliya zarok, dinaliya holik, dinaliya jiyana bextreş di hembêza Kejê de. "Dayê, dayê, min xelas bike dayê!" bûn peyvên dawîn. Êdî Kejê li ser termê wî dilorand. Hiş ji serê wê çû, destê zarok xiste devê xwe, dixwest zarok bi şûn de têxe hundirê xwe. Nikaribû... Nehiştin... Lorîka min...

Kejê sibehê zû çû ber deriyê Mûsayê Qewad. Jina wî derî vekir, bi kenekî pîs î xinizî li rûyê Kejê nihêrî. "Tu hatî?" Kejê wisa rawestiyabû, hişê wê li ser termê di holikê de bû. Termê lêwik di nava cilan de li benda darbesta sar bû. Bi mirîna zarok re zarokê di hundirê Kejê de jî mir. Lê ji bo zarokê di hundirê xwe de nikaribû darbestekê bide çêkirin, niha him ji bo zarok, him jî ji bo termê hundirê xwe hatibû ber vî deriyê bêrûmet û qirêj.

Mûsayê Qewad mala Kejê ji holikê derxist,

## REWŞEN-NAME

cil. firax û zarok anî xist qatê binê mala xwe. Odeyek ji bo zarokan raxistin, odeya din jî ji bo Kejê raxistin. Nivîn, neynikek, kursiyek û tiştên ku jin xwe pê boyax dikin danîn odeya rebenê. Êdî rebenê Kejêya navdar bû. Roja pêşîn Mûsayê Qewad bû mêvanê Kejê. Mêvaniya rabezîndinê. Rojên din Mûsa mêvan şandin. Kejê bi pêş pêdiviyên zarokan ve mêvan dipejirandin. Sarbûna bajaran ketibû giyanên wan mirovan. Ew ne mirov bûn, lawirên bajaran bûn, lawirên birçî bûn. Roj bi wî rengî ber bi dawiyê ve diçûn. Zarokên koçberiyê ji laşên diya xwe têr dibûn. Heya ku rojekê Mûsayê Qewad hat zarok birin seyranê. Seyrana ber deryayê. Ev seyran di zimanê qewadan de bazirganiya zarokan bû.

Tariya şevê kete erdê, lê ne Mûsa û ne jî zarok xwiya bûn. Kejê lingekî xwe li derve, lingekî xwe jî li benda Mûsa bû, diçû û dihat. Berê sibehê bû, dengê gavên Mûsa hate guhên wê. Derî vekir, behna araqê jê difûrî, serxweş bû. Zarok pê re nebûn. Kejê din û har bû. Pêxwas xwe berda kolanên bajêr. Di nava erebeyan de, di nav bêbextan de, di nava zarokên kolan de dibezîya, ber

bi mirinê ve dilezand. Porê xwe dirûçikand, rûyê xwe dida ber pancan, lê dîsa jî agirê dilê wê danedihat. Hate perava deryayê. Li esmanan heyv dibiriqî, siya heyvê ketibû ser avê. Kejê kûr kûr li avê nihêrî. Di avê de, gundê wan derbas dibû, gundê kalo... Kalo jî, li dû gundê xwe diçû... Li dû Kalo, zarok digiriyan... Zarokên Kejê. Pêlên deryayê bi hêrs xwe li peravan dixistin. Pêleke dîn bi ser gund de rabû, Kalo û zarok avêtin binê xwe. Bi dû pêlê re dîmena Kejê serav bû. Kejê li xwe mêze kir. Ev ne Kejê bû, keseke biyanî bû. Ev darbesta zarokan di hundirê wê de miribû. Ji dûtir ve dengê erebeyan dihat. Kejê xwe bi axin avêt ser dîmena xwe ya di avê de. Di berbangê de, termê wê dîtîn. Anîn taxê. Mûsa alîkari ji zindîtiya wê re nekir, lê ji bo termê wê peywira xwe anî cî.

Kejêya navdar li ser tenaşoyê bû. Di hişê min re pirsên bêwate û bêbersiv derbas dibûn. Çend kesan bi wan destên narîn girt... Çend kesan çavên xwe li bejna bedew gerand... Çend kesan zêbûnê neqşand dilê wê û çend kesan ew ji jiyane sar kir... Çend kesan... Çend kesan... Kî dizane♦

mast

deniz gündüz

Ju game berzî

Lajeke ebe lewanê qilaşiyaya nezelîno ra mast

Çimê xo koya de nezelîno ra mast

Maye çima kena kudiz

Zûr maneno pî. beno har mast

Azmen perta nano ro

Hard girpika xo ano we

Ronşî,

Şar mî de nişeno ro

Lajêk koya ra cereno ra êno

Awe bena şimşer

Serd veşneno

Biberbî,

Çêneke xo şelenena

Şermî xo ser ra şelenena, dÛjîye xo ser ra

Hisîrê mî rût û rindekiye de virîne

Hisîrî ênê rotenê, beno har mast



# Hemama Nûjen

— mistefa reşîd —

**E**m du hevalên hev bûn û li bajarekî, di avakirina xaniyan de dixebitîn. Roja beriya dawiya hefteyê, me biryara xwe girtibû ku em bi hev re biçin hemama bajêr. Lê ji ber ku em gelekî westiyabûn, me got, pêşî em pariyek dudu nan bixwin, hinekî hilkevin û em ê li ser danê êvarê biçin hemamê.

Ez hatim malê, min xwarina xwe xwar û hema ez li ser rewalê hilketim. Mirovê westiyayî zû dikeve xewê; ez çawa hilketim, ez wisa jî di xew ve çûm.

Dibêjin, xew dijminê meriyan e; min çi qas xew kir ez nema dizanim. Bi carekê min bihîst deriyê malê tê kutan û hevalê min dibêje, de bilezîne, bilezîne, em herin hemamê. Bêyî ku ew bikeve hundir, min rahişte kincên xwe, sabûn, kîsik û destmala hemamê, min ew xistin tûrekî û ez derketim.

Dinya êdî tarî bû, hevalê min şalek dabû serê xwe û tûrê wî jî bi pê ve bû. Em epê meşiyar û êdî jî bajêr derketin.

Min rabû ji hevalê xwe re got: Lawo, em bi kû de diçin?! Hemam li kû ye?.

Wî got, min hemameke pir nûjen, baş û paqij nas kiriye, em ê biçinê.

Em ji bajêr baş bi dûr ketin, di riyeke zirav re çûn û paşê bi çend pêlekanaan ve daketin jêr. Deriyê hemamê wek deriyê şikeftan di zinêr de hatibû qewartin. Gava ku em ketin hundir, min dît bi rastî jî warekî gelek hêja ye. Di nivê holê de, curnekî mezin hebû, xulexula avê jê dihat û li kenaran wek sewkiyan ji mêvanan re çêkiribûn,

ku ew li wir cil û kincên xwe ji xwe bişelfînin. Li ser sewkiyekê, li ciyekî vala, me cilên xwe ji xwe xistin, me çarşef li xwe pêça, kîsik û sabûn xiste destê xwe û em derbasî hundirê hemamê, ciyê germ bûn.

Tiştê ku min dît bi rastî jî yekane bû. Li wir, holeke hîn mezintir hebû. Di nîveka wê de, hevzoyê avê û li kenaran odeyên biçûk avakirî bûn. Min berê gelek hemamên bajaran dîtibûn, lê yeke wek vê, ku hevzoyê avjeniyê tê de hebe, min hê nedîtibû. Pêşî me di odeyekê de ava germ li xwe kir, me ew toza û qilêra kar ji ser xwe danî û me xwe avêt nava hevzo. Min hinekî avjenî kir û çend caran bi dirêjahiya hevzo çûm û hatim. Min jî xwe re digot, heqê ketina vê hemamê çi qas dibe bila bibe, bi rastî gelekî hêja ye.

Tenê tiştêkî bala min dikişand û bêhna min teng dikir. Ez bi kê re diaxivîm, wî bersiva min bi kurdî dida, lêbelê her yek ji wan bi yên din re bi tirkî diaxivî. Hevalê min jî wisa li min dikir. Min çi jê re bigota, wî bersiva min bi kurdî dida, lêbelê bi yên din hemûyan re bi tirkî diaxivî.

Piştî ku ez ji ketina nava avê têr bûm, ez li ser keviya hevzo rûniştim, min lingên xwe bi avê de berdand û min ji xwe re li çelqandina avê temaşê kir. Ji milê min ê rastê de kesekî xwe avête nava avê. Gava ku serê wî kete binê avê û hê ling li bala bûn, ez gelekî mat mam. Min tiştêkî gelekî balkêş û bifêş dît. Belê, laşê wî mîna laşê mirovan, lê lingên wî mîna lingên golikan bûn. Min li yekî din ê di nava avê de temaşê kir, min dît ew jî mîna wî ye. Min serê xwe hinekî rakir û

**REWŞEN-NAME**

li wanên ku di dora hevzo re diçin û tèn nihêrî. min dît, ew jî wek wan in. Careke din min li lingên xwe temaşe kir, min dît bi tenê lingên min mîna lingên mirovan in.

Bêyî ku ez tiştêkî bibêjim, min bi dizî çavên xwe gerandin û ez li hevalê xwe geriyam. Gava ku min ew bi cî kir, min dît lingên wî jî mîna yên wan in. Min di dilê xwe de got, hey hawar! Ez bi kû ketime?! Hema ez rabûm çûm ba hevalê xwe û min jê re got, serê min hinekî diêşe û ez ê kêliyekê biçim ciyê hênik. Bi lez min rahişte tûrik û sabûna xwe û ez hatim aliyê pêş. Bi dizîka ve min li xizmetkarên hemamê temaşe kir û dît ku lingên wan jî wisa ne. Êdî çi guman li ba min nemabû ku ez ji refê xwe qetiyame.

Zûka min kincên xwe li xwe kirin, pereyên xwe dan, di dêrî re derketim û di pêlekana re hilkişiyam jorê. Min got, hema lingino bi qurban û min bi lez da rê.

Di nivê rê de mirovek rastî min hat, wî jî min pirsî û got: Camêro! Min bihistiye ku bi vî aliyî de hemameke pir baş heye, tu dizanî kîjan rê diçe wir? Min got: Lawo! Eman bi dûr keve, kesên ku di wê hemamê de ne, lingên wan hemûyan mîna lingên golikan in. Min dît camêro lingekî xwê jî kewşa xwe derxist, ew bilind kir û got: Mîna vî lingê min!

Ez çi bibînim, min dît ku lingê wî jî mîna lingên golikan e. Min bi dest û lepan rê şanî wî da û ez nizanîm çawa min xwe gihande malê. Gava ku ez ketim hundir, min derî baş kîp kir, zû xwe avêt ser rewalê û bêhneke kûr kişand.

Piştî kêliyeke kurt, min dît hevalê min ê kar derî kuta û got: De rabe em biçin hemamê. Bêyî ku ez dêrî vekim, min lêborîn jê xwest û got, hevalê hêja, bi rastî ez gelekî westiyame û îşev nema dikarim biçim çi hemaman.

Ji wê rojê de ye kîjan hevalê min, gava ku bi min re bi kurdî diaxive û bi yên din re bi tirkî, ez yekser li lingên wî temaşe dikim ♦

	cîhan roj
j	I
i	dikim ku xwe li pêsira şevên sar vereşînim
r	gotin hirç ê,
o	peyv kudik
j	ku birçî ma...!
e	II
k	bi kela evîne bi hêrsa êgir
e	li Evdêl cotkanî derbûye
a	III
g	di binê esmanê birêşî de
i	xew dihenike avê
r	IV
p	li ser diranan qatên "nîkotîn"
ê	peyvên xewêr
k	li dil bûne delav
e	ji bivir nermtir
t	wek gêreyekî rê didin xwe
î	V
h	bîranîn wek riyên wînda
e	yên li Keleha Heskîfê
l	ax titûn e
b	bi berfê rapêçayî
e	VI
s	mirovîne bi xewnên zîldaûf
t	ez dikim ku bi du tiliyên rapêçayî re
e	du perdeyan veşîrînim
k	VII
e	hesin sor bû
j	dapalî
i	bû çemekî pînekirî
d	dengê tê ji hesin sortir diherikî
û	peyvên li rîya te direşin
y	bû stêrkek û li guliyên qehweyî vehewiya
ê	VIII
z	peyv weke mastê tîrş êdî dipergife
i	rist wek pisîka xwe li siya mişk xweş bike
r	ji gaveke din pê ve şev,
a	wek kirasê xwêdan lê bûye şîrêz
v	li piştî çavên min bicemide...

# cendek

evdile koçer

**B**ihareke têrşilî bû. Ewrên zivistanê hê jî di ser gund re diçûn û dihatin. Serma û seqema adarê, wekî ku diya min digot, bêbav bû û mirov hewceyî neyaran dikir. Barana ku beriya hefteyekê baribû lîs û gomên cîranên me tijî av kiribû. Piştî wê şepeya mezin, ji bo darên şewatê ev çend roj bû bi hespê xwe ve diçûm ber çemê gund û min qafokên ku li ber avê diherikîn berhev dikir. Çiyayên têrdar bi riya rojekê ji me dûr bûn. Ji ber vê yekê, bê xew bê xew dihatim ber ava gur. Heta êvarê, ji bo çiqlekî disekinîm û bi barê hespê xwe ve vedigeriyam malê.

Ji bo ku bigihîjim xêlê pismamê xwe, wê berbangê zû ji malê derketibûm. Diviya min bilezanda û zû bi zû bigihiştama reqs û tîflîyan. Di rê de, car caran dilopên baranê jî li pozê min diketin. Min digot qey wê şepeyeke nû dest pê bike. Lê di nava çixsaiyê de dilopên hûrik zêdetir nebûn û tîrsa min jî rast derneket. Wek masîgirekî bêhteng li ber çem sekinîbûm. Libolib min qafokên rizî, stûr, dirêj, kurt, tûjik, gewrik, hilûs top dikir.

Ev çemê mezin di navbera du sê çiyayên asê re derdiket. Li gorî hin gotinan, heta sê çar welatên din wekî marekî, xaromaro diherikî. Ava çem îro hinekî şêlî bû jî. Lê dîsa jî, qafokên dirêj ji dûr ve xwiya dikirin. Hevalên ku ji bo çiqlekî qafok serê hev di xwîne de dihiştin, ji sedem xêl îro nehatibûn, mabûn li benda govendê. Ji ber vê yekê, derdor bêpêjin bû. Bi tenê xwişexwişa avê, çikçîka çûkên rengîn dihat. Qafok li pey hev diherikîn û qismetê min jî, ji wan rojên din zêde-

tir bû. Carinan min pê firiziyên xwe bang li çûkên derdor dikir û hêdî hêdî li ava gur dinihêrî, carinan jî straneke dawetê ji ber xwe ve diket ser zimanê min û belasebeb min dubare, sêbare dikir. Ber bi nîvro ve, min ji barekê zêdetir qafok top kiribû. Bi heyecana xêl re min hinekî lez jî dikir.

Bi xwişexwişa avê re heta qederekê jî li govenda xêl fikirîm. Pismamê min wê sê roj û sê şevan xêl bikira û ji gundê cîran wê bi hespê boz bûk bianiya. Niha zavê di nava xeyalên xweziyên xwe de kon vedabû û ketibû nava mitaleyên kûr. Bûkê jî, an ji jiyaneke nû bê hay cihêzê xwe amade dikir, an jî wek gelek bûkan hêsirên nazenîn dibarand.

Bi qafokan re carinan hinek tiştên hûrmûr jî min bi dest dixist. Jixwe ez li tengava çem sekinîbûm û tişteke jî ji serê gopalê min nedibûrî û wêdetir ne diçû. Cotek pêlavên qetiyayî, du sê terhiyên bîmorî, postek hiriyaya pêz, teşteke qul û çend tişt miştên din bi kêrî min nehatibûn, lê ew qapûtê gewrik te digot qey wekî diyarî ji bo min hatibû şandin.

Vêga bi dengê dahol û zirneyê ve govend dest pê kiribû. Min hespê boz anî ber qafokan, diviya êdî biçûma. Dema ku min qafokên erdê li hesp bar dikir, telîsekî gewrik ji dûr ve xwiya kir. Bi giraniya xwe ve di ber keviya çem re hêdî hêdî ber bi min ve kişiya. Xwedê dizane, an barê rêwiyekî, an jî qûtê kalepîrekî yê salekê bû. Ji dûr ve çend tiştên din jî hatin bira min, lê min dev ji barkirinê berda û bi çavên zoq mam li bendê. Di nava çavnêriya min de, carinan bi pêlên biçûk re

## REWŞEN-NAME

li ser avê diket, carinan jî, di bin avê re hêdfî hêdfî diherikî.

Piştî ku nêzîktir bû, min bi serê gopale xwe bi aliyê xwe ve kişand. Lê piçekê jî berê wê neguhirî. Hinekî noqî avê jî bû û dîsa hêdfî hêdfî herikî. Vê carê, heta ser çokên xwe ketim çem û qedera bêhnê bi gavên şelepeli li pey meşiyam. Bi awirên hêrs min telîs bi kotekî zeft kir. Hingê çend nifir jî, ji devê min pekiyabûn. Gava ku min dest tê da, min hingê got, hebe tunebe ev bar ye etarekî ye û ji ser hespê wî ketiye.

Li ser kevirên hilûs, carinan piyê min jî dixijikî. Dû re min kuja telîs girt û hewl da ku ber bi peravê ve bixijikînim, lê ji ber giraniya telîs taqeta min negihîştê. Bi rastî, wê giraniyê mereqa min zêdetir kiribû. Her sal, hema bibêje van çaxan dihatim ber vî çemî, lê ev cara ewil bû rastî telîsekî ew qas giran û ew qas jî ecêb dihatim. Êdfî ji sedem mereqa xwe jî bûya, min ê ji çem derxista. Vê mereqdarîyê hinekî quweta min jî zeximtir kiribû. Vê carê, bi zîqzîqa diranên xwe û bi gavên dirêj heta li ser xîçikên peravê, di nava ava gur re min kişand. Bi wê lezbûnê ve bi piştî ketim erdê. Kuja ku min pê girtibû ji telîs qetiyabû û mabû di destê min de.

Dem a ku rabûm ser xwe, di wê kuja qetiyayî ya telîs de min lingên mirovekî dît. Erê erê, lingên mirovekî... Ziravê min qetiyabû. Wek xewneke sawnak ketibû ber çavê min. Pêştî min bawer nekir, lê piştî ku min telîs heta sêrî qetand, rastî cendekê zilamekî hatim. Li ser devê xwe dirêjkirî bû. Ji ber derbên giran deqên reş û hêşîn ketibûn her derên wî.

Gava ku min piştî wî cendekê birîndar quliband, tevzînokên sawnak ketin nava min. Qirika min zuha bû, bêhn li min çikiya. Ku gotin rast be, hinekî ji mêraniya xwe jî ketibûm. Çavekî vî zilamê reben jê hatibû derxistin, berzika wî heta jêrê te digot qey bi dasekê jêkiribûn. Qirika wî, çawa ku berikek lê ketibe, heta milê din qul bûbû. Porê ku bi aliyê jorê ve şehkirî bû weke ye kalepîrekî spî bûbû. Lê dîsa jî, emrê wî qey sî an jî sî û pênc salî hebû. Dirûv û simbêlên boq, nola mêrên berê, li hev dihatin. Birînen wî nû bûn, welê xwiya dikir ku ji mêj ve nebû hatibû kuştin. Ava çem jixwe birînen xedar şuştibû, lêbelê cardin di nava xîçikên biçûk de aveke sorik herikîbû.

Ronahiya rojê hêdfî hêdfî şewqa xwe diguhi-

rand. Berfa li ser çiyayê dûr fena çirûskeke dixwiya. Te digot qey çûkên li derdorê jî, ji tîrsa vî cendekî firiyabûn dereke din. Dereng mabûm. Cendekê bêxwedî, çawa ku min kuştibe, li ber piyên min dirêjkirî bû. Demekê, min xwe wekî kujerê wî jî fikirî. Lê bi rastî jî, ev cendekê hanê êdfî bûbû belaya serê min. Divê min çareyek jê re bidîta. An min ê bi telîs ve dîsa berda nava çem û xwe jê xelas bikira, an di nava kortalekê de min ê ew veşarta û kes pê agahdar nekira, an jî... An jî min ê ew hilda bibira gund. Belkî xwediye mêt jî, derketana û sedema vê kuştina malxerab jî hîn bibûma...

Piştî çend fikrên din, min ew cendek bi qetek werîs di nava wî telîsî de pêça. Deverû danî ser barê hesp. Pê werîsê din jî girêda û ketim ser rîya gund. Ji westandinê her du piyên min di rê de li hev diketin. Êşa birqa piştî min nû dest pê kiribû. Heta ku hatim ber girê gund jî, çavê derxistî di bîra min de bû. Sedema kuştina vî zilamî wek xencerekê di hişê min re çûbû.

Çi qas ku nêzîkî gund dibûm, dengê xêl û geremola govendê jî pêl bi pêl zêdetir dibû. Ji ber rêçikên xaromaro barê hesp xwar bûbû û piyekê mêt jî ji telîsê qetiyayî daketibû derve. Jixwe min jî nikaribû rast bikira. Eynî bî vî miqamî û di nava teqreqa guleyên kêfxweşiya xêl de ketibûm nava gund. Kolanên gund bûbûn şahidê piyên mêt. Bi hatina min re du sê mirov, çawa ku bibêjin, "Vê roja xêr û bereketê, tu li kê derê bûyî malavayo?" ji dûr ve destên xwe hejandin. Lê bi dîtina telîsê ecêb û bi piyê daketî re dengê mirinê mîna şapekî bi ser gund ketibû.

Deng ji govend û kêfxweşiya dawetê biliya. Xêlî û mirovên li derdorê bi carekê ve bi ser serê min de kom bûbûn. Çarnikarê min di nava çend deqeyan de bûbû ciyê şî û qiyametê. Mirovên ku ji govendgirtinê şil û pil bûbûn, çawa ku zimanên xwe yê biçûk daqurtandibin, bi çavên zoq li piyê mêt dinihêrîn. Zava jî, bi rengekî matmayî û bi bedlê xwe ye nû ve nola gêjan lê dinihêrî.

Piştî ku min hal û meseleya xwe ji wan re got, cendek danî erdê. Çend mirovên navsere bi awirên dilşewitî lê nihêrîn, lê kesî nas nekir. Mad û mirûzê her kesî xera bûbû. Her yek, rûyekî din ketibû ser wan. Heta ku kalepîrekî ew cendek nas kir, yê din ji sedema wê kuştinê re sed tişt gotibûn.

Wekî her kalepîrî dilê wî jî şewitibû û dengêkî

zirav û zîz jê çûbû: “Hey lo evdaloo bextreşoo...  
Hey lo felekoo malikmîratooooo.....”

Li ser mêyt, heta bêhnê jî bû niçeniça wî. Lê dema ku got, kurê filankesê ye, rengê zavê ji nişkê ve qulibûbû: “Wîî!.. Malmîratno, ev!.. Ev kurê Bîrahîmê Xelîl e!..”

Gotinên wî kalepîrî dihat wê wateyê ku ev cendek kekê bûkê, ango bûrayê zavê bû. Ev roja xweş û delal êdî ji pismamê min re bûbû rojê reş û tarî.

Êdî nefes jî nedihat û nedîçû. Tarî di nava bêdengî û matmayîna gundiyan re ketibû erdê.

Roja din, xebera mirinê kete mala bûkê. Bi

hawara xwe ve hatin, cendekê xwe birin û li ber kuştîyên xwe yê din veşartin.

“Neyarên wan zêde bûn...” Zava dema ku ji gundê destgirtîya xwe hat, welê digot.

Lê gotinên ku dû re diya min ber bi guhê min xist, êşa birqa piştî min zêdetir kiribû: “Ew du roj bû wînda bûbû. Rebeno, bo xêlê xûçka xwe çûbû nêçîra xezalan.”

Piştî vê yekê, bûk jî ji ber kuştina kekê xwe dîn û har bûbû.

Û hinek tiştên din jî digotin...

Xêl jî, Xwedê dizane, an wê bihareke din çêbibûya, an jî qet...♦



### rojdar

S  
i  
k  
r  
a  
t  
a  
  
S  
e  
v  
ê

li eywanê disincire mirin  
çermek li ser siya sar  
bi werîsekî ve daliqand jin  
kirasê ji etaran hatibû kirîn

li tenişt şanzdeh zarû  
bi tenê hestiyên rût û tazî ne  
li dû kemînê  
bê guh  
bê çav  
û bê kenîn

ez kal im  
ez pîr im emro  
kulmek xwefî jî nîn im  
birijim ser goştê miriyê xwe

ax! li benda pal  
dema goşt petiya  
bêrik jî weşiyar  
û li ser erdê riziyan

ez kal im  
ez pîr im emro



# ceribandineke ji êgir

mûsa vazgalî

Ev qilî qilî du sal û nîv in ez li vî bajarî, wango di vê aşxaneyê de hostetiyê dikim. Hewce nîn e ku ji te re salixê hatina xwe ya vî bajarî, serbûriya xwe, zûrî û zicra ku min dîtiye bidim û serê te pê biêşînim. Mîna her hemwelatîyekî xwe min jî serê sibehekê gundê xwe yê ku her tiştê min li wir li ser hev bû wînda kir. Min jî, berê xwe da nediyariyên xerîbistanê û ne zarokatiya xwe û ne jî ciwaniya xwe jiyam û min gelek salên dirêj di vî temenê xwe yê kin de tepisandin.

Belê, ez zêde serê te neêşînim û vegerim ser bûyera ku di jiyana min de bûye nişana ecêbmayîne. Xwedîya aşxaneyê, ango Xatûna min, jineke bî ye. Tenê lawekî wê heye. Di darê dinyayê de tenê li Xwedê û li wî lawikî dinihêre. Xatûna min piştî ku bi lawê nexweş ketiye, mêrê xwe di qezîyêke trafîqê de ji dest daye. Piştî mirîna mêrik, Xatûnê xwe daye ser kurê xwe û careke din mêr nekiriye. Kur îja çi kur! Xwedê kurekî wîsa nede dijminê min. Tenê karê wî ji sibehe heya êvarê tûlîti û tolazî ye. Pereyê jinika reben ser xwe û bin xwe re dike, bi keçikan dide xwarin û digere. Xêncî zerarê tu kar û kuspeke wî nagihîje tu kesî. Gorbavê gorbav. Carcaran Xatûna min gazine wî li min dike, "Qey ew ê gora min zêrîni bike, kezêb e û dişewite." dibêje. Jinika feqîr di destê gorbavî de ketiye arzarê. Ji jineke wiha jîr û jêhatî lawekî wiha tol, mirov şaş û metel dihêle. Gotina, ji dê û bavan hezar celeb dikevin, rast e bavê min. Ewladê xerab xezêba Xwedê ye.

Ha! Bêyî ku ji bîr bikim, ez û lawê wê hevraz berjêr berxên salekê ne.

- Lebê.

- Lebê şêrîn bavê min. Xatûna min jineke gelekî jîr û jêhatî ye. Ev dem û dezgehên aniha ez lê star dibim bi neynûkan ve çekiriye. Bi karê xwe ve gelekî girêdayî ye. Her sibeh di saeta xwe de tê ser karê xwe û êvarê jî di saeta xwe de derdikeve û diçe. Tu carî li aşxaneyê xuriniyê nake. Bi tenê li aşxaneyê navrojê dixwe. Xatûna min gelekî jî bedew e. Temenê wê devî devî çil saliya xwe dike, lê tu çav pê dikevî, tu dibêjî qey qîzeke kezî ye. Her wisa bedew e ku ez nizanim ji te re bi lêv bikim. Her wekî dema ku Xwedê ew afirandiye, wê rojê qet tu kar û barên wî yên din tunebûne û hemû hunermendiya xwe di wê de xerc kiriye. Tenê zend û bendê xwe wê rojê ji bo xatûna min hildaye û di dem û dezgehê xwe yê herî baş de ew çekiriye. Hemû horî û milyaketên xwe ji bo baştirîn çekirina xatûna min seferber kiriye. Xwedêyo, ew çi huner e, ew çi berhem e! Mirov hişmiraz dike li bejn û bala wê, çakûçê rûyê wê, liv û meş, axaftin, tevger û li her tiştê wê binihêre; pêkan nîn e ku mirov bê qisûr tarîfa bedewiya wê bide. Ji bo ku mirov bi bedewiya wê bihise, divê bibîne û pê re bijî. Bila di darê dinyayê de, ne zêde, tenê rojekê çonga xwe bikute ber çonga wê, wê çaxê kêfa Ruhstîn û heftê heft bavê wî ye. Kî êdî talaşa xwe ji mirinê digire. Bila ew di darê dinyayê de tiştêkî mirov be, an yarek be, an xwişkek be, an jî diyek be, wê çaxê bila tûrekî parsê yê qul li milê mirov be û bi parga heftê heft duwalan miraz neke, ne xem e. Dibêjin, jin hene, jinkelot hene. Xatûna min kihêleke jinan bû birayê min. Kulê tu bi mala bavê bedewiyê bikevî. De tu dizanî birayo, di çîrokên de salixê bedewiya jinan didin, di kila-man de tê gotin, ji bo biskê porê zerîcanekê eşîr

beredanî hevdu bûne. Di riya jineke mîna xatûna min de, deh artêşên mirov jî hebin, hêja ye mirov, bide ber şêr.

- Lebê!

- Lebê şêrîn bavê min. Ez ji bavê xwe re bibêjim, ew dûzana Xatûnê, ya min ji te re got, serê sibehekê xerab bû. A ku ez ê ji te re behs bikim ji vir de dest pê kir û jiyana min careke din hilda li erdê hişt û xiste riyêke nû.

- Belê, ez li qatê li ser aşxaneyê, ku beşa midbexê ye, di xewê de bûm. Dema ku dengê zengila dêrî hat, ez ji xewê veciniqîm. Min got qey ez di xewê de mame. Ez her çi qas merivekî xewar jî nîn bim, lêbelê dîsa tiştên wisa diqewimin. Ez bi wê sergêjîyê çawa ji nava nivînan pekiyam min xwe li ber derê jêrê dît. Min bi derî vekirinê re ne jinek, periyek li ber dêrî dît. Xatûna min wê serê sibehe mîna keweke gozel xwe xemilandibû. Li ser bejna wê ya mîna dareke spîngdarê dêrekî çit î pitpitî heya nîvekî hêta wê dihat. Pêşîrên wê yên çilqerqas heya nîvekî hingilan vekirî disekinîn. Te digot hingilên wê yên serê xwe di nava pêşîrên dêre de veşartine aniha wê bipijiqin û derkevin. Şirîtek mircanê spî heya ser hingilan daliqî disekinîn. Porê xwe yê mîna teniya sêlê heya ser defa navmîla xwe berdabû. Por her wisa diçilvilî, te digot gulavtûn e.

Her du çavên xwe yên reşbelek mîna du tasan kil dabû. Birûyên wê di binê mijangan de te qey digot tîr û kevan in, her wisa ragirtî û tûj disekinîn. Herçi lèvên wê, qet tu behs meke! Her wisa zirav bûn, te digot pelên gulê ne. Ew jî, bi soraveke sor boyaxkirî bûn. Bejna Xatûna min mîna dareke spîngdarê bi derbiharê re gul vede li pêş min disekinî.

Min devê xwe tijî kir ku "Xatûna min te di wê saetê de xêr e?" bibêjim, lê min dît ku çavên wê ber bi lîngên min daketin û beşevhat. Min seh kiribû ku di rewşa min de tiştê heye, lê ne ew bû ku ez li bedewiya wê, ne ew bû ku jî li xwe binihêrim. Gava ku min di ser xwe de nihêrî, rûyê min çû erdê. Min di dilê xwe de got, bila Xwedê erd veqelişe û ez tê de herim. Min di e'mrê xwe de bi qasî wê carê şerm û fedî nekiriye. Êdî şermana dest û piyên min bûne tevhev. Di ciyê xwe de biziyam û mîna biskek hirî çilmisîm û sekinîm. Reng û rûçik li min guhirîn. Sifet li min bûn kade, soromoro bûn. Ji birayê xwe re bibêjim, Xatûnê jî dît ku ez şermî bûme, destê xwe li serê

min xist û bi pêlekanên darîn ên midbexê ve hilkişiya. Di nîvê pêlekanan de, "Hoste, şorbeya te amade be, ji min re tasekê bîne!" got û derkete jorê. Min ji stîla şorbeyê jê re tasek tijî kir û heya nîvê pêlekanan anî û sekinîm. Ji bo ku careke din min di wê rewşê de nebîne min bang lê kir, ku li ser devê pêlekanê şorbeya xwe hilde, heya ku min kincên xwe li xwe kirin. Lê tu ne talaşa Xatûnê bû ku ez rût im, an tazî me. Ji min re hilda got, "Hoste, tiştê nake, wêre!". Min dît Xatûn bi ya xwe ye û çare nîn e, min di dilê xwe de "di gorê de, rûto ha li vî alî, ha li wî alî" got û ez ber bi wê çûm. Çûyîne ez diçim, lê dîsa jî ji şermana teşkên min li hev dikevin û dest û piyên min li hev diwalin.

Gava ku ez ber bi maseyê ve çûm, min dît ku Xatûnê li ser maseya li navbera midbexê her piyekî xwe xistiye felqeke kursiyekê, rûniştîye. Bi awayekî wisa bê tehr rûniştibû ku, min ji şermana di aliyê wê de nema dikaribû binihêriya. Jixwe dêreyê ku li xwe kiribû heya nîvekî hêtên wê dihat, dema ku rûniştibû jî, te digot qey tiştê li xwe nekiriye. Git û bitên wê yên ku dilê mirov ji ser mirov dibtrin li navberê qoş disekinîn. Gava ku ez tam li pêşberî wê sekinîm ku tasa şorbeyê daynim ser maseyê, min tiştêkî di heyata xwe de nedîtibû dît. Xatûna min başewal bû û li hemberî min rûniştibû. Bi çavpêketinê ve av ji binê guhê min çû. Serê min gēj bû, destê min ricîfî, çavên min reşevhatin û hindik mabû min tasa şorbeyê bi ser xwe de birijanda. Bi çi kulhalî min tas danî ser maseyê û kir ku ez bizivirim, Xatûnê bêyî ku emarê xwe xerab bike, ji min re. "Hoste, rûnê!" got. Ez di ciyê xwe de tevzîbûm. Têra bîstekê ez li şîpê bê tevger û bê bersiv sekinîm. Min dît ku Xatûn jî ciyê xwe rabû, hat dest avête qeydika min û ez li pêşberî xwe dame rûniştandin. Dema ku rûnişt, îcar bêtir pêşên xwe ji ser xwe bir. Ez mîna darekî li hemberî Xatûnê sekinîbûm. Têra bîstekê her wisa li rewşa min nihêrî. Xêlekê paşê min dît ku piyê wê yê rût niçiya hêta min. Min pêşiyê qey got bi nezanî lê dikeve. Hinekî min xwe bi paş de kişand û civande hev. Naxêr, min dît dîsa wisa dike. Û îcar bêtir bi ser min de tê. Di nava wê sergêjîyê de nedifikirîm ku armanca Xatûnê çi ye û dixwaze çi bike. Bi piyên xwe ji tiliyan heya serçonga min bir û anî. Êdî min fêhm kir ku mîza Xatûna min ne zelal e. Mîna ku bedena min bidin ber derziyan, her wisa tevzî di canê

## REWŞEN-NAME

min de çûn û hatin. Agirekî di serê pêçiyên ve xwe bi bedena min ve girt û ez serdanpê dame ber xwe. Agiro, kê tu gurkiro!.. Bi rastî ez dişewitîm. Di dilê xwe de min digot, "Aniha agir ê di bedena min de hulopanî bide." Hêdika tiliyên xwe yên mîna singiran xist nava tûncika min û heya potika min bir. Ez tîfalê Xwedê di nava tilî û pêçiyên wê de bûbûm hêlekan û diricifîm. Çav li min bûbûn kasikên xwîne. Min digot, aniha dê ji kasikan bipijiqin û birijin. Serî li min bûbû dew. Dilê min xayizevedihat û min dikir ku ji xwe ve herim. Çi bi min dihat hê jî şaş û metel im. Qîza bêbavî mîna dêlegureke nava çile, ku bêhna xwîne li min hilkiribe, ez dadibarandim. Te digot qey ez kelaxek im û wê dil heye ku min ji hev derxe û pûrteveke.

Min kir ku ez tiştêkî jê re bibêjim, lê min nema dikaribû xeber bida. Gilî di devê min de zivirî û bû lepelepa devê min. Şerm, heyecan, dudilî; her tişt bûbû tevlihev. Bawer dikim ez qutifbûm.

Min nema taw dida. Di aliyekî de êrîşên Xatûnê yên ji êgir, di aliyê din de dudilî û sergêjiya min. Ji nişkê ve, ez jî nizamim çawa bû, min biryara xwe girt ku ez divê ji ber êrîşên Xatûnê tîkneçim. Çimkî heya niha min bi çavê diyekê, bi çavê xangekê, an jî bi çavêkî din li wê nihêribû. Tu carî heya niha hestên min li wê ranebûbûn û aniha ji nişkê ve jî ne pêkan bû ez tiştêkî wiha bikim. Tu carî dilê min hilnedida ku ez bi wê Xatûnê re serê xwe tîxim yek. Wê bê hesab qencî li min kiribû. Di rewşeke gelekî xerab de, bêtî ku min nas bike, bi destê min girtibû û ez derxistibûm roja îro. Li hemberî van qencyên wê min nikaribû şîrheramiyeke wiha bikira. Divê min qencyên wê bişêkirandana û wê şaşî bikira jî, min pakiya wê bixwesta.

Ji nişkê ve zirzeya devê min filîfî û ez bi ser xwe de hatim. Min bi destên wê girt û "Xatûna min, ez tika dikim bi ser xwe de werin. Ev tevgerên we li hemberî min şaş in. Herin bela xwe li aliyekî din bidin." got.

Xatûn, mîna ku ji kerê bikeve, li hemberî tevgera min sik û sar bû û enirî. Hilda ji min re got: "Dilê min di te de heye; çavên min jî hinekên din dibînin. Tu dewê min ê ceribandî yî. Ez te bi qatixê neceribandî naguhirim."

Min: "Ew qencî û pakiyên ku te li min kirine pêşiya vê yekê digirin. Ez nikarim şîrheramiyeke wiha bikim. Ger ez qencyên te bînpê bikim û

neşêkirînim, ez ê ji hev de hurşim. Ew keda ku te ji min re xerc kiriye dê berê çavên min bigire, dê di firnikên min re were. Na Xatûnxan, na..."

Xatûnê:

- Hoste Ebas, binihêre Xwedê goşt dide yê bêdiran. Hingî ku mîrê min miriye min postê peza nêr li xwe neherimandiye. Ji wê rojê û vir de min yekî di tayê xwe re nedîtibû û ez jî can im û bêriya van tiştan dikim. Ev çend sal in ku ez keliyê vê kambaxê me. Dev ji vê bêhişiyê berde û ji min re kaya kevin nede bê.

- Na Xatûna min, ez tika dikim ez ji vî karî re tuneme.

Bavê min, Xatûnê nexist nemerdî, hilda ji min re got: "Dibe ku tu ji mîraniyê ketibî ha?! Kiyê din bûya, yê bi çar lepan xwe biavêta ser. De ka bibêje."

Bavê min, dema ku Xatûnê ev t'en li min xistin, ez çilqijîm. Min xwe nema girt. Bi wê hêrsê min dest avêt zenda wê û ew kaşî pişt dolabê kir. Ew qolîkê li min bû jî min ji xwe xist. Rûyê min bin piyê te be, min jê re "Kerem bike bibîne ez mîr im, an na. Lê çavên te kor bibin jî, ez serê xwe bi te re naxim yek." got û pişt xwe dayê, ez ber bi dolaba kincên xwe çûm. Min hazûkave kincên xwe li xwe kirin û zimanê kilîta wê girt, avête ser maseyê. Ez vegeyiyam ser Xatûnê, ku xatirê xwe jê bixwazim û serê xwe hildim ji wir herim. Min dît ku Xatûna min li ber dêrî sekiniye. Û vegeyiyam ser min, got:

- Her tişt helalî te be Hoste Ebas. Ez û tu em tev bi ser ketin. Tu dizanî min çima wisa kir? Ka binihêre ev çi ne.

Di destê wê de, du bilêtên balafirê hebûn. Dirêjî min kir û min lê nihêrî. "Ev çi ye? Ez jê fêm nakim." min got.

"Hoste Ebas, min tu ceribandî, lê tu netewiyayî. Bi tenê ez dikarim di darê vê dinyayê de xwe û her tiştê xwe bispêrim te. Ji îro û pê ve aşxane ya te ye. Ez ê lawê xwe bibim Elmanyayê ser doxtor. Êdî her tiştê min yê te ye, heya ku ez tîm." got û xwe avête hambêza min. Milên xwe di stûyê min re bir û her du çavên min ramûsa, xatir ji min xwest û çû.

Gava ku ez li pey derketim derve, kurê wê Alptekîn di erebeyê de bû û ji min re beşevhat.

"Hoste, ez te pîroz dikim! Bi xatirê te!" got û her duyan, heya ji çivangehê ve winda bûn, ji min re destên xwe li ba kirin û çûn ♦

# Danişîn

h. kovan baqî

Her kes li ciyê xwe rûnê, danişîna sedsalê hdest pê dike. Ji bîr nekin ku îro em dikevin devê deriyê mîladeke nû. Beriya ku danişîn dest pê bike, ez dixwazim bibêjim, ev roja taybet ji bo gel û welêt roja herî bixêr e.

Kursiyên beşdar tevan bo wan peyvên bidahk ên dadgêr bi hev re li çepikan xistin. Heke destûr hebûya, derî û pencereyan jî dê ji wî re li çepikan bixista.

Dadgêr bi hişkî çakûç di rûyê maseyê de lêxist:

-Huşşş bin!..

Xweziya kursiyan di ber de ma. Huşbûn çarenûseke qewîn e û ji roja roj de ji bo kursiyan saz bûye: "Ku yek wechê xwe ji vê re tirş dike, bi xweşkahî lêvên wan têne dirûtin."

Kursiyê rêza pêşî yê layê çep ji kursîtiya xwe zivêr bû. tengijî, ji ber ewtefta dadgêr tilîkên xwe xist guhên xwe. Dihat ku rabe ser xwe û her çar lingên xwe di serê wî hêr bike. Kir û nekir lingen wî bi ya wî nekir. Kursiyê li pişt wî bi hedî devê xwe xist guhê wî:

-Huşşş!.. Lawo ma te ji bîr kir ku kursî çêbûye ji bo di ber yên xêndî xwe de were girêdan? Ev ne sûcê me ye. çimkî textikên me ji bo qûnên qelew hatine birrîn.

-Ez fêr dikim canê min, roj bi roj qûnên ku li me siwar dibin mezin dibin û em tim wekî xwe ne. Wilo çênabe.

Kursiyê li pişt wî li gotina xwe poşman bû.

Çavên kursiyê pêşî ketin lingên kulek ên dergeven, li pêş çavên wî çî qas xweşik radihiştin gewdeyê xwediyê xwe û ji teşiyê siviktir dizîzikîn, vegeriya ser her çar lingên xwe de, şîşeke sersor bi serê gurçika wî de venijî.

Dadgêr cara duyem çakûç di nava maseyê de lêxist, vê carê hilma kursiyan jî nedihat bihîstin, bi tenê guhên wan bi dengê dadgêr re dirêj dibûn:

-Bersûc lawê Ewêşê, rabe wesiyeta xwe bik!

Kursiyan tevan bi çavine ecêbmayî li çavên hev nihêrîn, li benda lingên bersûc bûn. Dengê bazikê mêşekê ji qorzika dawî ya hêwanê bilind dibû. Defekê di dilê wî de bi guhê ahengeke tirsonek girtibû. Bêyî ku bersûc li hêwanê xwiyanî bibe, yan jî deng ji kursiyekî bê, çakûçê xwe bilind kir û awirên wî li ser kursiyan dilîstin.

-Li vî welatî, mêr heye ku min bitirsîne?

Kursî tamam li cûtina benîştê xwe sor bûbûn. Yê bidîta dê bigota teqez diranek di devê van kursiyan de tune, eger ne ji vê rewşa kursiyan bûya, dadger nedibû deve.

Kursiyê pêşî bi tenê didît ku diranine tûj î bêsûret ji girçika dilê dadgêr de dadikevin. Wê jana bênavnîşan malik lê wêran dikir.

Dihat bîrê: Roja -piştî xwendineke pir- di hemû azmûnan de bi ser ket û ji layê bijîşkê nexweşînên derûnî û giyanî ve bawernameya dadgeriyê wergirt, bijîşk werê jê re got:

## REWŞEN-NAME

-Me ji bo jîrekî û wêrekiya te tu layiqî vê sendromê dît. De heydê bi xêr û xweşî ji bo malaştina hewşa bîrdoz û diwaroja komara me bi kar bînî.

Dihat bîrê ku ev cara yekem e di jiyana xwe de li tiştêkî poşman dibe. Niqaşine tûj di nava wî de dest pê kiribûn. Ji bavê re dida sixêfan ku çima hilkişîya ser dilê diya wî û ew li ser malzaroka wê resim kir.

Kursiyê rêza pêşî ji yê li pişt xwe re digot:

-Sendrom kirasekî derew e ji gewdeyê xwediyê xwe re.

-Kursiyê paşiyê xweziya xwe daqurtand:

-Huşş, tu yê serê min jî têxî pirrika xwe.

Bavê komarê di tabloya dîwêr de wechê xwe bi dadgêr re tîrş dikir:

-Zû karê xwe bike, sendrom ne li bala kursiyan e.

Dadgêr cara sêyem çakûç di rûyê maseyê de lêxist: destê xwe dirêjî nava çavên kursiyan dikir:

-Îro ez ê wê bikim lingekî stewiyayî ji komarê re.

Tevî ku bi qariyer û zirtbûna xwe li ber çavên kursiyan bûbû deve, bi xwe derdixist ku her roj danîşîneke bi vî rengî bi rê ve bibe. Dilê golikekî di sîngê wî de şîn tê û tê ku ji kîvroşkekî bêtir bireve. Lingê wî di binê gewdeyê wî de dilerizin, kursiyê hişk dev li ebayê wî kiribû û bi xwe ve girêdabû. Ew 'diranên bêsûret' hêdî hêdî di rûyê dilê wî de dadiket. Hinavê wî veleriziya, dirêj bû, zirav bû, zirav bû, bû ta. Gotina bijîşkê nexweşînen derûnî û giyanî wekî şivterka hinarê di birûska hişê wî de lêket. "Sendrom ziravê qetiyayî ye. Eger lastîk bûya, dê veleriziya. Îca li devera tunebûnê tu karê qetandinê nîne."

Destê xwe bir ser hinavê xwe, tilîkên wî di valahiyeke nerm de çûn xwarê, diranên bêsûret hinekî din jî di dilê wî de daketin.

Hat ku serê diya xwe bi sixêfan bişo ku çima wê şevê. bavê wî li ser sîngê xwe siwar kir.

Lêvên bavê komarê ji tabloya pişt wî dirêjî guhê wî bû:

-Eger beq bi zimanê çeman nestrê, ava çeman kevezê nagire.

-Bibexşîne. lê ez dibêjim ji çeman bêtir, em hewceyî dîrokê ne.

-Me tu dîrokên xama û azib nehiştine.

-Ez ne şaş bim me temamê çeman ji xwe re kiribû refîka solan.

-Zêde nereye! Ez ji te re dibêjim tu beq î û qediya.

Dadgêr xwe dît di binê maseyê de bi enîşkan diniqirçand noqên cîgirên xwe.

-Xwe binepixînin.....

Her du cîgir li vekirina qayîşên xwe şerpeze bûn. Qûnên xwe beloq kirin û serên wan mabûn di binê maseyê de. Dadgêr ji binê maseyê derket, rabû ser xwe, ji hêrsan zimanê xwe dicût, bi kulmikan kişîya qûnên wan:

-Lawo hela yê min penûsa min ketibû binê maseyê, ez li penûsê digeriyam, lê ev qûnên we yên bilindbûyî li çi digeriyam hîî...?

Cîgirê wî yê li layê çepê serê xwe ji maseyê kişand:

-Çi zanim? Min got qey tu dikî pif bikî zîlê.

-Niha ne wext e, çimkî em ne li ber çêmin. De zû qayîşên xwe bişidînin. Bextê me lêxist ku binihêrin me ne ji goşt û hestî ne û ji zû ve ken jî ji bîr kirine.

Kursiyê rêza pêşî devê xwe xistibû guhê kursiyê li pişt xwe û dikeniya:

-Eger me bizanibûya em bigiriyana, me yê devê xwe têxista guhanê vî deveyê nêr û şîrê wî bimêta heta ku bibûya golik.

Kursiyê li pişt wî serê xwe berda xwarê:

-Ji bîr nekin ku em ji malzaroka darê ketine.

Dadgêr cara çaremîn çakûçê xwe di nava rûyê maseyê de lêxist:

-Bê deng biin! Danişin dest pê dike.

Kursiyan li nava çavên hev dinihêrin. Serê wan di nava destpêkên bêdawî de dewx bûbûn. Nema ji hev derdixistin ku destpêk li dû dawiyar tê.

Kursiyê rêza pêşîn li ser milê rastê ber bi kursiyê li pişt xwe ve zivirî:

-Ev qas heyirî nemîne! Di destûrname û exlaqê vê dadgehê de destpêk û dawiyên tevlihev tiştêkî pir normal e, ya rast tiştêkî nenormal bi tenê heye li vê dadgehê, ew jî bêdengiya civaka kursiyan e.

Kursiyê li pişt wî awirên xwe qorzîk bi qorzîk direvand:

-Ez ji te re dibêjim bes. Ez bi qûna du sed kilo jî qayil im, îcar jî tu dev ji muzuriyên xwe bernedî, ez ê bi gotinekê bi tenê te bikim kapek.

-Jixwe tu ne li pişt min bibûyayî, her çar



lingên min wilo xweşik nedihatî girêdan, îca zimanên beradayî piştî destên girêdayî zêde dibin...

Dirredidira dadgêr xweziya kursî di ber de hişt:

-Lawê Ewêşê rabe wesiyeta xwe bik!

Pêjna bersûc nedihat bihîstin. Dergevanê kulek di nava kursiyên de li bersûc digeriya. Çermê kursiyên hêdî hêdî dicivîya hev û guhên wan dirêj dibûn. Dergevên ji xêndî guhên dirêj tiştekan li hêwanê nedît, berê xwe da hêwana li derveyê dadgehê û lingê wî yî kulek wek marekî li dû wî dikişîf:

-Lawê Ewêşê yê mezin, danişîna wê dest pê kir!..

Reşîna girs ji tozê şiyar bûn û li ber dadgêr sekinîn:

-Fermo!

Dadgêr xilçên xwe temam di axa diya dergeven de diçikand.

-Min yek xwest, te keriyek anî...

Dergevên berê xwe da reşên ji tozê:

-Mîrzano, çewtiyeke teknîkî çêbû, min gazî lawê Ewêşê kir. Qîrîna koroya reşên ji tozê mû li canê dadgêr û bavê komarê û cîgir û dergeven kir şûjin:

-Ez ew im.

Dadger wek hêlancûkê lerizî li jora dergeven:

-Ka ka kaa... nasnameyên wan bîn...

Dergevên hembêzek mişt nasname rokirin ber dadgêr.

Dest bi xwendina navan kir: "Medê Ewêşê, Amedê Ewêşê, Botanê Ewêşê, Mijdarê Ewêşê, Tebaxê ...." Nasname ji nava tilikên wî yên lerizok ket xwarê. Reşê ji tozê rahişt nasnameya xwe û kenê xwe yê xweşik danî rexê çakûçê dadgêr:

-Nasnamenasin karekî hunerî ye, ma hesp ji hunerê fêm bikira, çima wê barê tolanê hilgirta?!

Dadger dihat ku ji ber toz û rimilkê bifetise. Diwarek bi tenê jî di nava wî de li ser lingan neman. Têgihîşt ku 'tirs' tişteki xêndî hunerî ye û ew diranê bêsûret jî ji ber vê yekê di dilê wî de kûr dadikeve. Qijîna qijîkekî sergêj ji nava wî derçû:

-Eger zikê vê Ewêşê biçûk bûya jî, niha ji zû ve tiştîşî bûbû.

Bavê komarê li ser bejna dîwêr 'ka'ya paşerôja xwe ya gemarî berba dikir. Destê wî di pîstîka

serê wî de, ji bo dîtina hevîrtirş dilivîya. Giloka mêjî tevî konikê pîrê ket kefa destê wî. Lîngekî ji qetranê giloka mêjî di kefa destê wî de ji hev belawela kir:

-Yê sûcê dîrokî bike, zikê dîrokê têra wî nake.

Gosreyekî şikêran dest bi kotina hestiyê parsûyê wî kir. Dev di qirikeke zuha de vebû:

-Min dengê rewrewa kûçikan temamî bilandin. Û yê te tamar di te de nalive. Lê rojekê pûtperest bi rewşa xwe bihisin, tu yê çî bikî hîî...?

Gosreyê şikêran bi rêk û pêkî li ser hestiyê parsûyan diçû û dihat. Bavê Komarê destê xwe danî ser parsûyê xwe û bi weçekî damayî di tabloya xwe de mexel hat.

Dengê bazikên mêşekê jî dawîya hêwanê dihat bihîstin.

Xiştexiştêke nenormal guh li Bavê Komarê û dadgêr û kursiyên tevan dirêj kir. Dîrok bi weçekî damayî ji nava dosyayeke bitoz î di gumdîne de rabû û wek çiyayekî ji xwelîyê li hemberî dadgeran sekinî, destê xwe yê tarî xist zikê xwe, sikeletê xelkekî şewîtî derxist û danî ser maseya dadgêr:

-We pišta min di binê vî barê giran de cedewî kir, ji niha û wê de hûn barê xwe hilgirin.

Dadger fîzand, keriyek dergevan li ser serê dîrokê hatin hev, bi kulmik û pêhnan ew gêrî ciyê wê kirin. Kursiyê rêza pêşî nema karîbû bi xwe, devê xwe dîsa xist guhê kursiyê li pişt xwe:

-Çi qas bi xweşkahi karê xwe dikin. Tu dibêjî qey ew dîrok ji berê de tunebû.

-Eger tu naxwazî hinekî din jî barê dîrokê giran bibe, dengê xwe neke.

Çakûç di destê dadgêr de dihezîzî, tevî wilo, ji carên din tevan hiştir ew li nava rûkê maseyê de lêxist:

-Biryar!..

Li gorî xala 2001'ê (Xala Parastina Mafên Şorbexwir û Gêj û Hestîkoj û Bêrikqulên Welêt) ya destûrnameya bîngêhîn, ji bo ku lawê Ewêşê pêhna xwe li tasa şorbexwiran xist, qîra hestiyên anî, bêrikên bêrikqulan temam zîvarzîvarî kir û ji bo ku gêjên me yek bi yek didize. (Çimkî serdestî temam li ser pišta gêjan şîna tê.) Me pêwîstî bi dayîna cezayê dardakirinê dît.

Peyva reşê ji tozê ji nişkê ve gulên ken temam li ser axa lêvên wî çilmisand:

## REWSËN-NAME

-Jixwe hûn ji roja roj de kesên qels ji hebikên morîkan xweşiktir li ser ben bi dar ve dikin.

Dadger veciniqî, diranê bêsûret hinekî din jî di dilê wî de daket. Reşê ji tozê li ber çavên wî bilind dibû, fireh dibû, kûr dibû, ronî dibû:

-Tu kî yî looo.... mêvanê bêwext?

-Ne hewce ye, çimkî hezarên diranên seqakirî di rêza li pişt navê min de, li benda hin deverên te ne. Ji ber wilo ez ne bawer im ku tu bixwazî ez navê xwe ji pêşiya wan hilfinim.

Diranên bêsûret ji xwe re hestiyên parsûyên wî dikeritandin. Janeke bēnavnîşan dîwarê gewdê bi ser hev de diherifand:

-Aaaax.... jî xêndî van diranên bêsûret nema tu kesî nas dikim. Heta bavê xwe jî.

-Ûca ez ji gotina te bawer dikim, çimkî her libatekî bavê te di gewdeyê mêrekî nenas de bi cî bûye û ne mimkûn e ku diya te jî êdfî bikaribe di nava hêwirzeyeke nenas de bavê te nas bike.

-Kerê ku barê te ne lê be, ço neke, tu niha navê xwe bêj!

-Lawê Ewêşê.

-Çiii.....?

Diranê bêsûret kêrtikeke din di dilê wî de daçikiya, guline zer li seranserê canê wî vebûn. Dikir ku xwe bavêje bextê cîgirên xwe. Ber bi çepê xwe ve filitî, li dewsa cîgirê wî, komek cîl li ser kursiyê bû. Destê xwe yê hezhezok dirêjî koma cilan kir, kêzikekî reş î biçûçik ber bi şibakê ve firiya, tevî valahiyê bû û ji ber çavên wî winda bû. Kursiyên tevan bi çavine lal li koma cilên rexê dadgêr dîniherî. Bi aliyê rastê ve zivirî, du guhên zirav û dirêj ji zendên çakêtê li ser kursiyê kişiyabûn. Bi tilikên xwe niqirçand noqa çakêt, bû firtefirta kîvroşkekî û ji nava çakêt bazda. Li lingê kursiyê pêşî siwar bû, quloz bû, rast berê xwe da keçika nivîsyar. Kete nava her du guliyên ji berfê û di 'lan'a xwe de mexel hat. Bû qijewîja qanqûrûyekê û di dêrî re derket, kîvroşk hê jî di lana xwe de bû.

Diranên bêsûret kêrtikeke din jî di nava hinavê wî de daçikiya. Dîwarên ku bûbûn star ji piştê wî re yek bi yek bi ser hev de herifin. Di nava wêneyê Bavê Komarê û lawê Ewêşê û civa-ka kursiyên bêzar de xwe didît wekî ferman-darekî bêleşker û li şevistana çiyayekî erjeng bi tena serê xwe hevîrê tirseke xerîb distra. Xiştina

kêzik û marmarok û kîso û pelan bawernameya wî di gerfîneka ava bîra mêjîyê wî de diçirisan. - sendrom- Nû pê hisiya ku "diz ji şivên bêtir diqutife, dema ku bi pozika tivingê kulêv ji ser wî dide alî û mirinê davêje ser, çimkî beyî ku pê bihise, di heman kêlikê de esmanê jiyana xwe jî bi kulavekî erjeng tarî dike."

Lêvên wî wekî du pel çilo diricifin, wekî monologekekî mûyê peyvan bi tena serê xwe dirist.

-Ez nema dizanim min çima ev teşî di hişê xwe de bi cî kir?

Bavê Komarê, ji ber gotinên wî, dev li mada-lyonên xwe dikir. Hêrsa wî bêhn lê diçikand, guhekekî dadgêr xistibû devê xwe û ji qumçe û madalyonan xweşiktir dikeritand:

-Eger tu vî reşê ji tozê bikujî, ez ê van mada-lyonên xwe temamî bi serê memikên diya te ve dardabikim û tu yê bibî bavê min ê fermî.

Şîmaqeke biefîsûn hişt ku cênika hişê wî bizerpîte:

-Na ezbenî, hezkirina min a jî jinan wekî hezkirina poz a jî qulika daşîrê ye. Bawer bike ev tiştekekî ji derveyî xwestina min e, çimkî ez jî Bûrsayê me. Çîroka wî dirêj e:

Roja ji diya xwe bû, çavên dê mabûn bi qijnîkê di nava her du lingên wî yên biçûçik de, di wê kêlikê de êşeke ji êşên her neh mehên rabûrî diwartir dev li çermê zikê wê dikir. Bijîşk peyama dawîn ji bo bavê wî ragihand: "Eger jina te careke din jî avis bibe, divê tu destê xwe ji wê bişoyî." Ji wê rojê de dê û bavê wî bi stûxwarî li ber sîngên xwe mexel hatin.

Rojekê, di daşîra zanîngehê de xwendevanekê derfî bi ser xwe û wî de girt. Bi ezmûnî qumçeyên gomleg tev de vekirin, du sêvên gewr û agirîn diyarî wî kirin. Wî wek skeletekî ji qeşayê piştê xwe spartibû dêrî, axî li dû axîne ji her çar lêvên keçîkê dirijiyên, destê xwe yê ji pembû di binê qayîşa wî re ber bi daristana tropîkal ve daxist, ji nişkê ve qijnîkekî dev li serê tilikên wê kirin, bi hezaran şûjin li canê wê şîn hatin, baraneke şidiyayî agirê daristana wê ya tropîkal tev de tefand:

-Yadêêê, tu kesekî ji xêndî nêr û mê yî.

Bavê Komarê hê jî guhê wî dikeritand:

-Heke tu reşê ji tozê nekujî, ez ê te bi dîrokê de bîkutim mîna singekî.

-Ezbenî bibûre, divê ez du xêletiyên te ji te re

rave bikim; ya pêşîn, diyar e tu hînî xwarina madalyonan bûyî, lê guhê min ne madalyon e û ya duduyan. bi qasî ku ez têdigihjim, sing di axa şewitî de nayê kutan, çimkî yek dîrok nemaye ku me axa wê neşewitandibe.

Kursiyê rêza pêşiyê dîsa xwe zeft nekir, devê xwe xist guhê kursiyê li pişt xwe:

-Em ji textên wê darê ne ku ji xêndî axa şewitî di tu axên din de şîn nayê. Dîrok bi xwe şahid e ku heta îro serê tu kesî ji ber peyv û muzuriyên kursiyekî neşiyaye, çimkî em di zikê darê de tên terbiyekirin.

-Lenet bê li dê û bavê wî hosteyê ku tu daniyî rêza pêş û ez jî danîm li pişt qûna te. Min heta yê kelîkê tu kursiyên bi qasî te bi xwe re bibîne ku bipeyive nedîtiye. Ev kiryarên te diyar dîkin ku tu ne yekî ji çivaka me yî, teqez riya te wê li sobeyê biqede.

-Heke bi destê min bûya, ez ê aniha bibûma mêvanê Zekiyeyê, min ê qene paşveke sermedî ji bihara destên wê bixwara.

-Mirov di dû mirina xwe de gorekê li dewsa

xwe dihêle, bes nexasim tu jî dixwazî bibî endamekî ji eşîra ariyê.

Reşê ji tozê bi aramî tabloya Bavê Komarê ji ser bejna dîwêr rahiştê, Bavê Komarê bi çavine dawerivî li reşê ji tozê dinihêrî, marekî reş ji nava lêvên wî dikişiya, du dûvpişkên ji karîbanê di hêlînên guhên wî de mexel hatîbûn, hêdika tablo dirêji Dadgêr kir -mixabin ev komar bûye hêlîna lawiran, fermo lê binihêr bê lawir çî qas xweşik diçêrin.

Sewt ji Dadgêr çênedibû, çavên wî mabûn bi tabloyê ve, di bêdengiya hêwanê de, li dewsa kursiyar guhine ku bi xweşkahi dirêj dibûn dengê bazikên mêşekê ji qorzîka dawîya hêwanê dihat bihîstin, diranê bêsûret di hinavê wî de li çêkirina sûretan germ bûbû. Kurkê xwe ji xwe kir, bi vajîfî li serê xwe pêça û bê ronî xwe li dêrî qewimand:

-Zelzele çêbû gidî, zelzele! Yê ku naxwaze Melkemot navika wî vexwe, bila bireve♦

2 Gulan 1998

Bûrsa

## mirinên min

## piling

di esra xwe de najîm  
bê wext hatime jînê  
kitimî me  
dîrok bi min nehisiyaye  
çavên wê girtî  
guhên wê xitimandî  
û hatime kuştin  
bi mirinên bêdeng  
berî zayîne  
hatime singokirin  
di malzaroka diya xwe de  
di dergûşa şaristaniyê de  
kenê nivcomayî diherike  
ji ser lêvên min

û tîm kuştin  
nû ji malê derketî  
û li devê dêrî  
li qeraxa çemekî  
nêzîkî qereqolekê  
carinan nedîti me  
bi cinayetên kiryar eşkere  
fetisî me bi çekên kîmyewî  
di welidandinê de roj nedîti  
carinan zarok im  
di binê paletên tanqan de  
pelçiqandî  
û di tevkujiyekê de qeliîme  
bi neviyên xwe re

# edgar allan poe

samî hêzil

Edgar Allan Poe; helbestkar, çiroknûs û Erexnegirê binavûdeng ê emrîkan. Di 19 reşemî 1809'an de, li Bostonê ji dayik bû. Birayekî wî yê bi navê W. H. Leonard û xwîşkeke wî ya bi navê Rosalie hebû. Beriya jidayikbûna Rosalieyê, bavê wan wînda bû, an jî mir û di sêzdeh saliya Edgar de diya wan jî ji jana zirav jiyana xwe ji dest da.

Jinekê, Frances Allan, ku zarokên wê tunebûn. Edgar hilda ba xwe. John Allanê mêrê Frances Allanê ew şande "dibistana kilasîk a îngilîz". ku zarokên malbatên dewlemend diçûnê. Li vê derê, Edgar ciyawaziya di navbera xwe û zarokên din de dît û bêdiliya John Allan, ku nedixwest paşnavê xwe bide wî, ew xemgîn kir. Jixwe J. Allan karsazekî serhişk bû û roj bi roj ji hev dûr ketin.

Jiyana li zanîngehê jî, bi giranî ne akademîk, lê civakî bû. Ciwanan gelekî vedixwarin, qumar dilîstin û diketin şer û pevçûnê. Wê rewşa hanê Edgarê diltenik xiste nava tengasiyan. Her tim qumar dilîst û vedixwar. Deynên wî ew qas zêde bûn, ku zirbavê wî têkiliya wî ji zanîngehê birî û ew xiste karekî sivik û bêhteng. Wî ew tişt qebûl nekir û di temenê ciwan de, bi honeya ku bibe helbestkar kete rê.

Çû Bostonê û di vir de çend helbestên xwe bi îmzeya *Bostoniyekê* weşand. Lê aboriya wî ne baş bû. Lewma xwe nivîsande artêşê û di vê derê de jî bextewar nebû.

Li Baltimorê, weşana *The Saturday*


*Visitorê* pêşbaziyeke çirokan li dar xist. Poe bi komek çirok, *Folio Club Stories: Çirokên Klûba Foliyê* û bi helbesta bi navê *Klozyûmê (Coliseum)* beşdar bû û xelata çirokan -pêncî dolar- qezenc kir.

Piştî ku karên wî sererast bûn, meta xwe Maria Clemm û keçmeta xwe Virginia hilda ba xwe. Dû re bi Virginiayê re, temenê wê 13 sal bû, zewicî.

Poe êdî rexnegir û edîtorekî pispor bû. Hem navê wî, hem jî navê kovara wî hatibû bihîstin. Lê alkolê jiyana wî roj bi roj têkdibir. Bi malbata xwe re çû New Yorkê û çiroka *Arthur Gordon Pym* çap kir. Ew çirok di warê vegotinê de ew çend dewlemend bû, ku gelek rexnegiran ew mîna çiroka bûyereke rasteqîn pejirand. Dû re çû Philedelphiayê û edîtoriya kovara bi navê *Grahamsê* hilda ser milê xwe. Ew kovar bi edîtoriya wî bû navdartirîn kovar li Emerîkayê. Di kovarê de, çiroka *Kuştinên Li Morga Rueyê (The Murders in the Rue Morgue)* weşand. Ew çirok wekî "yekem çiroka dedektîfî" hat hesabandin û Baudelaire ew wergerande zimanê fransîzî.

Dema ku helbesta *Qelareşk (The Raven)* di *The New York Evening Mirrorê* de hat weşandin. Poe êdî yek ji navdartirîn helbestkaran bû.

Lê alkolîzm û tengezariyên derûnî ew dikir êrişkar û tore. Carinan bê sedem rikê xwe li kesên ku alîkarî pê re kiribûn dianî û dilê wan dihişt. Dîsa jî, meta wî û hevsera wî



Virginiayê piştgiriya xwe jê nebirîn, mîna berê jê hez dikirin.

Rojeke zivistanê, di sala 1847'î de, Virginia mir. Poe piştî çend têkiliyên bi jinan re, di sala 1849'î de bi dildara xwe ya zarokatiyê re zewicî. Lê bi rojekê pişt re, li Baltimoreê mir. Sedema mirina wî -yekser nebe jî- tê gotin, ku ji bela xitimîna damarê mêji bûye. Dema ku dimire, gotina Poe ya dawîn wiha bûye: "Xwedê, tu alikariya giyanê min ê reben bike."

E. A. Poe bi hemû beşên wêjeyê re mijûl bû û di hin beşan de jî, wekî pêşeng tê hesibandin. Bo nimûne, çîrokên tirsnaq û çîrokên dedektîfî bi form û naveroka ku wî afirandiye bingeh girtin. Her wiha nêzîktêdayîna wî ya helbestkariyê jî balkêş e.

Di sala 1845'î de, Poe di pêşgotina xwe ya bi navê *Qelareşk û Helbestên Din (The Raven and Other Poems)* de wiha dinivîse: "Helbestnivîsîn ji bo min ne armançek bû. Lê azweriyeke xurt bû û azwerî divê bi awayekî rêzgir were pêşwazikirin. Azwerî, ango daxwaza xurt a hundirîn, nikare têkiliyê bi pesn û bersivên nehêja yê mirovan re daye û divê daneyne jî." Poe serkeftinên binavûdeng ên Lord Byron û Thomas Moore ji xwe re nimûne didît. Mixabin helbestên wî yê salên pêşîn jê re ne navdarî anî û ne jî bextê wî vekir. Di sala 1827'î de, *Tamerlane û Helbestên Din*; di 1829'î de, *Al Aaraaf û Helbestên Din*; di 1831'ê de, *Helbest hatin weşandin*. Pirtûka bi navê *Qelareşk*, di 1845'î de hat weşandin, ele-qeyeke mezin dît û wer xwiya bû wê Poe bêtir nêzîkî helbest-nivîsandinê bikira. Lê

wisa nebû, kêmasiyên aborî û tengasiyên din xebatên wî asteng kirin.

Nêzîktêdayîna Poe ya helbestkariyê balkêş e, ku heya dawîya temenê wî bi heman awayî ma. Di destpêka helbesta *Al Aaraafê* de, Poe dinyaya arîşen a bedewiya ideal wiha rêz dîke:

*Lo! çi tiştêkî zindî nikare bihewîne  
(ji bilî kulîlkan)*

*şewqa çavên bedewiyê.*

Bi raya E. A. Poe, helbestkarî afirîna ritmîk a bedewiyê ye. Her wiha ew ritm xwestek û kêfên safî giyanî hildifirînin û şahiya giyanî hiltînin ber bi jorê ve û wiha didomîne helbestkar: "Helbestkarî ne bi tenê peyitandina "bedewiya diyar" e. Lê hewldaneke hov e, ku dil dîke bigihîje bedewiya bilind / jorîn. Û divê danûstandinên wê bi ceribandinên jiyane, bi xwestekên dil, bi têgihîştinên hiş û bi xweşbîniya rewîştî re tunebe, lew re ew tişt tev çewtiyên 'didaktîk'ê ne." Ji ber vê boçûnê, Poe ji romantîzma Wordsworth û Emerson vediqete. Wekî tê zanîn, her duyan bedewiya giyanî û rastiyan rewîştî di xwezayê de amade didîtin, ku mirov bi alikariya helbestkariyê têdigihîje. Her wiha li gorî Poe, helbest bi tenê ji bo xatirê helbestkariyê û ji bo

xatirê ceribandina estetîka xweser a bedewiya giyanî tê nivîsandin. Û ew layengiriya wateya girtî, an jî şikbar dîke û wê jî bi muzîkê û bi rewşa hiş a nîvxewî destek dîke.

Xwendevanên helbestên Poe yê baldar wê bibînin, ku bergehên feylesofîya transdantalîzmê di helbestên wî de kêmhene. Piraniya helbestan bi hestên melankolîk û dilnîyên têkildarî "bedewiya wind-abûyî" hatine hûnan din.





## REWŞEN-NAME

Her çend ramanên wî yê wêjeyî û feylosofî giraniyê bidin şer hest û azweriyên giyanî jî, helbestkar mijarên xwe ji bûyerên di jiyana mirovan de watedar in dijibêre. Ji bo helbesta *Qelareskê (The Raven)* dibêje: "Ew hesta ku qala mirina jineke bedew dihewîne li dinyayê mijara herî balkêş a helbestkariyê ye û bê guman melankoliya tê de jî, newaya herî rewa ye."

Bandûra herî xweser a E. A. Poe li ser helbesta sedsala nozdehan bê nîqaş nêrîna wî "helbestkarî bo helbestkariyê" ye. Her wiha pêşengiya wî ya ji bo sîmbolîstên fransîz yê mîna **Baudelaire**, **Mallarmé** û **Paul Valéry** û hinekên din jî girîng e. Di ramana helbestkariya "estetîka saf" de helbestkarê îngilîz **T. S. Eliot** bîngeha ku bi hêz û bi kêmasiyên Poe afirîye nîşan dide. Li gorî Eliot, ji ber ku Poe di dewsa formê de naverokê û di dewsa hestan de jî dangan dikirpîne û bi vê yekê hewl dide ku şahiyê tund î giyanî li dar bixe, wî tiştek ji bilî împresyonên aşopî (xeyalî) -ku dûrî rastiyên jiyane dixwiyin-hilneberandiye.

Ew rexne gelek caran li Poe hat girtin. Lê pêwîst e xebatên wî yê ku hewl didin potansiyel û tixûbên 'prensîbên helbestkariyê' ya transdantalîzma aşopî derxin holê biçûk neyên dîtin.

Newayên wî yê melankolîk carinan mîna tirsên romantîk î kevneşopî, carinan jî mîna bîranînên / dîmenên xemgîn ên helbestkariya populer hestiyar û mirî seh dibin, ku **Mark Twain**, nivîskarê emrîkan, di *Serpêhatiyên Huckleberry Finn* de (*The Adventures of Huckleberry Finn*) heman tiştî tewr dike.

Bes bi tenê hevçaxên wî karîne helbestên mîna *Qelaresk*, *Ulalume* û *Annabel Lee* binivîsin, ku heya dema niha werin bibîranîn ♦

### Çavkanî:

- 1) The Works of E. A. Poe. The Wordsworth Poetry Library
- 2) The Murders in the Rue Morgue and Other Stories, Könnemann
- 3) E. A. Poe. Selected Poems and His Bibliography

## Du helbest ji Edgar Allan Poe:

### Eldorado

şowalyeyekî egît,  
rewneqdar xemilî,  
Li ber tavê û taldeyê,  
dûr û dirêj şopand,  
stranek distra,  
Ku li Eldoradoyê digeriya.

\*\*\*

Lê emrê wî bûrî,  
-Ew şowalyeyê jixwerazî-  
Û li ser dilê wî siyek,  
Ket jêrê dema ku nedît parçeyek ax,  
ku bişibe Eldoradoyê.

\*\*\*

Û Hêza wî,  
nehişt ew bidomîne,  
hingê rastî wî hat siyeke rêwî  
"Siya" wî got, "Dibe li kû derê be  
Ew axa Eldoradoyê?"

\*\*\*

"Li seranserî çiyayên heyvê,  
û berjêrî geliyên siyê,  
Biajo, Bê tirs bajo."  
Bersivand siyê,  
"Ger tu digerrî li Eldoradoyê!"

### (To My Mother)

### Bo Dayika Min

Ji ber ku, ez wisa hest dikim,  
Li bihuşta jorîn, ferîştayên ji hev re dikin pistepist,  
Nikarin bibînin biwêjêke bi qasî "DAYÊ" hêja,  
Navbera têgihên xwe yê bizotên evîne.  
Lewma min bi vî navî gazî te kir heya niha  
Tu, ji min re ji dayikekê zêdetir î,  
tiştî dikî dilê min, li ciyê ku mirinê tu veşartî  
û azad kir giyanê "Virginia"ya min.  
Diya min, Diya min bi xwe, ku ji zû de miriye,  
Diya min tenê bû; Lê Tu Dayika "wê" kesê yî,  
Ku min pir jê hez dikir,  
Lew re jî diya min hêjatir î bi hevsera min re,  
Di vê sermediya ku bo giyanê min  
ji jiyana giyanî hêjatir de.

**Wergêrên helbestan ji îngilîzî: Samî Hêzil**

**Eldorado:** Welatekî xeyalî. Li gorî salixan, li Başûrê Efrîqayê ye û cîgehê jiyaneke bextewar e.



# ji 'Cathay'a Ezra Pound çend nimûne (Ji çîn û maçînê dengên jibîrbûyî)

kawa nemir

**P**ound, Ezra Loomis: (1885 Idaho, D.Y.E - 1973 Venedîk) Helbestkar, wergêr, rexnegir, zimanzan. Di nava hunermendên *avant-garde* ên sedsala 20. de, yên weki Gaudier-Brzeska, Jacop Epstein, Brancusi, Percy Wyndham Lewis, George Antheil, T. E. Hulme, William Butler Yeats, James Joyce, Jean Cocteau, Francis Picabia, T. S. Eliot, William Carlos Williams û Ernest Hemingway, bi jiyana xwe, bi behreyên xwe, bi 'helbest'a xwe, bi boçûnên xwe yên der barê dîrok, şaristani û helbestê de, bi bîrdoza xwe ya ku kir ew di dema Şerê Dinyayê Yê Duyemîn de bi riya radyoyê piştevaniya faşizma Mussolini ya li Îtalyayê bike, bûye balkêştirin hunermend.

Pound bi xwe pisporê çand û şaristaniyên Serdema Navîn û çandên Rohilat bû. Li gel zimanê xwe yê zikmakî îngilîzî û zimanên din, bi zimanên çînî, provensî (zaravayên Frensaya Başûr), fransîzî, grekî, latîni û îtalî dizanibû û ji van zimanan gelek wergerên serketî kir. Wergerên wî yên ji Konfiçyûs girîng in.

Piştî Şerê Dinyayê Yê Duyemîn, ji aliyê hêzên emêrikan ve, ku ketin Îtalyayê, hat girtin, bi îxanetê hat tawanbarkirin, lêbelê bi biryara desteyeke psîkiyatran dîn hat qebûlkin, lewma jî nehate darizandin, heta sala 1959î li Emêrikayê, di nexweşxaneyekê de hat girtin.

Rêzehelbestên wî yên bi navê *Cantos* (Stran) girîng in. William Butler Yeats û T.S.Eliot, dema ku wî nas dikin, gelekî li jêr bandora wî dimînin.

Eliot bi xwe, tevî ku gelek caran rexneyên dijwar li Pound girtiye, di sa jî ew ji xwe re wek seyda û pêşeng dîtiye.

Van helbestên Pound, ku em ê kurdiya wan belav bikin, mijarên xwe ji nivîsên kevin ên zimanê çînî wergirtine. Di dawiya wan de jî, kurtehelbesteke wî. Di serbûriya helbestkariya Pound de, ev helbestên ku min temamê wan wergerandine kurdî, bi qasî *Cantoyên* wî nebin jî, ciyekî gelekî girîng digirin. *Îmajên* Pound wê gelek tiştan bidin helbesta me ya neteweyî.



Li mala Yorgo Seferis-Asîna, 1965, Ezra Pound û Yorgo Seferis

**Piraniya wê ji çîniya Rihaku (Li Po),  
ji têbîniyên rehmetî Ernest  
Fenollosa û ji deşîfrekirinên  
profêsor Mori û Ariga  
(1915)**

**Strana Tîrbazên Shuyê**

Va ye em li vir in, bistiyan pêşîn ên mendikan diçînin  
 Û dibêjin: Em ê kingê vegerin welatê xwe?  
 Va ye em li vir in, ji ber ku Ken-nin dijminên me ne,  
 Ev moxol bela xwe ji me venakin.  
 Em bistiyan nerm ên mendikan dikolin, hildikin.  
 Gava ku yek bibêje 'Veger', yê din posîde dibin.  
 Hişên jandar, jan xurt e, em birçî û tî ne.  
 Berevaniya me hê jî ne piştrast e, çî kes nikare rê bide  
 hevalê xwe ku vegere.  
 Em ripinên pîr ên mendikan dikolin, hildikin.  
 Em dibêjin: Gelo wê rê bidin me em di kewçêrê de vegerin?  
 Arîşeyên keyseriyê ne hêsan in, em bêzar in.  
 Jana me tal e, lê em ê nikaribin vegerin welatê xwe.  
 Kîjan kulîlk bişkivî?  
 Faytona kê ye? Ya Generêl.  
 Hesp, hespên wî jî westiyan. Xurt bûn.  
 Bêhnvedan nîn e ji me re, mehê sê caran şer e.  
 Xwedêyo, hespên wî jî westiyan.  
 General li ser wan in, leşker li kêlekên wan in.  
 Hesp banek in, generalan tîrên mahî  
 û tîrdankên bi çermê masiyan xemilandî hene.  
 Dijmin kone ye, divê em hay ji xwe hebin.

Dema ku em bi rê ketin, bîşeng bi biharê tewiyayî bûn,  
 Em di nava berfê de vedigerin,  
 Em hêdika diçin, birçî û tî ne,  
 Hişê me mişt jan e, wê kî têderxe kula me?

**Bunno, salên 1100 B. Z.**

**Jina Bazirganê Çêm**

Dema ku hê porê min li ser eniya min ripîrast hatibû birrîn  
 Ez li ber derwaze, li wan deran dilîstim, min kulîlk hildikirin.  
 Li ser şivên bambûyê, te siwarçakî rê bi ser min dixist,  
 Li dora min diçûyî dihatî, bi hilûzerkan dilîstî.  
 Me wisa roj dişart rojê di gundê Chokanê de:  
 Du mirovên biçûk, li dûrî zehlekariyê an jî gumanê.

Min di çardeh saliya xwe de bi teyê Axayê Min re mêt kir.  
 Şermoke bûm, min çî carî nekir tîqetîq.  
 Min serê xwe berjêr kir, li dîwêr nihêrî.  
 Hezar caran gazî min kirin, min çî carî li paş xwe nenihêrî.

## REWŞEN-NAME

Min di panzdeh saliya xwe de mirûztirî berda,  
Min awat kir ku xweliya min tevî ya te bibe  
Heta hetayê, heta hetayê, heta hetayê.  
Çavê min çima li rê û dirban bimîne?

Şanzdeh salî bûm, te da ser rê,  
Te berî da Ku-to-yena dûr, perê çemê gerînekên  
gergerînok,  
Ev serê pênc mehan e tu çûyî.  
Meymûn li ser serê me dikin xirecira xemgîn e.

Dema ku tu derketî çûyî, destê te ji van deran nedibû.  
Êdî kêleka dêrî kevz girtiye, kevzên têkel,  
Wisa bi kûr de çûne nayê rakirin!  
Vê payîzê, bi rabûna bê re pelçim zû diweşin.  
Minminikên hevcohbûyî ji niha ve bi gelawêjê zer bûn  
Li ser çêreya li baxçeyê Roava;  
Min diêşînin. Pîr dibim.  
Heke tu xwe di tengavên çemê Kiangê re berdî  
bêyî,  
Di bextê te de me berê haya min pêxe,  
Ez ê derkevim lex te ve werim.  
Heya Cho-fu-Sayê  
**Rihaku**

### Çar Helbestên Cudayiyê

Barana tenik li ser toza sivik e.  
Darebiyên hewşa xanê  
Wê hêşin bibin, birîsikin,  
Lê tu Axawo, baştir e tu beriya cudayiya xwe  
şeravê hildî ba xwe,  
Lewma wê li dora te heval û hogir tunebin  
Dema ku tu xwe bigihînî dergêhên Goyê.  
**(Rihaku an jî Omakîtsu)**

### Cudayiya Li Ser Çemê Kiangê

Ko-jin ji Ko-kaku-royê berê xwe daye roava,  
Kulîlkên moranê li ser çem şêlî dibin.  
Babireka wî ya bêkes li esmanê dûr şanik e.  
Êdî bi tenê çem dibînim,  
Kianga dirêj, digihîje esmên.  
**Rihaku**

### Ji Hevalekî Cudabûn

Çiyayên şin ên ku dirêjî bakurê bircan  
dibin,





Çemê spî yê ku li dora wan dizivire;  
Divê em li vir cudabûnê pêk bînin  
Û derkevin di nava hezar mîl mêrgên  
mirî re biçin.

Bîr mîna ewrekî fireh î avjen,  
Hingur mîna jevcudabûna nasên kevin  
Yên ku dest kîpbûyî, ji dûr ve, xwar dibin.  
Hespên me ji hev re dişehin  
gava ku em jev cuda dibin.

**Rihaku**

### Cudabûna Li Nêzikî Shokuyê

'Sansoyê Keyserê Shokuyê rê ava kirin'

Dibêjin, riyên Sansoyê asê ne,  
Bi kaş û kûş in fena çiyayan.  
Dîwar bi rûyê mirovekî de bilind dibin,  
Ewr ji gir de dertên  
bi ser hefsarê hespê wî de.

Li ser riya selebendî ya Shinê  
darên bedew in,

Qurmên wan di nava selan re dipijiqin,  
Lehî qeşaya xwe diteqînin  
li nava Shokuya ku bajarekî şanaze.

Feleka mirovan jixwe li dar e,  
Ne pêwîst e pirsra berbêjan li me bibe bar e.

**Rihaku**

### Bejn û Bala Bedew

Şîn e, şîn e çêreya li dora çêm  
Û bîşengan baxçeyê dercîran bi dev re tijî kir.  
Tê de. xatûna di nêveka ciwaniya xwe de,  
Spî, spîtiya rû, dudilîyê dike, ji dêrî  
derbas dike.

Bejnzirav, destekî narîn dirêj dike;

Berê matoşqeyeke wê derê bû,  
Çû yekî araqxwir kir,  
Ku niha bi sermestî derdikeve derve  
Û wê pir zêde tenê dihêle.

**Mei Sheng, 140 B. Z.**

### Balada Riya Tûyê

Ro li gorziyê başûrê rohilat ê tiştan hiltê ye  
Da ku li qesra bilind a Shin bike temaşe ye  
(Yeke sorefît e) bi navê xwe Rafu  
keçeke wan heye,

Wê nav li xwe kiriye 'Xêliya Melesî' ye,  
Lewma tûyan dide kurmhêvrîşima ye.  
Wan ji derdora dîwarê başûr ê bajêr  
berhev dike ye.

Bi bendên hêşîn dihûne firêtê zembîla xwe ye,  
Porê xwe top dike, diavêje ser aliyê çepê  
yê sûretê xwe ye.

Guharên wê çêbûne ji durê ne,  
Binkirasê wê ji hevrişimê nexşê hêşîn e.  
Dêreyê wê ji heman hevrişimê rengê  
erxewanî ye,

Dema ku mêr derbas dibin, li Rafuyê  
dikin temaşe ye

Bar û piştîyên xwe datînin erdê ye,  
Dadiwestin, badidin simbêlên xwe ye.

(Ji têbîniyên Fenollosa, gelekî kevin)

### Erat Hora\*

"Malî ava, her çi bê." Û paşê berî bada wê  
Û fena ku tîrêja tavê ya li ser  
kulîlkên sernixwîn

Biçilmise, gava ku bê ew bi aliyekî de rakirin,  
Bi lez çû ji ba min. Naxêr, her çi bê  
Saetekê beroj bû Û xwedayên herî pozbilind  
Nikarin bi çi tiştekî ji temaşekirina  
Wê saeta her ku çû bihurî baştir forsê bikin.

\*Erat Hora (bi latîni) "Dem hatibû" an jî  
"Demek bû." ye.

*Ji inglîzî: Kawa Nemir*

# helbestkarê ûris ê mezin: aleksandr sergeyeviç puşkin

xan bawerî



Aleksandr Sergeyeviç Puşkin di sala 1797'an de li Moskowayê ji dayik dibe û di sala 1837'an de li bajarê Petersburgê, di dueloyekê de birîndar dibe û ji ber heman birînê jiyana xwe ji dest dide.

Wateya berhemên Puşkin di wêjeya dinyayê de ciyekî girîng û mezin digire û hemû mirovahiyê hambêz dike. Puşkin li aliyekî bi wê meziniyê disekine, wekî Dante Alighieri, Shakespeare, Goethe, lê ji bo Êris destpêkeke nû û bêhempa ye. Bîlimetiya wî fikreke nû û afirînerî girt ser milê xwe. Wî hemû tiştên ku mirovahiyê durist kiribû, hemû berhemên dewlemend î neteweyî, yên rûsekî nemir afirandiye.

Rexnegirê mezin V. G. Belinsky di gotareke xwe de bi rastgotî nîşan da ku her nîfş li gorî xwe di Puşkin digihîjin. Bi rastî jî, Puşkin ji bo hevçaxên xwe bûbû helbestkar, tu kesekî ku bi wî re heman ast bigirta nîn bû. Wî bi serkeftina xwe nûneriya wêjeya dinyayê dikir û çî qas dem bi ser de dibuhirî, ew qas mezin û geş dibû. Vegotina wî ya taybetî û bi rastî jî çî tiştên ji aliyê wî ve hatine afirandin kedeke mezin û xelateke giranbiha ne.

Lê taybetiyêke wî ya rasteqîn û fewqalade hebû; Gogol di wî barî de bi dilpakî û xweş peyivî. Gogol pir ji Puşkin hez dike, wî mamosteyê xwe yê tekane dizane. Gogol wiha digot: "Di Puşkin de, rûdaneke fewqalade heye û dibe ku tekane geşedana wî rûdana giyanê Êris digire. Vî mirovê ûrisî ajvedana Êris pêk

aniye, ka yekî wisa çawa di du sed salî de bê dinyayê."

Di kesayetiya Puşkin de, qereqtera hêja û welatperestî hat sêwirandin: Azadîhezî, rewîstekî paqij, mêjî û ramanekê mezin di her gotineke wî de mirovane û siruştî xwiya dibû. Çi tiştên ji aliyê Puşkin ve çêbûbin, encama wan ne bi tenê berhemên payeberz in. Bi ya Puşkin, evîneke domdar zanistek e ku bi hemû sedsalê re eynî ye. Jiyana Puşkin balkêş bû, ûzviyeta wî taybet bû, giyanekî wî yê tevgerbar û jîndar hebû. Hunera wî ya her pêpelûkê ajvedana afirîneriya bilimetiya wî ye. Ji bo ku taybetiyeke wiha pêkbê, yekî divê bi jiyanekê girîng û dahkeke mezin, bi ramanekê hemdemî pêşengiya pêwîstiyên heyna xwe bike.

Puşkin li pêşberî me, bi çalakîyeke xwe ya wêjeyî û piralî li pêş çavên me radiweste.

Puşkin afirînerê berhemên nemir, lîrik û dram, rexne û dîrokê ye, lê beriya hemû tiştî em wî wekî helbestkarekî mezin dizanin. Gelo di wêjeya lîrik a Puşkin de mîrateke zor çî nagire? Ango, di wî de ajvedaneke herî xweş, dilgeşî, dilnî û ramanekê helbestî, afirîneriyeke hevçax, ûzviyeteke bi hemû tiştên din ve girêdayî, nîgara jiyanekê wiha hundirîn nade xwiyakirin? Bê guman, gotina me erê ye. Têkiliyeke wî ya giştî û xwezayî heye bi hemû ramanên pirşewedar re ku hemû dinyayê hembêz dike. Puşkin di helbestên xwe yê vedorî de her tim giyanekî hemwelatî, neqşa azadîheziyê di rêza yekemîn de bi çî kiriye.

Hêvî ew e ku bi van çend helbestên ku me ji zimanê rûsî wergerande kurdî, ew giyanê wî yê ku me hewl da em piçekî jê qal bikin şad bibe!

### Çivîk

*Li biyanîyê bi rêzdarî temaşê dikim.*

*Ji gelemperiya xas  
Çivîkê azad berdidim  
Rojê şahiya biharê.*

*Êdî ez bêrê nemam;  
Pey çî li Xwedê giliyê min.  
Qenebe, dema bi tenê karek be  
Ez dikarim azadiyê bidim.*

\* \* \*

*Cotyarê çolterê azad.*

*Ez zû derketim, beriya stêrkan;  
Destê bêtawan û spehî  
Ji di bendikirinên doliwgeriyê de  
Avêt malbata giyandar-  
Lê bi tenê min dema xwe winda kir,  
Ked û fikra xêrendar...*

*Rûnên gelê hêja!  
We hişyar nake ji bo gazîkirinên avrûyê  
bi çî xelata azadiyê bidin?  
Divê ew bèn qusandin, an jî birin.  
Mîrata wan ji nîşên nîşê tê  
Bendetî ji zengilê heyani qêmqî.*

### Ji Bo Deryayê

*Bi xatirê te dinyaya azad  
Bo cara dawî li pêşberî min î  
Tu bi ser pêlên kûr de digindirî  
Tu bi rindî û qurnasî dibiriqî*

*Mîna dostekî nûrîn zelûl  
Mîna bang li wî ji bo xatirxwestinê  
Hêwirzeya te ya dilbikovan, bangawaziya  
te bihêwirze ye  
Min bo cara dawî bihîst.*

*Xwestekên tixûbên giyanê kesayetiya min!  
Çi qas zehf li peravên te  
Ez bê deng û mêjiyê min bi mij geriyam.  
Ezaba biryareke nepenî dikişînim!*

*Min çawa ji bangawaziyên te hez kir  
Dengê fetisandî di hendêfan de olan dide  
Û bédengiya saetên êvarê  
Û hilperînên tiredînkî!*

*Babireka masîgirekî ya tebiî  
Bi daxwaza lêzokî ya dilê te yê demî  
Di nava şemalan de bi cesaret dişiqite:  
Lê bi coşî û berhigari kevin nabe  
Û keştî pê de pê de noqî avê dibin*

*Ji min nehat gerdûnê bihêlim  
Dilê min teng dike peravên sekini  
Te bi heyranî silav dikin.  
Û ji destê min nehat  
Reva xwe ya helbestvaniyê rê bibim.*

## REWŞEN-NAME

Tu sekinîbüyi, te gazî dikir, ez zincîrkirî bûm:  
Giyanê min bêçine li erdê diperpitî:  
Bi azweriyeke mezin sêr, girtiye.  
Ez li peravan mam...  
Çima heyfa xwe lê bînim? Bê şayîş  
Min riya xwe bi kû de berpê kir?  
Hêmaneke li çolên te  
Li giyanê min derbe vedike.

Yek lat e, yek jî qebra bişan e  
Li wir di xewneke sar de  
Bîranînên mezin radizên:  
Napoleon jî li wir dadimiri

Û ew di nava jankêşanê de mir  
Û li pey wî, bagerek  
Û lehengekî din jî ji me bir,  
Desthilatdarekî din û mêjiye me.

Azadiya giriyoki ji holê rabû  
Zerzenga xwe jî li dinyayê hişt.  
Bager radibe lê ne di wexta xwe de:  
Ew hebû, ber bi deryayê û stranbêjê te.

Mînaka te bi wî dihat zanîn.  
Wî ji bo te bi giyanê xwe xwe afirand:  
Wekî te, kûrekûr mirûzê xwe kiribû  
Wekî te, bi çi tiştî nayê zefkirin.

Dinya hiştin. Niha tu yê min çawa  
Dêrxîni zeryayan?  
Qedera axê li her aliyê eynî ye:  
L i kû dilopên xêrê, li wir nobedar e  
An çand û huner an jî tîran.

Bi xatirê te deryayê! Dêlindêzên te yên  
Xweşik ji bîr nakim  
Û kûr kûr ji dûr ve êvaran li dengê  
xujîniya  
Te guhdarî dikim.

Li daristanê, di çolên ker jî bo  
Te bînim.  
Latên te, kendavên te,  
Û teys û siyên û peyvên  
Pêla wan dirêjin.



Aleksandr Sergeyevich Pushkin





# kirmanciye de astrolojî û mîtolojî ser

cemal taş

## I

**G**unê verêni ra hata na roce, quli hetê bilim ve hetê tekniki ra zaf çi doz kerdo. Hama hona taê çi tari de ro, çike mordemê alimi hona bese nêkenê her çi araze kerê. Qomê ke hetê ilimi ra peyser mendê, yi qomi ki hetê itiqatî ve hetê tercübey ser herd u asmeni ra nejdiyê. Taê tecrubanê ni qoma heni qewetine ke mordemanê alima bile hekmete de verdanê. Ni qomi hem hetê mitoloji ser, hem hetê astroloji ser eve qumana eve tercübê pi u khalikanê xo zê adet u torey hata ni roca ramito ardo. Hetê howa ser, hetê waxti ser tercübânê qomi zaf qewetino. Heni aseno ke ni qomi herd u asmen de omedie, herd u asmen ra zaf hezkenê, sero zaf hêciê. Ni qome ke herd u asmeni sero zaf heciê qomê herd u asmeni (doğa toplumu) name benê. Weşia nêy qoma de herd u asmen hem tariq de, hem şina te de hem zon u zagan de hem itiqat de hurendia de hêwle cêno. Çıqa maluqat ke esto, yê her çi hurendia xo esta, namê xo esto, manêşia xo esta.

Kirmancki de namê heywana ve nemê dar u beri, namê vas u çiçega, namê caa heni dew, tiyo ke na dewletine her jûan de nia hende zêde niya. Koa sero, çhema sero, heywana sero, dar u beri sero zaf hekati estê, wertê qomi de qesey benê. Oncia lawikanê Kirmanca de, çhiroka de, qesanê pi u khalika de, metela de hurenria herd u asmeni zaf hira wa.

Itiqatê Kirmanciye de homete de çıqa astarey ke estê yine ve asma, domanê roci zaninê. Çıke roc ke vecia qul vano "Ya wairê Homete" eke roc şî kora vanê "Ya Bimbareko ke sono wertê hurendianê xo". Rôc; tek teyna bimbareko de girso, çıke roc ke nêbo dina taria.

Mor u mîlawun, vas u çiçeg, dar u ber çıqa ke herd ra beno qewete ki tiji ra cêno, awe ra cêno. Roc ke nêbi tiji nêbena, tij ke nêbiye herd u asmen merde saybeno. Tiji qeweta maluqatia, roê maluqatia. Tiji ke nêbiye şiliye nêbena, awe nêbena, qêthaba nêbeno. Şiliye ke nêbiye herd neweso, vore ke nêbiye dina huska. Vore ke nêbiye ne awe bena ne şiliye vorena. Vore ve şiliya dina kenê sên. Vore ve şiliya ke nêbi hêga harmug nêcêno, dare nêbena tern, dalboske ranêkena. Herd ra vas ke nê bi, tar u tur ke nêbi, ekın ke nêbi maluqat se can u gost cêno, eve çi pizzê xo kenô mird?

Ko u gerişi, derya u dengji, dere u dergmi, birri, dalık u buki, asme-roc tede têvirane de amê mêydan. Herdê dewreşi ve asmenê khewi de her çi têdus de ro, cara çiê, çiê de bini ra ne bêqimeto ne ki bêsoreto. Rasta xo henia ke muluqat serê herdê dewreşi de binê asmenê khewi de weşia xo rameno. Serê herdê dewreşi de bine asmenê khewi de çıqa maluqat ke esto, qomi qedir u qimet do ve ci. Maluqat senlişia serê herdê

dewrşia. Wertê maluqati de qulo dîning, vas u çiçeg. dar u ber, mor u mîlaun, thêr u thur, mal u dowar, heywanê birri nê têde ki motaê jubiniê. Dina sewt male de ni tede piya weşia xo ramene, zê der u cirani say benê. No maluqat ke juvin de hast nêbi tham u thuzê dina remeno. Serê herdê dewreşi de binê asmenê khewi de çîqa maluqat ke esto ni tede jûbin rê dendariê, çike hem motazê jûbiniê, hem iqrarê jûbiniê. Têde wairê itiqatiê. Çîqa ke itiqatê qulê dîningi esto, marifetê xo esto, hendê quli yê dar u ber ki, yê mor u mîlawuni ki, yê heywanê birr ki, yê vas u çiçegi ki itiqatê xo esto. Çîqa ke yê quli wairê xo, heqê xo, pir u rayberê xo esto, yê her maluqati yê her çî wairê xo esto. Qom na sevet ra hendo ke hurmet musneno pir u rayberê xo, pil u qicê xo naskeno, hende hurmet ki musneno maluqatê dormê xo, hem yi nas keno, hem wairê yi naskeno.

Herd u asmen de senê maluqati ke rîndiye kerda, ya ki ğeletiye kerda, quli nêy tede çirokanê xode, lawukanê xode ardêra zon. Ardê ra zon ke qul naê bîzano ke ğeletiye soğinia homete de bêsoreta. Ğeletia ke biya, kerdogî re nêmana. Rîndia ke biya kerdogî re halitia, na rîndiye roce xo sana qêda u qusurê yi ver. Nêy tede eve hêketa qesey biyê, biyê gosere kotê gosê quli. Heywano ke bêsoreto, dara ke bêyimisa, helbet qibetê de xo biyo ke cirê o hal mîsteheqo, qul ni hêkmata zano. Kîrmanciye de ni mesela sero zaf hêkati estê, qesey benê. Nêy hêketa ra dirê teni nia yenê ra zon.

#### **Hêketa Koli Ve Yê Mîloçhike**

Koli ke adîr de vesa, mîloçhike koli canêverdana nêremena, a ki koli de xo vêsna. Çike mîloceke waxte de koli re vato "ez tode xo wadari?", koli vato "to ke mirê iqrar vana, ez ke esta adîr mîde vesena, bê xo mîde wadare".

#### **Hêketa Qerğace**

"Feqîrê sono pars keno are, raê ra ke sono parcunê xo erzeno dara qerğace bine şia qerğace de areşinora. Bado parcunê xo amanatê qerğace keno sono, fetelino. Bado cereno ra yeno ke parcunê xo bicero, serkeno ke parcunê xo dare ra niyo. Yeno qomî re vano 'mî parcunê xo amanatê dara qerğace kerd, qerğace amanatê mî kerd vind nêda mî'. Yê qerğace na sevet ra pir u rayber cirê biyo

hesrete, sevetê na kerdene ra qerğace naletme kerda. Qerğace na sevet ra yejide name kerda".

#### **Hêketa Asme**

Zaman de serê herdê dewreşi de serê her biskoê ekîni hawt serey biyo. Cinikê kona saci ver non pocena, a sire de domanê de cinike beno hona sawi beno, binê xode keno. Cinike saci verr ra vezena ra nona eskevaê kena binê domani ra binê domani kena pak. Na xevere zerrê Heqî ra çetm yena, heq cîrmê jano qoli ro, serê ekîni keno jû sere. Cini ke arranê xover destê xoê mirîni nana riê xo ser, bena asme oncina asmen. Nika eve çima alacağ serê asme ra qîlerê aseno, o qîler mirê destê a ciniko".

#### **Hêketa Qılancike Ve Merxe**

"Heq u Taala olim dano dar u beri, dar u ber qebul nêkeno. Dano thêr u thuri yi ki qebul nêkene. Axîr Cîvrail rusneno vano: "Hawt biray estê, yi sesmena biray ocağkoriê, yi sesmena biraa ra yê jû lace de xo esto, so roê yi bice". Cîvrail sono roê lacêki cêno, Hz. Eli dime terk-neno sono ke dormê meyit de taê berbenê, taê hûnê, xoxo de vano: "Onca qulê mîno dîning qarê mî qebul keno".

Heq u tala derman dano cîvraili rusneno. Axîr Cîvrail ki derman do qılancike cirê vato: "Ni bere qulê mîne dîningi ro sane ke cirê olim çine bo". Qılancike ki perra ra şiya merxe sero nista. Merxe sero o dermano amanat sano xoro, nêdo quli. Qılancike ke derman sana xoço cira taê rişino merge ser, merxe na sevet ra daim kewe mana.

Qılancike re ki olim kerdo hesrete, vato "to ya rastê kemere bêre, ya ki rastê qersuna sevkani bêre".

#### **Dar u Ber**

Serre ke biye newe usar ama, 21ia mart de pesewe sewe nême de dar u ber têde yeno sızde, hometa xorê dûwa keno. A waxt de endî dar u ber binê vîore ra vecino, miradê xo cêno. Dar u ber heqê xora mînete keno, dûwa keno ke serra niwiye ret ravero. Dar u ber binê vore de zaf menalo, ğezevê laseri ve ğezevê bulesîki ra bisevekiyo. Va u puk ra, hêwrês ra raxeleşiyoy, tenturr ra bisevekio. Yê dar u bêr ki wairê xo esto. Gereko wairê daru beri, dar u beri adîr ra bisevekno, zulm u ğezevê dînara raxelesno, cirê

## REWŞEN-NAME

wairine bikero.

Heni inam kene ke hukim ke kut vore, vore ke şıye, des u dı koy piya benê war. Hukim kono vore, vore sona laseri dere u derğına kenê sên. A waxt; dar u beri rê vane "pêbıce, pêbıce vore şıye" Daru ber ki vano "nêvane ke raverde va sero, hendo ke vore mı sero nişti bi ro, vılê mı sikit bi". Belek vore ke biye sire yeno goni, na rey ki goni rê vane "Gone şıye, şıye, gone vore şıye, pêbıce meverde ra" gone vano "Hendo ke vore mı sero nişt bi ro, endi ria gonıene mıro şı bi, va sêro!".

Dar u ber ke ama sizde tam a waxt de jü qul ke sêro bıpiyo, dare ke amê sizde a waxt de çite berzo ser, o qul çı mirad ke bıwazo, dilege xo qebug beno. Na sevet ra taê hekati qesey benê. Hêketê nia qesey bena vane "Kırmancıye de cinikê şıya sizdê dar u beri pito, seke dar u ber amo sizde cinike tam a waxt de dismalanê serê xo pıresnena gilê qowaxa reze ro, qawaxe bena rast, çite cinike gilê qowaxe ra mane. Cinike miradê xo wazena vana "Dilegê mı ke esto çüê lacanê mı çüaê aşıra serr ra bo" A waxt ra tepia çüê lacanê cinike tıma aşıra sero bıyo.

### Dar u Ber

İtiqatê Kırmancıye de dar u ber wertê weşia qom de caê de hewli cêno. Quli ke net kerd dar bırna gereko bısmılay kero, çıke dar o waxt jıveno, naleno. Aza birri bırnaine guna wa, çıke aze zê qulê cencia, hona mirada yerde say bena. Dar u ber ke nêbi weşia qomi ki nêbena, weşia ther u thuri ki nêbena, weşia heywani nêbena. Xêr u bêr dar u ber de ro. Dar ke khewi nêbi ne mal şıye vineno meğel bo, ne ki qul ke kefelıa şıya dar u beri vineno ke raareşio. Dar; hem weşia quli de lazımo, hem merdena quli de lazımo. Dar domankına quli de beno derguse, merdena quli de beno çurpiye mezele. Dar; düyarê boni de beno atıl beno pheştia boni. Beno çêrangê boni, bado beno atıl u çurpiye boni, beno ustına zerrê çei. Dar; bıne cıla de aldano, bıne mir de darendo. Dar; destê qabaniye de sepia, çeria, qıdıxo, xoncıka, çemçıko, koçkıka. Dar; nınga cüamerd de lekano, vore estene de huio, hega de hangaja, nire wo, sako, cün de mısona wo. bıne kinkori de tawugo, çesana. Dar; kozê bızeka de

çito, bıne bızeka de phelçımo, werdê heywani de velgo, dormê gora mali de, dormê bostani de, dormê hegay de çeperr ro. Serê laser de pırdı. Destê hunermenda de çulfa wa, restıka. Wertê kemeranê distari de gırmaçıgo,. Dar; dozlıgê arey de topo, dardağı, kurna, seqseqe wo, sepeta, nıko. Dar; wertê şınat u marıfet de ki hurendia xo cêno. Dar; miyanê dawulci de dawula, fekê zurnaci de zurna wa, destê sair de themuro, herme de kemene wo. Destê alim de qelemma, xeta, kıtabo.

### Kırmancı De Namê Taê Dara

*Darê Alança*

*Darê Awreşi*

*Daro Belmuriye*

*Daro Çekem*

*Darê Çirre*

*Daro Ezgela*

*Darê Gilehese*

*Darê Goze*

*Darê Heşi*

*Darê Haywa*

*Darê Hengure*

*Darê Hêruge*

*Daro Hodar*

*Daro Lepik*

*Daro Mamuğ*

*Daro Melem*

*Daro Mewzık*

*Daro Morjen*

*Daro Moza*

*Darê Muria Reze*

*Darê Muria Pince*

*Darê Nare*

*Dara Nonê Milça*

*Daro Qarğac*

*Daro Qeremux*

*Daro Qızvan*

*Darê Qowaxa Pince*

*Darê Qowaxa Reze*

*Darê Rixoke*

*Darê Saê/soê Reze*

*Darê Saa/soa Pince*

*Darê Sêzıke*

*Darê Sıfteliye*

*Darê Sulure*

*Daro Suredar*  
*Dara Sirviske*  
*Darê Şilane*  
*Daro Terq*  
*Darê Têe*  
*Daro Thuzik*  
*Darê Tüê*  
*Darê Dırıka Zereca*

**Darê Alança:** Darê Alança darê lêa hêrugo. Yımışê alança hona ke kheweo eve sole yeno werdene. Alança ke biye kamil reste hem sifre de yena werdene, hem kenê husk xosavi potene de yena werdene. Thamê alança hem thirso. hem merxoso. Darê alança ra vilence vecino. no vilence seqızo, çi themeqnenno jübinra.

**Darê Awreşi:** Darê awreşi zê komele ca ve ca beno. Wertê berr de thelp ve thelp roino, darê xo gırs nêbeno. rengê xo ze sipelao. Awres taseno thole weno a sevet ra vane darê awreşi. Darê awreşi zaf qolınd nêbeno, cıra en zaf sıvıki bene, sıvıkê xo sıgîê, yi sıvıka ra sıvıkanê dawule, uşıra phırçı vecına.

**Darê Belmuriye:** Belmuriye wertê berr de bena. dara xo hendê lêa de saê bena gırse. Velgê belmuriye mal u dawari virazeno. Verê xo zê rengê qewao, zê hengure salxemıno, zê morekanê hurdia roverdaiyo.

**Daro Çekem:** Çekem zafiri birra de beno, tapanê herdıo. Her daim kheweo, phelçimê xo zê teli hem phono hem phızkıno. Verê çekemi usar kheweo. eke rest beno sur yeno werdene, hendê heba nuke beno gırs, tek ve tek niseno têvile. Verê çekeme kuxke rê dermano. Qul verê çekemi girêneno awe simeno. Verê çekemi kal ki yeno werdene.

**Darê Çirre:** Darê çirre zaf gırs nêbeno, hendê saade reze beno gırs. Darê çirre phelçimê xo hendê phelçimê goze beno, dormê phelçimanê xo ca ve ca kertkıno. Kırmancıye de ca ve darê çirra pınce esto. hende ke herd ra beno, zaf nêbeno gırs. Hendê vasê beno pil, caê rıcal de, dormê kemera de beno, phelçimanê yi ra sıt yeno.


**Daro Ezgela:** En jede hetê veroca de beno. Lêa xo benê gırs benê qerti. Boğımê qerta zaf beno qalınd, se serrana omirê xo esto. Daro

ezgela zaf qewetino, hama tikmê xo tıma rast nêsono, na sevet ra terşigê xo çetike yeno diayine. Tholê xo şia keno, serê qertanê gırsa de zê nexşi derze ve derze abiriayio. Koliê darê ezgelay zaf tıramia rindeke vecêno. Darê ezgelay ra beli benê, tharnê belianê xo gegane şirino gegane thalo. Qom payız belia topkeno herd kıneno keno herd, zımastan veceno ebe thoraqa weno. Vesaniye de kenê husk distari de reynêra pocenê zê ardanê genımı wenê. Phelçimê darê ezgelay serva mal u dowari payız birnenê wertê dara de nijnenê beno huk, zımıstan ya eve tawug ya ki eve derze benê danê mal u dowari.

**Darê Gilehese:** Darê gilehese en zede hetê veroca de bena, phelçimê xo gewriê, darê xo xeyle beno gırs, vırandia cüamerda gegane sero nêresenape. Verê gilehese zê selxemê hengure verdına ro, gewra, verê xo payız herey reseno, yena werdene. Zerrê verê gilehese de hurdi hurdi çigiti estê.

**Darê Goze:** Darê gozê herdê Dersımı de zaf roino. Darê goze wertê dara de en daro gırsı, zaf beno gırs, dormê xo de beno hira, hende beno hira ke herdê axpine de gırşı cêno. Darê goze oncia khakıla goze ronaine ra beno. Khakıla ke niyero gereko payız bo, dendikê khakıla ki sağlem bo. Khakıla usar jildana, bena lêa, u waxt hurendi ra besekenê vurnenê ra. Bado lêa goze serre ve serre bena pil, hirê serra de yımış dana, hata hire-çar sey serre pay ra mana. Dormê darê goze ra piê pena, na piê hendê sunge de gırşı çıçık dana. Piê ne huska nê ki sılvıçıka, heni ze nerma, wertê xo zê phaçi destik ve destıko. Piê rew tami cêna adır de taftê vêsena. Gunê veren de hona ke adırke çine biyo, qomi; piê na jü parçê demiri ser kemerê kuta demiri ra, çhiki perne piê çhika ra kota cı adır heni fito cı. En zaf ney serranê peyina de kefçianê tutuni cevê xode piê fetelna.

Darê goze ra qıdıği virajine, hangazê rindeki virajine. Darê goze ra boğım ve boğım oncene, texte oncene, yi texta ra sandıqi, ambari virajine, kurşi, xonçiki virajine. Textê goze ke cila kerd beno zê ayney, berreqino. Wertê darê goze nexsino, qabusukê xo qalındo. Qabusukê dare goze, her ke lêa goze biye pir, qabusuk beno qalınd, therze ve therze jübin ra birino ra ♦



## Hawara Dicleyê Mehmed Uzun


Weşanên Avesta  
roman, 303 rûpel

### *Hawara Dicleyê*

hawara gelan e; gelên jibîrbûyî, gelên ku qîrîna wan li tixûbên dîrokê eliqîne û

bêbextî wekî mayînekê di binê piyên wan de teqiyaye. Jibîrbûyî kurd in, ermen in, keldanî ne, asûrî û cihû ne û her wiha gelên din in, gelên ku bi darê zorê navên wan hatine jibîrkirin, gelên ku li ser vê axê şaristanî bi ser piyan xistine.

Dengbêjê nûjen Mehmed Uzun di *Hawara Dicleyê* de, bi dû bermayiyên şaristanyên Mezopotamyayê ketiye. Serpêhatî û malkambaxiyên ku qewimîne, têkiliyên gelan ên bi hev re û bêbextiya mirovahiye bi xweşawazî û bi şewazeke cuda vedibêje. Xwendevan di *Hawara Dicleyê* de, li ber ronîya çar çirayan dibin mêvanê çar sevhêrkan û bi pêşengiya Biroyê Dengbêj geh li Ninowayê, geh li Babilê û carinan jî li Cizîrê bi dû bermayiyên mirovahiye dikeve. Piştî ku roman kuta dibe, di dilê we de êşa gelên jibîrbûyî û di guhê we de dengê pêlên Dicleyê, hûn bi bêsebrî li benda cîlda duyem a romanê disekinîn.




## Arzêba M. Zahir Kayan

Weşanên Sî  
helbest, 95 rûpel

*Arzêba* diwana helbestkar M. Zahir Kayan a duyem e. Helbestkarê ku yekem

car bi diwana xwe ya bi navê *Destanek Ji Bihuşta Windayê* derketibû pêşberî xwendevanan, vê carê jî bi *Arzêbayê* helbesteke epîk vehûnaye. Kayan bi pirtûka xwe ya ku bi şewazeke cuda û zimanekî şayik li dar xistiye hêvî dixê dilê xwendevan ku zimanê kurdî çî qas têra wêjeyê serketî dike. Arzêba her wiha mizgîniyek e jî, ku nivîskar li xwendevanan dike, mizgîniya ku nivîskar wê di paşerojê de berhemên hîn giranbhatir biafirîne. Arzêba çî qas jî helbestên bi navên cuda û jî pexşanên helbestî pêk bê jî, di nava xwe de bi hev ve girêdayî ye, di bingeha xwe de yek dastan e.




## Smirnoff Hesenê Metê

Weşanên Avesta  
çîrok, 111 rûpel

*Smirnoff* yekem pirtûka Hesenê Metê ye, ku di sala 1991'î de li Stokholmê ji nava Weşanên Welat

derçûbû. Pirtûka ku ji çardeh kurteçîrokên pêk tê, cara duyem ji aliyê Weşanxaneyê Avestayê ve hatiye çapkirin. Hesenê Metê di her çîrokekê de tipolojiyek ji xwe re kiriye mijar û di her tipolojiyekê de bi kurtî civaka kurd dahûrandiye. Piraniya mijar û tipên ku hatine hilbijartin li derveyê welêt dijîn. Li gorî jiyana derveyê welêt tip û mijarên rojane çî xwestine, nivîskar bi comerdî rê li ber wan vekiriye. Di çîrokên ku bi zarxweşî hatine hûnandin de, nivîskar ji pêlwanên xwe re negotiye ev şerm e, ev dûrî êqil e û berbora civak me ye. Hesenê Metê bi daxwaza xwe hefsarê pêlwanên xwe ji dest filitandiye.





Mirovên Hejar  
Victor Hugo  
*ji fransî:*  
Yaqûb Karademir  
Weşanên Avesta  
roman, 170 rûpel

**P**irtûka nivîskarê navdar ê fransîz **Victor Hugo** heta niha bi gelek zimanan hatiye weşandin. Axirî bo kurdî jî hat

wergerandin. Nivîskarê navdar dibêje, **Mirovên Hejar** ji bo hemû gelan hatiye nivîsandin. Ev gotineke rast be jî, **Mirovên Hejar** nû bû pirtûka kurdan.

Victor Hugo yek ji wan nivîskaran e ku bingeha Wêjeya Fransî danîne û bi vê romana xwe ve ciyê xwe di civata nivîskarên sereke yên cîhanê de girtiye. Li ser **Mirovên Hejar** ev serê sedsalekê ye ku gelek tişt hatine gotin û nivîsandin. Hugo bi **Mirovên Hejar** klasîkeke qerase afirandiye. Tiştê ku em ê jî bibêjin wê ne li ser naveroka pirtûkê be, wê li ser wergera wê be. Pêwîstiya wergerê û peywira wê ya ku di pêşketina ziman û wêjeyê de divê çî carî neyê jibîrkin.

Nivîskarên nûhatî yên kurd, ji bo ku di asta cîhanê de berheman biafirînin, divê beriya her tiştî Victor Hugo, Dostoyevski û her wiha nivîskarên din ên cîhanê bi zimanê xwe yê zikmakî bixwînin.

**Mirovên Hejar** ên ku her roj rastî me tînin, hejmarê wan roj bi roj zêdetir dibe. Heke hûn dixwazin wan mirovan ji devê wêjekarekî şareza û bi kurdî binasin, vê romanê bixwînin. Her çend we berê bi zimanekî din xwendibe jî...



Êş  
Berken Bereh  
Weşanên Sî  
helbest, 80 rûpel

**L**i ser erda vî welatî, ji êşê bêparbûn şerm e. Şerma herî mezin e û bi vî zimanî tiştê ku baştir tê pesindayîn êş e.

Helbestkarê kurd **Berken Bereh**, ku gelek helbestên wî di kovarên kurdî de derçûne, vî carê jî bi yekem dîwana xwe ya ji helbestên wî yê bijartî pêkhatî derdikeve ber xwendevanên zimanê kurdî. Di pirtûka ku ji aliyê **Weşanên Sîyê** ve hatiye weşandin de, helbestkar bi şewaza xwe ya cuda balê dikişîne. Şewazeke ku helbestkêr bi xwe afirandiye û li gorî wê berhemên xwe pê diafirîne. Taybetmendiyeke din a **Bereh** û helbestên wî jî, nasîna wî ya erdnîgariya welêt û civaka kurd e. Lê taybetmendiya herî mezin a helbestkêr kurdewarîtiya wî ye. Heta ku jê hatiye helbestên xwe bi biwêj û peyv û hêmayên kurdewarî û bi şewazeke xweser hûnaye. Pirtûk her çend bi **Êşê** hatibe binavkirin jî, dema ku hûn xwe pê de berdidin, der barê jiyane de çî hebe li dora we dicive, pêlên hestan wekî Çemê Kolikê di hundirê we re dikişê.

**Êvaran kew xwe berdidin ser Çemê Kolikê  
bi piştîyên çilo  
bi çavên kovanî  
û bi gavên şermok  
jin xwe berdidin...**



## Amîdabad Fawaz Husên

Weşanên Avesta  
çirok, 106 rûpel

**P**irsa "Amîdabad heye an tune ye?", piştî kutakirina pirtûka **Fawaz Husên**,

xwendevan nikare bibersivîne, lê têdigihîje ku her kurd ji Amîdabadê ye û hemû navçe û bajarên Kurdistanê Amîdabad in. Nivîskarê kurd Fawaz Husên. ku doxtirê Ziman û Wêjeya Fransî û endamekî PEN-Klûba Navneteweyî û endamekî Rêxistina Nivîskarên Fransîz e, bi heşt çirokan karesat û bextreşîya kurdan tîne zimên. Pirtûk ji heşt çirokan pêk tê, lê ji ber ku henû çirok bi awayekî bi hev ve girêdayî ne, pirtûk di çêja romanê de ye.


Amîdabad roj bi roj kaviil dibe, sergoyên wê mezintir dibin. çemên wê diçikin û goristanên wê firehtir dibin. Lê karesata herî mezin jî, bi milyonan gelê Amîdabadê li dû jiyaneke nû (!) bi ser rîyan dikevin û xwe li tixûbên welatên xerîb dixin. Ev jî, destpêka karesateke nû ye. Amîdabad hingî diçe vala dibe, wêrantir dibe û kesên penaber jî ji dêvla ku bibin yek, çiyayan bihejinin û bi mîza xwe lehiyan rakin (!), li dû çareseriyên erzan ji her tiştên xwe dibin. Amîdabada bi qasî ku çirok e, her wiha tê de hin rexne jî hene ku li kes û rêxistinên kurd tînin girtin û her wiha pêşniyarek e ji bo vegera ser kokên xwe.



## Mirin Niquî Dilê Firokevanekî Îrlandî William Butler Yeats

ji îngilîzî: Kawa Nemir  
Weşanên Sî  
helbest, 109 rûpel

**"A**soya zimanekî din dikare asoya zimanê me yê zêde bikarnehati



## Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan Îhsan Colemêrgî

Weşanên Avesta  
roman, 195 rûpel

**Lori Cembeliyê mino lori  
Tu bi xêr û xweşî hati  
welatê Hekaryan zozanê  
jori**

Strana Cembelî û Binefşa Narînê hezar sal e ku li deverekê, bi guhertoyeke cîyawaz û bi devoka wê herêmê tê strandin. Stran di sala 1992'yan de ji hêla nivîskar **Colemêrgî** ve bi şewaza romanê hatiye nivîsandin.

Nivîskar Colemêrgî dastaneke evînî li gorî guhertoya herêma Colemêrgê, bi devoka herêmê diyarî Wêjeya Kurdî ya nivîskî dike. Pîvana pêşketina wêjeya her neteweyekê girêdayî sûdwergirtina wê ya ji gencîne û kelepûra wê ya devkî û gelêrî ye. Ji ber wê yekê jî, xebatên wiha di pêşketina wêjeya nivîskî ya kurdî de xwedî roleke mezin in. Colemêrgî di romana xwe de lehengên efsanewî vedijîne. Di vê romanê de, jiyana kurdan a beriya sedsalan, rewşa civakê, bîr û bawerî û kevneşopên civakê li ber çavan tînin raxistin. Lê mijara sereke gerdûnîtiya evînê ye. Evîn bi mêraniya Cembelî û bedewiya Binefşê tê xemilandin. Tevî hemû eş û azarên ku tîne kişandin, vê carê evîn bi ser dikeve.

fîreh bike." Helbestkar û wergêr **Kawa Nemir** xwestiye ku hêz û dewlemendiya kurdî li hemberî zimanên cîhanê bipeytîne. Pirtûka ku ji helbestên bijartî yê helbestkarê îrlandî **William Butler Yeats** pêk tê ji aliyê **Weşanxaneyê Sîyê** ve hatiye weşandin. Helbestkarê îrlandî bi helbest û şewaza xwe Helbesta Îrlandê gihandiye asoyên nû. Yeats di helbestên xwe de mîtolojîyê afirandiye û her wiha dîrok û neteweya Îrlandê bi cîhanê daye nasandin. Lê mixabin ev yek ne bi zimanê îrlandî, lê bi hêz û efsûna îngilîzî pêk aniye.



Helbestkarê ku di sala 1923'yan de Xelata Nobelê Ya Wêjeyê wergirtiye, ji gelek aliyên xwe ve mînakekî balkêş e. Yeats nişan dide ku helbest çawa dikeve xizmeta gelekî ku ji bo azadiya xwe radipere.

Helbestkarê ku di sala 1938'î de jiyana xwe ji dest da, gelek berhemên bêhevta li dû xwe hişt. Yek ji wan berhemên navdar jî, sê rêzikên li ser kêlikê wî ne.

*"Awirekî sar bikute  
Jiyane, mirinê  
Siwuro derbas be!"*



**Kenê Parsek  
Hesên Qizilcî**

Weşanên Avesta  
çirok. 111 rûpel

*"Xwezi gelek  
kesên wekî Hesên  
Qizilcî di nava me de  
hebûna! Ger em ji bo  
xwe hebin, wê gelekên*

*wiha ji nava me rabin."* dibêje **Qazî Mihemed**. Pirtûka **Hesên Qizilcî** ya bi navê **Kenê Parsek**, ku ji soranî li kurmancî anîne, ji çardeh kurteçirokan pêk tê. Nivîskar **Qizilcîyê** ku di sala 1984'an de ji hêla rejîma Îranê ve hatiye girtin û ji wê rojê û pê ve tu salixek jê dermeketiye, bi pirtûka xwe çend kurteçirokên nûjen diyarî wêje û xwendevanên kurd dike. Nivîskar di pirtûka xwe de bi qasî ku civaka kurd dide nasandin û li ber çavan radixe, her wiha giyanên pêlwanên xwe jî hildide dest û xwe berdide nava kûrahiyên dil û hinavên wan. *"Piştî xwendina gelek ji van çirokan, xwendevan dikene. Lê kenekî çawa? Kenekî ji jaleyê taltir..."* dibêje Hêmin Mukriyanî.



**Ratîka  
Çihan Roj**

Weşanên Sî  
helbest. 78 rûpel

**Ratîka** yekem pirtûka helbestkar û nivîskar **Çihan Roj** e ku ji aliyê **Weşanxana Sîyê** ve hatiye weşandin. Ta

niha gelek helbest, çirok û kurteşanoyên Roj di rojname û kovarên internetî de derçûne. Di **Ratîkayê** de, xwiya ye ku Roj kesekî ji nav me ye û her wiha jî zimanê ku di nav gel de tê bikaranîn rengêkî cuda dide **Ratîkayê**. Bi taybetî jî, neqşên jiyane û hêmayên di heqê xwezayê de **Ratîkayê** dixemilînin. Xwendevan di **Ratîkayê** de bi koçer-an re hilgêrî zozanan dibe, şîlanan berhev dike û ji guhanên bizinên danavî şîr dimije.

*Peyv bi cêja benîştê kerengan  
Li ser sifreya dastanên terecan rêz bi rêz*

...

*li sawiyên şorik  
guhanên danavî li gotinan der dibin*

Helbestkêr bi **Ratîkayê** bergeheke welêt, bi taybetî jî bergeheke Serhedê, neqşandiye. Ger hûn bi hêza helbestê û hêmayê bawer in, hunê di nava risteyên **Ratîkayê** de li Serhedê temaşe bikin.

*Amedekar: Məhmet Dicle*

Helbestên Gerîla

çiroka du ezîzan

Helbestên Gerîla II

Nizamettin Akkurt

Helbestên Gerîla

Hestên Bi Vejinê  
Hatine Hesandin

Helbestên Gerîla I

Dilnas Berazî

gcm HELBEST

gcm HELBEST

Berhemên Giyîl Yan



Siya Bedî'îyê

Suzan Sarraf

tartuffe

Sofiyê Sextekar

Molière

gcm

(CCTI) SANO

Ji nav Weşanên Aramê  
çar pirtûkên nû

## Şerek Heye

Di navbera dewlemendan û hejaran de şerek heye,  
şerek heye di navbera mêran û jinan de. Di navbera yên ku  
dibêjin “şerek heye” û yên ku dibêjin “tune” de şerek heye.  
*De heydê, hûn çima venagerin şer? De heydê, hûn çima  
venagerin şer?*

Ez li vir bi jinekê û zarokê re me, rewş bi awayekê bêhnê  
li min teng dike. Ez ji milên wê hiltêm, ew dibêje, “Ji min  
we ye tu ji vê re dibêjî evîn. Ez ji vê re dibêjim Servêsa  
Odeyê.” *De heydê, hûn çima venagerin şer? De heydê, hûn  
çima venagerin şer?*

Qîma te nayê ez bûm wiha. Tu bêtir wê camêriya min a berê  
çêtir digirî. Wilo bi hêsanî têkdişikiyam. Wilo bi hêsanî dihatim  
gerandin. Min nizanibû şerek jî hebû. *De heydê, hûn çima  
venagerin şer? De heydê, hûn çima venagerin şer?*

Di navbera dewlemendan û hejaran de şerek heye, şerek heye  
di navbera mêran û jinan de. Di navbera çep û rast de şerek  
heye, şerek heye di navbera reşan û spiyan de, şerek heye di  
navbera fer û zo de. *De heydê, hûn çima venagerin şer? De  
heydê, hûn çima venagerin şer?*

1974

**Leonard Cohen**